- Baruah, T. C. "The English Teaching Handbook". *New Delhi: Sterling Publishers Private Limited* (2006),
- Bedirxan, Celadet Alî-Lescot, Roger. *Kürtçe Gramer*. İstanbul: Weşanên Avesta, 5. Basım, 2012.
- Bedirxan, Kamiran. *Rêzimana Zimanê Kurdî*. Paris: 1971.
- Cefer, Elî. *Gotinên Pêşyan*. Weşanên Xanî, 2006.
- Chinyeaka, Lauretta. "AN OVERVIEW OF ADVERBS FOR THE PROFICIENT USE OF THE ENGLISH LANGUAGE". *Awka Journal of English Language and Literary Studies* 6/1 (2017), 96-113.
- Ciwan, Mûrad. *Türtçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kumanc Lehçesi*. İsviçre: Jîna Nû Yayınları, 1992.
- Demir, Celal. "Türtçe Öğretiminde Zarf Tümlerleri". *TÜBAR* 13/(2003 Bahar), 407-423.
- Dêrşewî, Mele Mehmûd. *Miştaxa çiya ji gotinên pêşiya*. thk. Serbest Zaxoyî. Stockholm :[s. n: Çapa 1 (bi tipen Latini). Basım, 1989.
- Eastwood, John. *Oxford Guide to English Grammar*. Hong Kong: Oxford University Press, 1994.
- Fossum, L. O. *A Practical Kurdish Grammar*. Minneapolis: Augsburg Publishing House, 1919.

- Gucker, Philip. *Essential English Grammar*. New York: Dover Publications, 1966.
- Helqetînî, Mele Yûnisê. *Ez-Zuruf ve't-Terkîb*. İstanbul: Şifa Yayınevi, 2015.
- Lester, Mark. *McGraw-Hill's Essential ESL Grammar: A Handbook for Intermediate and Advanced ESL Students*. Chicago: Mc Graw Hill, 2008.
- Malmîsanij, Mehmet. *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kırmancca(Zazaca) Dilbilgisi*. İstanbul: Weşanên Vate, 2015.
- Mazî, Çîya. *Ferhenga Gotinên Pêşîyan*. Elma Yayınları, 2005.
- Nelson, Gerald. *English An Essential Grammar*. London: Routletge, 2002.
- Ocek, Nezir. *Waneyên Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Sîtav, 2014.
- Quirk, R., Randolph, Q., Quirk, R., Greenbaum, S., Longman, Pearson, Leech, G.N.-Svartvik, J. *A Grammar of Contemporary English*. london: Longman, 1972.
- Sağnıç, Feqi Huseyn. *Hêmana Rêzimanê Kurdi*. İstanbul: MELSA Yayınları, 1991.
- Sevgi Öndeş, Nesibe. *English Grammar Inside and Out*. İstanbul: ELS Yayıncılık, 2. Basım, 2007.
- Tan, Samî. *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 3. Basım, 2015.
- Tîgrîs, Amed. *Gotinên Pêşîyan*. Stocholm: Weşanên Rewşen, 2001.
- Yıldırım, Kadri. *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*. İstanbul: Weşanên Avesta, 3. Basım, 2013.

EKLER¹²⁵

Tablo 11: Zaman Zarfları-Adverbs of Time

Kürtçe	İngilizce
Aline	When animals are grazed or left to rest at noon, at noon
Axirê, axir, axirkê	After all, finally, eventually
Berbang a sibê/sibehê	At the crack of dawn
Berê, berî	Once, before
Ber bi êvarî	In late afternoon, towards evening
Ber bi sibê, ber bi sibehê	Towards morning
Berêvarkî	Before evening
Berî nîvro	Before midday
Bi roj, nîvroj	By the day, midday, noon
Bi şev	At night
Bi şev û (bi)roj, bi roj û (bi)şev	Night and day, day and night
Betir pêr, bitir pêr, pitir pêr	Three days ago
Bitir bitir pêr, pitir pitir pêr	Four days ago
Bitir pêrar, betir pêrar, petir pêrar, pitir pêrar, pitir pêr	Three years ago
Bîstekê	In a moment
Car	...time
Carna, carcaran, car caran, ji carcaran	Sometimes, occasionally
Carekê	Once
Cih de, cî de, di cî de, di cih de, di cîh de	Immediately, instantly
Cirkî	Since
Çarsibe	Four days later
Çi car, tu car, yek car	At no time
Danê êvarê	In the afternoon

¹²⁵ Ev tabloyên jêrê hokerên Kurmancî bi pirtûkên Celadet Alî BEDIRXAN- Kürtçe Gramer, M. MALMÎSANIJ- Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi, Kadri YILDIRIM- Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi, Samî TAN- Rêzimana Kurmancî, Bahoz BARAN- Rêzimana Kurmancî, Nezîr OCEK- Rêzimana Kurmancî, Abdûrrahman BAKIR- Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî, Şêxmûs ASLAN- Lêkonînek li Ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî), Halil ALTUĞ-Gramera Kurdî/Kürtçe Gramer hatiye sûd wergirtin. Hokerên Kurdî jî me wergerand İngilîzî.

Danê sibê, danê sibehê	In the morning
Dawî, dawiyê	Then, finally, eventually
Dem	Time
Demekî, demekê	For a time, once, for a while
Demsal (Bihar, Havîn, Payîz, Zivistan)	Season (Spring, summer, autumn/fall, winter)
Dereng, bi derengî	Late
Dest, dest-dest, di dest da	Immediately, instantly
Di dawîyê de	Finally, eventually
Dihî, dihi, dihi, do, duh, duhî	Yesterday
Di nêzîk de, di nêz de, di nêzdik de	Soon, nearby, recently
Di pey re	Afterward, subsequently
Dusibê	The day after tomorrow
Êvarkî, êvarî, êvarê	In the evening
Ewil	Firstly
Gav (diş., an)	Time
Vê gavê, wê gavê	Now, then
Gavek, gavekê	In a moment
Gavekê din	A little later, soon
Gavîna, gavgavina, gavinan	Sometimes, occasionally
Geh geh, ge ge	Sometimes, occasionally
Halo, hele	Then, namely
Hem...hem, him...him	Both...and..., at the same time
Hema, Hima, heman, hemen	Immediately, instantly
Her	Every, always
Hercar, her car	Always, consistently
Herdem, her dem	Every time
Her û her	All the time, consistently
Hergav, her gav	Always, consistently
Her ro, her roj, hero	Every day, consistently
Heta	Until, till...
Hertim	Always, consistently
Hey bnr. Hema	
Heyam	Period, season
Hêj, hê, hêna, hîn, hîna	Still, yet
Hindî, himgaft, hingavî, hingê	Then, at that time
Hîn nû	Just new

Îcar, încar, îdorê, îjo, vê carê	This time
Îro, îroro, evro, îrû	Today
Îsal, evsal	This year
Îşev, evşev	This night, tonight
Jêlî	Since...
Ji berê ve, ji berê de	Since the past
Ji îro pê de, ji îro pê ve	Henceforward
Ji îşev heta sibê	From evening till morning
Ji niha ve	From now on, already
Ji niha û bi şûn de, ji niha pê ve	From now on, henceforward
Ji paşî, ji pê ve	From now on, anymore
Ji zû de, ji mêj de, ji mêj ve	For a long time
Kevn, kevin, kewn	Old, ancient
Kêm caran	Rarely, uncommonly
Niha, niho, nuha, nika, nûke, aniha, anika, anka, anaka, aneka, anêka, a nuha, hênûka, naga, naka, nako, noke, nuka, nûka	Now
Ji niha û pê de	From now on
Ji sibê heta êvarî	From morning till evening
Meh (Adar, nîsan, gulan, xizêran, tîrmeh, tebax, îlon, cotmeh, mijdar, kanûn, çile, sibat)	Month (March, April, May, June, July, August, September, October, November, December, January, February)
Nişk, nişka, nijkê ve, ji nijkê/nişka ve	Suddenly
Nîvro, nîvroj	Noon
Nîvrokî	At noon
Nîve şevê, nîveşev	Midnight
Nû, nuh, nuhû	New
Par	Last year
Paşê, paşî, paşkê, paşkî, paştir	After, afterwards, later, finally
Peyre	Afterward, subsequently
Pêde	Continuously, consistently
Pêr	The day before yesterday
Pêrar	Two years ago
Pêrşev	The night before last night
Pirî caran	Often
Piştî	After, later
Piştî nîvro, piştî nîvroj	In the afternoon
Piştire, di piştire	Finally, after, later

Roja berê	The day before, yesterday
Rojadin	Tomorrow
Roj bi roj	Day after day, day by day
Rojek, rojekê, rokê	A day
Rojên hefteyê(Şemî, yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem, în)	Days of the week (Saturday, Sunday, Monday, Tuesday, Wednesday, Thursday, Friday)
Sala borî	Last year
Sala ku bê, sala ku tê	Next year
Salek	A year
Sal bi sal	From year to year
Salê pêde	All year
Serdawîyê	Finally, eventually
Serêvarkî	In the evening
Serê sibê, serê sibêhê, serê sibêyê, serê subê	In the morning
Sêsibê	The third day after today
Sibe, subê, sibehê, sivê, siwê	Tomorrow, In the morning
Sibetir	After tomorrow
Sibetira dî	Three days later
Şefeqê, şefaqê, şebaqê, şebeqê, şeveqê, şibakê, şiveqê	At dawn
Şev, bi şev	At night
Şeva bertirê	The night before last night
Şeva din, dîşev	Last night
Şeva ku bê, şeva ku tê	Tomorrow night
Şevêkê	A day
Şevtira din	Two nights before last night
Tavilê, tafil, tafilê, tafilkê, tavil, tavilkê, tawil	Suddenly, abruptly
Tim, timî	Always, consistently
Tim û tim	Without stopping, constantly
Tu caran, tu carî, çi caran	Never, in no case
Ve, va	Then, at that time
Vêca, vêga	Then, at that time
Wextekî	For a time, once, for a while
Xafil de, xafil da, xaftila, ji xafil de, ji xaftila da	Suddenly, abruptly

Yekser	Immediately, instantly
Zaf caran	Many times, most of the time
Zemanekî	For a time, once, for a while
Zînhar	Never, in no case
Zû, pêşwext	Early, promptly
Zû dereng	Sooner, whenever

Tablo 12: Yer-Yön Zarfları- Adverbs of Location

Kürtçe	İngilizce
Alî, ji vî alî ve, ji wî alî ve	Direction, side: This way ... that way
Alî, yalî, halî, hêl, hêla	Side
Ba, bal, li ba, li bal	Near
Bajar	City
Bakur	North
Bakurê rojhelat	Northeast
Bakurê rojava	Northwest
Bala	Upwards, high
Balorkî	Rolling down
Banî bnr. Bala	
Başûr	South
Başûrê rojhelat	Southeast
Başûrê rojava	Southwest
Behr, derya	Sea
Ber, wer, li ber	Front
Beraber	Reciprocal, side by side
Berbijêr, berjêr	Downhill, down
Berbijor, berjor, berjorkî	Uphill, up
Berepaş, beropaş, paşepaş	Back by back
Berve	Forward
Berwarkî	Sideways
Bilind	High
Bin, binî, li bin di bin de, di binî de	Bottom, at the bottom
Bi pêş ve	Forward, ahead
Bi ser de	Over, onto
Bi şûn ve	Behind
Bi vir de	Here

Bi wir de	There
Bi vir ve	Here
Bi wir ve	There
Ceber	Opponent
Cem	Near
Cîyekî din	Another place
Çem	River
Çaralî	Around, all around
Çep	Left
Dawî	End, final
Def	Side, part
Der	Out, outside
Derûdor, der-dor	Around, all around
Derve, derva, ji derve, li derve	Out, outside
Di ber de	In front of
Dibistan	School
Di nav re, di nav de	Through, in
Dor	Around
Dormedor, dormandor	Around, all around
Dorûber, dewrûber	Around, all around
Dû, dûv, dûre, bi dûv, bi dû re, dûv ra, di dûv ra, li dûv	One after another, subsequently, after, afterward
Dûr, ji dûr ve	Far, away
Ew ber, wî berî	Farther, to the other side
Ew cî, (li) wî cî, ewder	There
Gol	Lake
Gund, li gund	Village
Hindir, hindur, hundir, hundur, hindirû, ji hundur, di hundur ra, di hundur de	Inside, in
Herde	There
Hember	Versus, opposite
Hind	Side, part, nearby
Hinda	Along, alongside
Hinda çep, hêla çepê	Left side
Hinda rast, hêla rastê	Right side
Hir, li hir	Here
Ji nêzîk ve, ji nêz ve	At close range
Ji ser, di ser ra, di ser re	Over
Jêr, li jêr, ji jêr ve, di jêr de	Down, below

Jor, li jor, jor de, ji jor de, bi jor	Up, above, from above
Kêlek, li kêlekê	Side, part
Li dûv, dîv ra, dîv re, dûv re, dû ra, dû ra, dî dû ra, dî dûv ra	After, then, afterwards, later, in pursuit of
Li dûv hev, li dû hev	successively
Li her derê	Everywhere
Li nik, li nik hev	Near
Li ser hev, bi ser hev ra, bi ser hev de	Over and over
Mal, li mal, ji mal, di malê de	Home, at home
Mil(er.yan): ji milê din	On the other side
Mizgeft	Mosque
Nav, li nav, di nav, di nav de	In
Navber, navên	Between
Navbeyn, mabeyn, mabên	Distance
Navçe	District
Nêzik, nêzîk, nêzing, nizik, nêzdik, nêz, nêzing, nêzûk, nîzing, nîzîk	Near, nearby
Pal	Back, slope
Pa ra, di pa ra, di pê ra	Behind
Paş, paşve, li paş, ji paş ve, bi paş ve	Backwards
Paş da, paş de, pey	Back
Pey, li pey, pey ra	Behind
Pêş, pêşve, li pêş, ji pêş ve, bi pêş ve	Front, forward
Pêşberî	opposite
Pêş de, ber bi pêş	Forward
Pêlepaş	Back you back
Pişt, li pişt, ji pişt	Back
Rast	1-Right 2-Straight
Rasterast	Straight, directly
Rex, li rex	Side, part
Rexkî, rexrexkî	Sideways
Rojava	West
Rojhelat	East
Ser, li ser	On, on top of, upon
Serbijêr bnr. Berbijêr	
Serbijor bnr. Berbijor	
Serejêr, serjêr	Downhill

Serpiştê	On one's back
Seyrangeh	Promenade, picnic place
Şûn, şûn de	Back
Tenişt, li tenişt	Side, part
Têde	In, inside
Tomargeh	Studio
(Tu) cîyekî	Nowhere
Vê derê, li vê derê	There
Vêda, vêde, virda, virde	Here
Vir, vira, li vir, li vira, li vêda, li vêdê	Here
Wêda, wêde, wirda, wirde	There
Wir, wira, li wir, li wê derê	There
Xanî	Building
Xwarê, xwar, war, ber bi xwarê	Down

Tablo 13: Miktar Zarfları -Adverbs of Degree/Intensifiers

Kürtçe	İngilizce
Balo	At least
Beraber	As far as, much
Bes	Enough
Bêdira	Enough
Bêtir, bêhtir, bihtir	More
Cot bi cot	Doubly, in pairs
Çend, bi çendî	As far as, much
Çênîk, çênîk, çênîk, çenek	A little, a few
Çenîkek, çenîkek, çenîkik	Little, few
Çêtir	Better
Çiko	Insomuch that, so that
Çiqas, çiqeder	Many, how
Çikas...ewçend(ewqas)	So much
Çîçik	Little, few
Dehe deh	In tens
Du qat	Double
Evende, evhînde, ewçend, ewende, ewqas, çiqasqas	So much

Gelek, gele, gelik, gelekî	Very, quite
Bi gelekî	Very much
Gişkî	All, the whole
Hebek, hebekî, hebki	Some
Hefqas bnr. Ewqas	
Her car	At every turn
Herçend...ewçend	Insomuch that, so that
Herçî	Insomuch that, so that
Herî	The most
Herî hindik	The least
Herî kê m	The least
Herî zêde/zahf	The most
Herî pir	The most
Heta radeyekî	Insofar
Hinde, hindê, ewende, ewhinde, ewinde	So many/much
Hindek, hindik, hinek, hinik, hin, hinekî, tenek	Some, a little, a few
Hingî	So much
Hîç, hêç	None
Hîn	More
Kê m...Kêmtir	Less
Kûtanî	Briefly, finally
Mîşe, mîşe	A lot of
Nîvenîv, nîvanîv, nîvonîvo	Fifty fifty
Qas, bi qasî	In as far as
Qederek	Some, little, few
Qene	At least
Pîçek, pîçek, pîçekî, piçik, piçikî	Some, little, few
Pir	Very
Pir hindik	Very/too little
Pir kê m	Very/too little
Pir pir	At the very most, dreadfully
Pirtir	More
Qandî	So many/much
Safî	Pure
Temamî, bi tamamî	Exactly, completely
Tebayek, tu teba, tu tewa	Nothing
Teqe	At least

Tev	All, the whole
Tewr, tewrî	The most
Têr	Enough
Tîke	Some, little, few
Xulase (Ar.)	Briefly, in summary
Yek bi yek, êk bi êk	One by one, gradually
Zaf, zef, zehf, zehv	Very
Zêde zêde	Abundantly, excessively
Zeyde, zêde, zîyade, zêdetir	Very, much, extra
Zihar	At least
Zor	Very, much

Tablo 14: Soru Zarfları -Interrogative Adverbs

Kürtçe	İngilizce
Bi kû ve, bi ku de	Where
Çawa, çewa çawan, çewan, çan, ça, çer	How
Çend	How many
Çi	What
Çi dem, çi demî	What time
Çima, çiman, çira, çire	Why
Çîlo, çîtewr, çîto, çîtone, çîtow, çîtor, çutor, çutûr	How
Çiqas, çiqâ, çiqeys, çiqeyse, çuqas	How much
Çi weqt	What time
Ecêba, eceba	I wonder if
Gelo	I wonder if
Heta kengê	Untill when
Ka, kanê, kanî	Where
Kengê, kengî, kînga, kîngê	When
Kêder, kuder, kîjan cî	Where
Kî, kê	Who
Ku, kû, ko	Where... at
Ku re, kur, kêrê, kê derê	Where...to
Kusan	How
Ku va, ku da, ku de, ji ku de	where...from

Bi kû de, kû derê, bi kû ve, li kû, li ku, di ku de	Where
Ji ber çî	Why
Ji kengî de, ji kengê vir de, ji kengê ve ma	Since when
Ji kîjan hêlê	Which way
Ma, mî	I wonder if
Mîna çî, wekî çî	What... like
Qey	Why
Wekî kê	Who...like

Tablo 15: Durum/Niteleme Zarfları- Adverbs of Manner

Kürtçe	İngilizce
Aşkere, bi aşkere	Clearly, frankly
Axisî	Fortunately
Baş	Well
Bere bere, berebere	Progresively, little by little
Bêhemd, bêhemdî	Involuntary, unwillingly, reluctantly
Bi derewkî, bi derewînî	Pretendedly
Bi dor	In order, in turn
Bi hev re	Together
Bi konetî	Subtly, cutely
Bi lez	Fast
Bilind	Highly
Binaz	Delicately
Bi nezanî, bi nezanîn	Unintentionally, inadvertently
Bira	Sharp
Bi rastî, birast	Actually, correctly, factually, Really
Birêkûpêk	Tidily, steadyingly
Bi qest, bi qesd	Intentionally, purposely
Bi şaşî, bi şaşîfî	Mistakenly, wrongly
Bi xeletî	Mistakenly, wrongly
Bi xwe	In person
Bi zanayî, bi zanîn	Intentionally, purposely
Bi zor, bi zorê	Forcily, by force
Bi zordarî	Forcily, by force

Bîlaheq, bîlehaq, belheq, beleheq	In vain, unjustly, without a reason
Bîlasebep, belasebep, beleseb, belesebep, bîlesebe	In vain, without a reason
Çargavkî	At a galo, tantivy
Çarlepki, bi çarlepki	Creepily
Çarmêrkî	Cross-leggedly
Çepki, çepkanî	From left part, reversely
Çika	Especially, at least
Çilo, çito	How, like
Deste deste	Bundle, bunch
Dilêrane	Heroically, bravely,
Di ser re	Superficially
Dirêjki	Lengthwise
Dizika, dizika, dizîki, bi dizî, bi dizîka	Secretly, under-handed
Devdevki	Face downwards
Devûrû, deverû, deveronî	Face downwards
Dûr û dirêj	Far and wide, lengthily, in detail
Eseh(Ar.)	Sure, really, certainly
Fena, fîna	Same as...
Geh	Sometimes
Giran	Slowly
Herçi, herçi	Especially, at least
Hela	Especially, at least
Her weki	Like, as
Hevtone	Thus
Hêdî, hêdîka	Slowly
Hêsan, asan, hasan, hêsa	Easily
Hişk	Hardly, rigidly
Ji adetê der	Unusually
Ji binî, ji bin de	Radically, completely
Ji binî, yekcar, ji bin, bintûtî	1-Never 2-Radically, completely
Ji binî	1-Radically, completely 2- In vain, without a reason
Ji bin ve	Under-handed, secretly
Ji dil	Sincerely
Ji xwe	Already, fundamentally
Kereker	Secretly, under-handed

Ko	Dull
Kurdane	As a Kurd
Kurt	Low, short
Kûr-kûr	Deeply
Lez, lezkî, bi lez, bi lez û bez	Fast
Lig-lig	Tremblingly
Li pey hev	Successively
Mêrane	Manly, bravely
Mîna...	As, like
Nerasterast	Indirectly
Nişkavî	Impulsive
Nivîskî	Written
Nizm	Low
Nola...	As, like
Paşpêkî	Backwards, inversely
Paşpaşkî	Backwards
Pêkve	Together, althogether
Pêlepaş	Backwards
Pêt, pît, peyt, pihêt	1-Fast 2-Tightly
Pinhanî, nihani	Secretly
Qelew	Fat
Qenc	Good
Qene	At least
Qestîka, bi qestîka, qestî, qesta, qestîkan, qestûka, berqestîka, berqestî,	1-Jocularly 2-Intentionally, purposely
Qeşmerkî	Buffoonish, scophantically
Qet nebe, qe nebe, qe ne, qa ne, qe na	At least
Qilûskî	Crouchingly
Rast	Right, correct
Rasterast	Directly, straight
Rehet, rahet, rihat, rihet	Easily
Rind	Good, fine
Rû bi rû	Face to face, reciprocally
Saya	Thanks to, on account of
Serserkî	Upside-down
Şaşkî	1-Misguidedly 2-Asquint 3-Mistakenly
Şêrane	As a lion
Şermokî	Shyly, timidly

Tenê, tik û tenê	Alonely
Tenikî	Thinly
Tewr, tew, tewer	1- Also 2- Never
Tev-tevlî, tev bi hev re	Alltogether
Tûj	1-Hot, bitter 2-Sharp
Vala	In vain, without a reason
Wek, wekî, weke, weka, weko, weku, wekû	As, like
Xelet	Wrong, false
Xwe bi xwe	By oneself, on one's own
Xweş	Nice, lovely
Xweşik	Beautiful
Yekser	Immeadiately, directly
Zatî	Already
Zorekî	Forcily, by force
Zû, zûkanî, zûka	Fast,swiftly
Zûzûka	Urgently, abruptly, promptly

Tablo 16: Olumsuzluk Zarfları-Negative Adverbs

Kürtçe	İngilizce
Bi tu awayî	In no way
Çu, tu, ti	Never
Hew	No longer, never
Hîç, hêç	Never
Ji bin	Never
Na, Nexêr, naxêr	No, not
Ne... ne, çî... çî	Neither... nor
No	No
Qet, qe	Never
Qet mebe/nebe	At least
Tew, tewî	Never
Tu caran, tucar, tucara, tu carî, çî caran	Never, in no case
Yekcar	Never
Zînhar	Never, in no case

Tablo 17: Kesinlik, Onay ve İstek Zarfları

Kürtçe	İngilizce
Belê	Okay
Bêguman	Absolutely, certainly, surely
Bêşik	Absolutely, certainly, surely
Bi carekê	Completely, exactly
Biteqezî	Absolutely, certainly, surely
Bivê nevē	Absolutely, certainly, surely
Bixwe	Anyway, in addition that
Erê	Yes
Haşa	Except
He	Then, therefore
Helbet	Surely
Île	Necessarily
Îşela, şale	Hopefully
Ji xêra xwedê re	I wish
Jixwe, ji xwe	Anyway, naturally
Jî	also, too, even
Naxwe, nexwe	Anyway, in addition that
Nemaze	Especially, particularly, specially
Nexasim	Especially, particularly, specially
Rast e	Correct
Teqez	Absolutely, certainly
Tev, tef	Completely, exactly
Xasxa, xesma	Especially, particularly, specially
Xwedê hez ke	Hopefully
Xwezî, xwaziku, xwazka, xwezil, xwezila	I wish

Tablo 18: Şüphe ve Tahmin Zarfları

Kürtçe	İngilizce
Belkî, belkê, belko, belku, belkû, belim	Maybe, perhaps
Dibe ku	Maybe, perhaps
Ecêba, ecebe, erê, gelo	I wonder if
Halbûkî, halko, halwe, heçku, gotin qey,	But, however, nevertheless
Her hal	Probably, possibly
Heye ku	Maybe, perhaps
Hew te dît...	Peradventure
Kano, qaşo	Supposedly, in a manner, so-called
Qene	Supposedly
Qey	Probably, in a manner

Tablo 19: Sebep Zarfları-Adverbs of Reason

Kürtçe	İngilizce
Da	In that case, therefore, then
Jifrom
Ji ber... ji ber ku...	Because of, due to, owing to
Ji bo ku...	In order to...
Ji rûbalê	because of, due to, owing to
Ji rûyê, ji rûyê di...	because of, due to, owing to
Lewra, lewre	Consequently, therefore, because
Loma, lewma, lema	Consequently, therefore

Tablo 20: Tekrar Zarfları

Kürtçe	İngilizce
Cardin	Once more, again
Derbekî din	Again

Dîsa, dîsan, dîsanê	Again
Dubare	Again
Ji nû ve	Again
Hema her gav, hema tin	Again and again
Neqileka din	Again
Şopekî din	Again

Tablo 21: Sınırlılık Zarfları

Kürtçe	İngilizce
Edî, êdin, êdina, êndî, idî, indî, ida, îdin, îdî, eydî, hêdina	Anymore
Nema	Anymore, henceforward
Sif	Only, solely
Sirf	Mere, only
Tenê, tinê, tena, تنها, tenya, bi tenê	Alone, lonely

Tablo 22: Gösterme Zarfları

Kürtçe	İngilizce
Eve	Here
Ewe	There
Ûha, ûlo, wanî, welê, welo, wilo, wiha, weha, wîsa, wisa, wer(ê), halo, holê, hanî, hanê	So, such
Va, vêya (Nêz)	Here
Wa (Dûr)	There
Wenî, winî, wanî, wengî, weng, hone	So, such
Werge	So, such
Wisan	So, such

Tablo 23: Azlık-Çokluk Zarfları

Kürtçe	İngilizce
Bihezir	Approximately, roughly
Devdev, devdev, devdevî, devdevî, devedevî	Nearly, almost
Jorejêr, jor û jêr, xwarejêr	Nearly, almost
Hema, hema bêje, hema hema, hemen hemen	Nearly, almost
Nêzî, nêzike	Approximately, roughly
Teqrîben, teqrîbî	Approximately, roughly
Kêm zêde, kêmuze	More or less, nearly, almost
Pirhindik, pir û hindik, zaf hindik	More or less, nearly, almost



EK – Tezin Kürtçe Tercümesi



K.T.

Zanîngeha Dîcleyê Enstîtûya Zanînên Civakî

Şaxa Mekazanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**BERAWIRDKIRINA HOKERAN DI KURDÎ
(ZARAVAYA KURMANCÎ) Û ÎNGÎLÎZÎ DE**

Hakan TEKEŞ

18933007

Şêwirmend

Doç. Dr. Hacı ÖNEN

Amed 2021

K.T.

Zanîngeha Dîcleyê Enstîtûya Zanînên Civakî

Şaxa Mekazanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**BERAWIRDKIRINA HOKERAN DI KURDÎ
(ZARAVAYA KURMANCÎ) Û ÎNGÎLÎZÎ DE**

Hakan TEKEŞ

18933007

Şêwirmend

Doç. Dr. Hacı ÖNEN

Dr. Öğr. Üyesi İlyas SUVAĞCI

Amed 2021

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLERİ ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Kürtçe (Kurmancî Lehçesi) ve İngilizce’deki Zarfların Karşılaştırılması (Berawirdkirina Hokeran di Kurdî (Zaravaya Kurmancî) û Îngîlîzî de)**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

.../.../...

Hakan TEKEŞ

PÊŞGOTIN

Ev teza hatiye amedekirin, bi taybetî li ser hokerên kurdî (Zaravaya kurmançî) sekiniye. Ji bilî hokerên kurmançî li ser hokerên îngîlîzî jî sekiniye. Di nav van herdû zimanan de taybetiyên hokeran yên hevpar hene an jî tune ne li ser vê mijarê rawestîyaye. Ev tez ji çar beşan pêk tê. Di beşa destpêkê de mijar û girîngiya lêkolînê, rêbazên hatine bikaranîn, sînor û çarçoveya lêkolînê û pirsgerêkên lêkolînê hatine diyarkirin.

Beşa yekem de me pêşî qala pênaseya hokerê kiriye. Ka hoker li gor zimannasên me çawa ye? Di kurdî de cureyên hokeran kîjan in? Cureyên hokerê yeko yeko hatîye diyarkirin. Di vê beşê de ji bo hokeran me gotinên pêşiyar mînak dan. Bi van mînakên gotinên pêşiyar me dît ka hoker çawa tene bikaranîn. Di nav gel de hoker bi çî awayî tê bikaranîn em li ser vê sekinîn.

Di beşa duyem de vê carê hokerên îngîlîzî bûne mijara me. Taybetiyên hokerên îngîlîzî me destnîşan kir. Piştî me qala cureyên hokerên îngîlîzî kir. Ji bona hokerên îngîlîzî mînakên rojane hatin dayîn. Ev mînak pîranî mînakên nû ne. Em dixwazin ku zimanê îngîlîzî yê nûjen bê fêmkirin.

Beşa sêyem de, taybetiyên hokerên kurdî hate diyarkirin. Peyvsaziya kurdî hate vegotin. Piştî taybetiyên hokerên îngîlîzî hate diyarkirin. Û ji aliyê peyvsaziyê ve hokerên îngîlîzî hate vekolandin. Di dawiyê de hêmanên hevpar û cuda hatin berawirdkirin.

Di serî de, ez ji herdû şewirmendê xwe **Doç. Dr. Hacı ÖNEN** û **Dr. Öğr. Üyesi İlyas SUVAĞCI** re ji bo piştgirî û alîkariya wan spas dikim. Spasiyeke taybet jî ji malbata xwe re dikim. Herwiha ez ji hevalên xwe **Oktay ALTUN** û **İslameddin DEMİRKAYA** ji bona alîkarîya wan spasiyê dikim. Mala wan hemûyan ava be.

Hakan TEKEŞ
Diyarbakır 2021

KURTE

Ev lêkolîn di bingehê de li ser hokeran disekine. Bi taybetî jî hokerên kurdî bi berfirehî hatine nîqaşkirin. Paşê, em li ser hokerên bi îngilîzî jî sekinîn. Di beşa paşîn de, di herdû zimanan de hoker ji hêla peyvsaziyê ve têne vekolandin. Bi rêbaza berawirdkirinê ji aliyên wekhevî û cudatîyê ve têne rawestin. Di pirtûkên rêzimana kurdî de hokerên ku herî pir têne bikaranîn hatin tercîhkirin. Hokerên îngilîzî ji mînakên rojane têne bijartin. Ji ber vê yekê, lêkolînek rojane hate pêşkeşkirin.

Bi vekolîna çavkaniyan, hate dîtin ku di nav zimanzanan de pênaseyek hevpar tune ye. Di warê diyarkirina cureyên hokerê de jî ciyawazî hatine destnîşankirin. Cûdahî di navlêkirina hokeran de jî hatine dîtin. Armanca sereke ya vê lêkolînê destnîşankirina karan e. Dûv re di ronahiya vekolîna zanistî de cureyên hokeran vebêjin. Di dawiyê de, ew e ku bi mînakên têgihîştineke çêtir peyda bike.

Di vê lêkolînê de, hoker di warê peyvsazî, wate û fonksiyonê de têne nîqaşkirin. Di vir de armanc ew e ku hoker li gorî peyvsazî û peywirên xwe binirxînin û balê bikişînin ser wateyên ku li hevokê zêde dikin. Ji ber vê yekê, ew e ku hokerên kurdî û îngilîzî ji aliyê standardbûnê ve bidin ber hev. Armanca me ew e ku em bi berhevdana avahiyên semantîkî û morfolojîkî yên ku derdikevin pêş, fêr bibin fêrbûna zimên a li herdû zimanan.

Bêjeyên Sereke

Hoker, cureyên hokerê, berawirdkirin, kurdî, îngilîzî

ÖZET

Bu çalışma temelde zarfarı ele almaktadır. Özellikle Kürtçe' deki zarflar geniş bir şekilde ele alınmıştır. Daha sonra İngilizcedeki zarflara da yer verilmiştir. Son bölümde ise her iki dildeki zarflar yapı bakımından incelenmiştir. Karşılaştırma yöntemiyle benzer ve farklı yönler vurgulanmıştır. Kürtçe dilbilgisi kitaplarında en çok kullanılan zarflar tercih edilmiştir. İngilizce' deki zarflar da güncel örneklerden seçilmiştir. Böylece güncel bir çalışma ortaya konmuştur.

Kaynakların incelenmesiyle dilbilimcilerin arasında ortak bir tanım olmadığı görülmüştür. Zarf türlerini belirleme açısından da farklılıklar tespit edilmiştir. Zarfları isimlendirirken bile farklılıklar görülmüştür. Bu çalışmanın temel amacı zarfların kullanımını tespit etmek. Daha sonra zarf türlerini bilimsel analiz ışığında açıklamak. En son olarak da örneklerle daha iyi kavranılmasını sağlamaktır.

Bu çalışmada zarflar yapı, anlam ve görev açısından ele alınmıştır. Buradaki amaç zarfları yapı ve aldığı görevler açısından değerlendirip cümleye kattıkları anlamlara dikkat çekmektir. Böylece Kürtçe' deki zarfları standardize etme ekseninde İngilizce' deki zarflarla karşılaştırmaktır. Ortaya çıkan anlamsal ve morfolojik yapıları mukayese ederek amacımız her iki dilde dil öğrenimine katkı sunmaktır.

Anahtar Sözcükler

Zarflar, zarf türleri, karşılaştırma, Kürtçe, İngilizce

ABSTRACT

This study mainly deals with the adverb. Especially the adverbs in Kurdish have been discussed extensively. Later, adverbs in English were also included. In the last section, adverbs in both languages are examined in terms of morphology. Similar and different ways are emphasized with the comparison method. The most commonly used adverbs in Kurdish grammar books were preferred. The adverbs in English are chosen from current examples. Thus, a current study has been presented.

Examining the sources, it has been seen that there is no common definition among linguists. Differences have also been identified in terms of determining adverbs types. Differences have even been seen in naming the adverbs. The main purpose of this study is to identify the use of adverbs. Then explain the types of adverbs in the light of scientific analysis. Finally, it is to provide a better understanding with examples.

In this study, adverbs are discussed in terms of structure, meaning and function. The aim here is to evaluate the adverbs in terms of their structure and tasks and draw attention to the meanings they add to the sentence. Thus, it is to compare the adverbs in Kurdish with the adverbs in English on the axis of standardization. Our aim is to contribute to language learning in both languages by comparing the semantic and morphological structures that emerge.

Keywords

Adverbs, types of adverbs, comparison, Kurdish, English

NAVEROK

	Sayfa No.
PÊŞGOTIN	I
KURTE	II
ÖZET	III
ABSTRACT	IV
LÎSTEYA TABLOYAN	VIII
KURTEBÊJE	IX
DESTPÊK	1
1.1. MIJAR Û GIRÎNGÎYA LÊKOLÎNÊ	1
1.2. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ	3
1.3. SÎNOR Û ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ	3
1.4. PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ	4
BEŞA YEKEM	5
HOKER Û CÛREYÊN HOKERAN DI KURDÎ DE	5
1.1 PÊNASEYA HOKERÊ	5
1.2 HOKER JI ALIYÊ WATEYÊ VE	9
1.2.1 CUREYÊN HOKERÊ	9
1.2.1.1. Hokerên Demê	12
1.2.1.2. Hokerên Cih û Aliyan	22
1.2.1.3. Hokerên Mêjerê / Çendanî	32
1.2.1.4. Hokerên Pirsyarîyê	36
1.2.1.5. Hokerên Rewşê / Çawaniyê	40
1.2.1.5.1. Hokerên Neyîniyê	45
1.2.1.5.2. Hokerên Teqezî, Erêkirinê û Xwestekê	47
1.2.1.5.3. Hokerên Guman û Pêşbîniyê	48

1.2.1.5.4. Hokerên Sedemîn.....	49
1.2.1.5.5. Hokerên Dubarekirinê	50
1.2.1.5.6. Hokerên Bisînorkirinê	51
1.2.1.5.7. Hokerên Şanîdanê.....	51
1.2.1.5.8. Hokerên Kêm-Zêdetiyê	53
BEŞA DUYEM	54
HOKER Ê CUREYÊN HOKERÊ DI ÎNGÎLÎZÎ DE	54
(ADVERB AND TYPES OF ADVERB IN ENGLISH)	54
2.1. PÊNASEYA HOKERÊ (THE DEFINITION OF ADVERB)	54
2.1. HOKER JI ALIYÊ WATEYÊ VE (ADVERB BY MEANING).....	55
2.1.1. Cureyên Hokerê (Types of Adverb)	55
2.2.1.1 Hokerên Demê (Adverbs of Time)	55
2.2.1.2. Hokerên Cih û Alî (Adverbs of Location)	59
2.2.1.3. Hokerên Mêjer/Çendanî (Adverbs of Degree/Intensifiers) ..	62
2.2.1.4. Hokerên Pirsyarîyê (Interrogative Adverbs)	67
2.2.1.5. Hokerên Rewşê/Çawaniyê (Adverbs of Manner)	69
2.2.1.6. Hokerên Frekansê/Pircariyê (Adverbs of Frequency)	70
2.2.1.7. Hokerên Hevokê (Sentence Adverbs).....	72
2.2.1.8. Hokerên Fokusê (Focusing Adverbs)	74
2.2.1.9. Hokerên Berawirdî û Herî Raserî (Comparative and	77
Superlative Adverbs).....	77
2.2.1.10. Hokerên Sedemîn (Adverbs of Reason)	80
2.2.1.11. Hokerên Girêdanê (Connecting/Linking Adverbs)	82
BEŞA SÊYEM.....	83
BERAWIRDKIRINA HOKERAN DI KURDÎ Ê ÎNGÎLÎZÎ DE	83
3.1. TAYBETIYÊN HOKERAN DI KURDÎ DE.....	83
3.1.1. Taybetiyên Peyvsazîya Hokeran di Kurdî de.....	84
3.1.1.1. Hokerên Xwerû.....	84
3.1.1.2 Hokerên Dariştî (Çêkirî).....	85
3.1.1.3. Hokerên Hevgirtî.....	87

3.1.1.4. Hokerên Hevedudanî	88
3.1.2. Taybetîyên Peyvsaziya Hokeran di Îngilizî de (Features of Adverbs	90
Forms in English)	90
3.1.2.1. Position of Adverbs in a Sentence (Di Hevokê de Cihê Hokeran)....	96
3.1.2.1.1. Hokerên serî (Front position adverbs).....	97
3.1.2.1.2. Hokerên nîvî (Mid position adverbs)	98
3.1.2.1.3. Hokerên dawî (End position adverbs)	99
3.1.3. BERAWIRDKIRINA HOKERAN DI KURDÎ Û ÎNGÎLÎZÎ DE.....	100
3.1.3.1. Taybetiyên hokeran yê hevpar:	101
3.1.3.2. Taybetiyên hokeran yê cuda:	110
ENCAM.....	113
ÇAVKANÎ.....	115
PÊVEK.....	117

LÎSTEYA TABLOYAN

“Tablo 1 Demsal û Meh”	19
“ <i>Tablo 2 Rojên Hefteyê</i> ”	19
“Tablo 3 Dan”	19
Tablo 4 Hokerên Frekansê/Pircarî	20
Tablo 5 Hokerên Pirsariyê (Interrogative Adverbs).....	68
Tablo 6 Hokerên Frekansê/Pircariyê (Adverbs of Frequency)	71
“Tablo 7 Irregular Comparative and Superlative Forms”	79
Tablo 8 Hokerên Wekhevdu di Herdu Zimanan de	106
Tablo 9 Berawirdkirina Hokerên Frekansê/Pircariyê	107
Tablo 10 Berawirdkirina Hokerên Pirsariyê	107
Tablo 11 Hokerên Demê-Adverbs of Time	117
Tablo 12 Hokerên Cih û Aliyan- Adverbs of Location.....	121
Tablo 13 Hokerên Mêjerê, Çendanî-Adverbs of Degree/Intensifiers	124
Tablo 14 Hokerên Pirsariyê-Interrogative Adverbs.....	126
Tablo 15 Hokerên Rewşê, Çawaniyê- Adverbs of Manner.....	127
Tablo 16 Hokerên Neyîniyê-Negative Adverbs.....	130
Tablo 17 Hokerên Teqezî, Erêkirinê û Daxwaziyê	131
Tablo 18 Hokerên Guman û Pêşbîniyê	132
Tablo 19 Hokerên Sedemîn-Adverbs of Reason.....	132
Tablo 20 Hokerên Dubarekirinê.....	133
Tablo 21 Hokerên Bisînorkirinê.....	133
Tablo 22 Hokerên Şanîdanê	134
Tablo 23 Hokerên Kêm- Zêdetiyê.....	134

KURTEBÊJE

MÎNAK:

adj.	Adjective
adv.	Adverb
Hwd.	Her wekî din
r.	Rûpel
K.T.	Komara Tirkiyeyê
N	Noun
V	Verb

DESTPÊK

1.1. MIJAR Û GIRÎNGÎYA LÊKOLÎNÊ

Di vê xebata bi navê “Berawirdkirina Hokeran di Kurdî (Zaravaya Kurmancî) û Îngîlîzî de” bi piranî li ser cudatî û wekhevîyên herdu zimanan em sekinîne. Ji nav jî diyar e ku zaravaya em ê bi kar bînin kurmancî ye. Di vir de armanc ev e ku kesên kurdî hîn dibin, zaravaya kurmancî û zimanê dinyayê yanî îngîlîzî de hêmanên hevpar an jî cuda bibînin. Zimanê kurdî baş were fêr kirin. Ev xebat ji bona standard kirina zimên jî girîng e.

Ev xebat ji destpêk û sê beşan pêk tê. Di destpêkê de me mijar û girîngiya lêkolînê, rêbazên hatine bikaranîn, sînor û çerçoveya xebatê û pirsgerêkên di vê xebatê de qala wan kirine. Beşa yekem de bi giştî derheqê hokerên kurmancî ye. Di vê beşê de ka hoker çi ye û cureyên hokerê kîjan in zimannasên kurdî çawa behsa wan dikin em li ser vê sekinîne. Beşa Duyem vê carê qala hokerên îngîlîzî dike. Cureyên hokerên îngîlîzî tesbît dike. Beşa sêyem de jî taybetî û peyvsaziya hokeran di herdu zimanan da gelo çawa ye behsa wê dike. Piştî him di kurdî de him jî di îngîlîzî de hokeran berawird dike. Ji ber ku hokerên herdu zimanan tê miqayese kirin mirov dikare bêje ku di herdu zimanan de jî hemanên hevpar û yên cuda hene.

Pênasekirina hokeran ji navdêran, lêkeran û rengdêran diwartir e. Hoker pir wateyan di nav xwe de dihewîne. Ji bona vê jî di nav zimannasan de pir curbicur hatine dabeşkirin. Ji ber ku rêzimana hokeran pir dijwar e, senifandina hokeran jî zor e.

Ev xebat dixwaze bersivên van pirsên jêrê bibîne.

1. Di kurdî de freqansa hokeran di gotinên pêşiyên de çawa ye?
2. Di pirtûkên kurdî û îngîlîzî de hoker çawa hatine dabeş kirin?

3. Di navbera hokerên kurdî û îngîlîzî de taybetiyên wekhevî hene an na?
4. Di navbera hokerên kurdî û îngîlîzî de taybetiyên cuda hene an na?

Di kurdî de derheqê hokeran de xebat pir kêr in. Ji bilî Şêxmûs ASLAN di pirtûka xwe ya *Lêkonînek li Ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)* de berfireh qala hokeran kiriye. Samî Tan jî di pirtûka xwe de bi berfirehî qala hokeran kirîye. Ev herdu zimannas jî hem ji aliyê wateyê ve hem ji aliyê peyvsaziyê ve hoker dabeşkirine. Lê belê di nav tezan de qet tu kesî li ser mijara hokerê nexebitiye. Loma ev tez ji bo vê yekê jî gelek girîng e.

Di nav tezan îngîlîzî de jî xebatê berawirdî kêr hatine kirin. Lêkolîn li ser hoker û cureyên hokeran pir hatine kirin. Lê belê derheqê îngîlîzî û kurdî nehatine amadekirin. Ji ber vê yekê jî ev xebat bibe xebateke girîng. Taybetmendiyên herî girîng di nav de hene.

Ji bilî pirtûkên rêzimanê di beşa yekem de mînakên hokeran me ji nav gotinên pêşyan hilbijart. Armanc ev bu ku ka hoker di nav gel da çawa tên bikaranîn. Frekansa bikaranîna hokeran gelo çawa ye? Ji bona peyvên kurdî sê ferheng hatine bikaranîn. Mînak: Osman Aslanoglu – *O - Ferheng-Ferhenga mezîna Kurdî=Tirkî Offline sözlük, WQ ferheng offline ferheng, Zana Farqînî-Ferhenga Kurdî-Tirkî, Salah Saadallah-SALADIN'S English –Kurdish Dictionary.*

Bi vekolîna pirtûkên rêzimanê, cudahî û wekhevîyên di derheqê sînorên hokeran de têne eşkerekirin û sedemên lêkeran têne vegotin. Bi berawirdkirina herdu zimanan hem xwandekar hem jî mamosteyan re hînkirina kurdî- îngîlîzî hêsantir dibe.

Ev lêkolîn di bingeh de armanc dike ku lêkeran li gorî wateyên semantîkî û peyvsazî vekolîne û dabeş bike. Bi saya vê jî xwandekar baştir kurdî fêm bikin.

1.2. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ

Rêbazê zanistî di her xebatan de divê bê bikaranîn. Ev rêbazê akademîk û zanistî yên lêkolînê gelek girîng in. Di vê tezê de jî bona ku xebateke baş derkeve holê me jî çend rê û rêbaz bi kar anîn.

Di serî de mirov dikare bêje di vê xebatê de rêbaza pênasîner (deskriptîf) gelek caran hatiyê bikaranîn. Dema qala hokeran bê kirin divê hoker baş were fêrkin. Ji bona vê jî divê pênasîner hokeran baş were kirin. Di herdu zimanan de jî pênasîner hokeran pir girîng e.

Di vê tezê de beşa yekem de rêbaza wek minakdan gotinên pêşîyan hatiyê dayîn. Di beşa duyem û sêyem de jî ji bona îngîlîzî mînakên rojane hatine dayîn. Ji rêbaza mînakdayînê pir sûd hatiyê wergirtin.

Bi taybetî beşa duyem û sêyem de rêbaza berawirdkirinê hatiyê bikaranîn. Ev xebat jî bo ku xebateke berawirdî ye di nava tezê de jî ev rêbaz heye. Armanca tezê ev e ku hokerên kurdî û îngîlîzî berawird bike. Gelo hêmanên hevpar an jî cuda hene an na. Dema mînakên kurdî hatin nivîsîn yên îngîlîzî jî li cem hatin nivîsîn. Ji bona xwandekar peyvan an jî hevokê berawird bike û baş fêr bike.

1.3. SÎNOR Û ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ

Di dema lêkolînê de, pêşî çavkaniyên cûrbecûr ên rêzimanê, gotar, tez û ferhengên têkildarî mijarê hatin vekolandin. Di van çavkaniyan de, agahiyên wek “ka hoker çi ne, cûreyên hokeran çawa hatine diyarkirin, hoker çawa tene avakirin hatine vekolandin.

Xebatên jêrîn ên pirtûkên rêzimanê dikarin wekî nimûneyên çavkaniyên rêzimanê yên analîzkirî werin dayîn: Celadet Alî BEDIRXAN- *Kürtçe Gramer*, M. MALMÎSANIJ- *Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kirmanca (Zazaca) Dilbilgisi*, Kadri YILDIRIM- *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, Samî TAN- *Rêzimana Kurmancî*, Bahoz BARAN- *Rêzimana Kurmancî*, Nezîr OCEK- *Rêzimana Kurmancî*, Abdûrrahman

BAKIR- *Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî*, Şêxmûs ASLAN- *Lêkonînek li Ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*, Halil ALTUĞ-*Gramera Kurdî/Kürtçe Gramer*.

Ji bona rêzima kurmancî ev pirtûkên jorê destême de hene. Minakên hokeran ji van pirtûkan me berhev kir. Li dawîya teze de di nav pêvekê de ev tabloyên hokeran hene. Di van tabloyan de hûn dikarin cureyên hokeran bibînin.

Ji xeynî van çavkaniyan ji bo mînakê gotinên pêşyan ji van berheman sûd hatîye wergirtin: Mehmet ÖNCÜ - *Gotinên Pêşyan*, Amed TÎGRÎS- *Gotinên Pêşyan*, AZAD BADIKÎ- *PÊŞGOTINÊ KÛRDÎ- GOTINÊN BERYA*, ÇÎYA MAZÎ- *Gotinên Pêşyan*, Elî CEFER- *Gotinên Pêşyan*, Mele Mahmûd DÊRŞEWÎ- *Miştaxa Çiya Ji Gotinên Pêşya*.

1.4. PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ

Di vê teze de pirsgerêka herî mezin ev bû ku zimannasên kurdî û îngilîzî hoker ji hev cuda dabeş kirine. Mirov li kîjanê dinêre senifandina wan curbicur e. Ji ber vê yekê me qala hemûyan kir.

Di nav teze û gotarên akademîk yê kurdî de xebat pir kêr in. Lê belê di îngilîzî de pir hene. Mirov di nav wan de carinan wînda dibe. Di nav herdu zimanan de jî lazime ku mirov xebate kî berfireh bike.

Ji ber ku hinek çavkanîyên kurdî êdî çapa wan tune ne. Em li ser pirtûkên ku di destên me da hebûn xebitîn. Pirtûkên îngilîzî jî bi giştî di destên me de tune bûn. Ji bona vê jî pirsgerêka herî mezin komkirina çavkaniyan bû.

BEŞA YEKEM

HOKER Û CÛREYÊN HOKERAN DI KURDÎ DE

1.1 PÊNASEYA HOKERÊ

Di hînkirina rêziman de mijarên gelek dijwar hene. Li ser van mijaran jî kêm xebat hatine amadekirin. Hoker jî yek ji van mijaran e. Di kurdî de hoker wek mijareke serbixwe ye. Di serî de li ser peyva “hokerê” zimannasan pênaseyên curbicur kirine. Em ê jî niha li ser pênaseyan hokerê bisekinin.

“Peyva hokerê di wateya xwe ya ferhengî de tê wateya “**pêçek**” ê. Jixwe hemû heyberên ku di gerdûnê de hene yan “**pêçek**” in an jî “**bipêçek**” in. Lewre hemû bûyerên ku di gerdûnê de diqewimin hem li cihekî û hem jî di demekê de pêk tên. Ji ber vê yekê ew cih û demên ku bûyer tê de diqewimin ji wan bûyeran re dibêin hoker. Ango pêçek (zerf.)”¹

Li gor Nezir OCEK “Hoker di wateya xwe ya rêzimanî de ew cure peyv in ku ji aliyê rewş, sedem, dem, cî û bergeh û mêjerê ve bandorê li ser lêker, lêkernav, rengdêr û hokerên mîna xwe dikin û wan ji aliyê wateyê ve sergîhayî û temam dikin. Lê di nava van hêmanan de, herî zêde bandora hokeran li ser lêkeran çêdibe. Ji ber vê bandora wan a pîranî ya li ser lêkeran ji hokeran re “**hevalkar**” jî tê gotin.”² Ji bilî van peyvan “**zerf, rengpîşe, vavêrker**” jî tê gotin. Lê belê em ê di vê teza xwe da “**hoker**” bi kar bînin. Ji ber ku gelek zimannasan jî ev peyv bi kar aniye. Mirov dikare bibêje hoker di termînolojiya zimannasîyê de bi cih bûye. Lê belê weke bêjeyeke sereke “**hevalkar**” jî Kurdî ye.

Li gor Samî TAN “Bêjeyên ku wateya lêker, hevalnav, hokerên wekî xwe ji aliyê dem, cih, bergeh, rewş, sedem, rêje û hejmarê ve temam dikin “**hoker**”

¹ Nezir Ocek, *Waneyên Rêzimana Kurmancî* (İstanbul: Weşanên Sîtav, 2014), 172.

² Ocek, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, 172.

in. Bi tenê bêjeyên ku ji binyadî hoker in peywira hokeriyê bi cih naynin. Digel wan navdêr, hevalnav, komek, ravek jî carinan peywira hokeriyê bi kar tînin.”³

Em dikarin bibêjin ji aliyê peywira di hevokê de di navbera hoker, daçek û gihaneka de taybetiyên hevpar hene. Ev ji ber ku pirwate ne, heman peyv di hevokekê de hoker, di hevokekê de daçek, di hevokekê dî de gihanek tên bikaranîn. Lewra em nikarin teqez wan ji hev cuda bikin. Tîştê herî girîng ew e ku wateya hevokê ye.

Mînak: Çile nebe **bihar** nabe. (Hoker wek **navekî** hatiye bikaranîn.)

Dara **bilind** nizim nabe. (Hoker wek **rengdêrekê** hatiye bikaranîn.)

Dengê defê **ji dûr ve** xweş tê. (Hoker wek **firazekî** hatiye bikaranîn.)

Adar e dew li dar e, **danê sibehê** sar e. (Hoker wek **ravekekê** hatiye bikaranîn.)

Diqedîne **loma** diqewirîne. (Hoker wek **gihanekekê** hatiye bikaranîn.)

Şêxmûs ASLAN jî derheqê hokerê de wiha gotiye: “Hoker tên ber lêkeran û navan û hevalnavan û cînavan û hokeran wan ji alî dem, cî, hêl, pirsrewş, pejirandin, mêjerê de dide nasîn û wateya wan xurt dike.”⁴

Li gor Abdûrrahman BAKIR jî “Hoker, pêkhatina kar, dema kar, cih û berga kar, û çendaniya kar (lêker) bi me didin nasîn. Hoker di eslê xwe de û bi tena serê xwe bin, navdêr in.

Mînak: bal, ber, der, jêr, jor, hêl, bin, ser, îro, îşev, îsal, li gund, şeva borî... Her hokerek dibe navdêr, lê her navdêrek nabe hoker.”⁵

Herçend ku ev gotina jorê ya A. Bakır rast be jî bi raya me kême. Ji ber ku hoker dibin navdêr. Carinan jî wek firaze û raveka derdikeve pêş me. Di firaze û ravekan de du an jî sê/çar peyv tên ba hev.

³ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî* (Îstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2015), 183.

⁴Şêxmûs Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)* (Ankara: Weşanên NA, 2018), 181.

⁵ Abdûrrahman Bakır, *Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî* (Diyarbakır: Weşanên Aram, 2015), 131.

Mînak: Kêm caran, ber bi sibehê, şeva borî, li gund, bi gelekî, tik û tenê, ji kîjan hêlê, ji ber çî...

Bi dîtina B. Baran jî “Hoker, ji aliyê rewş, dem, mêjer û cihê ve bandorê li lêker, lêkernav, rengdêr û hokeran dikin. Herwiha ji aliyê pirsê ve jî van taybetîyan destnîşan dikin. Bandora hokeran herî pir li ser lêkeran in.”⁶

Halil Altuğ jî gotiye “Hoker wateya lêkeran, rengdêran, hokeran ji aliyê rewş, dem, çiqasî (piranî û hindikayî) cih-alî û ji aliyê pirsê ve dide diyar kirin.”⁷

Dema termên rêzimanê werin bijartin û bê kategorîzekirin, divê mirov li gor rêbazên zimanê xwe bifikire. Divê pêşî mirov lê binêre di têgehên zimanê me de ew peyv an ji wek wê peyv heye an jî nîne.

Mînak: Cihnav têgeheke kurdî ye. Ev têgeh tîne bîra me ku ev navdêr tê cihê navan. Ne pêwîst e jî ku em cihnavê ravebikin. Di navbera wateya peyvê û wateya bingehê de ahengeka pir xweş heye. Lê belê ji bo hokerê em nikarin vê bibêjin. Di navbera wateya peyva hokerê û wateya bingehîna wê de wekhevî nîne. Ji ber vê yekê ye jî kategorîkirina hokeran jî curbicur in. Loma hevalkar belkî jî navekî xweştir e û resen e. Lê belê zîmannasên me bi gelemperî hoker bi kar tînin em ê jî hokerê bikarbînin.

Hoker ew bêje an jî komebêje ye ku lêkeran, lêkernavan, rengdêran û hokeran wekî xwe li gor demê, cih û aliyê, mêjerê, rewşê û pirsê dide nasîn û bandora xwe li ser wan dike. Wateya wan xurt dike û diyartir dike û wan tamam dike. Bandora hokeran herî zêde li ser lêkeran in. Ji ber vê yekê em ji hokeran re dikarin bibêjin “**hevalkar**”.

Mînak: “Îro heye sibe tune.”⁸ (Dem)

“**Li bin** sîha daran sêv nakevin devan.”⁹ (Cih û alî)

⁶Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî* (Îstanbul: Weşanên Wardoz, 2018), 99.

⁷ Halil Altuğ, *Gramera Kurdî-Kürtçe Gramer* (Îstanbul: Avesta, 2013), 440.

⁸ Amed Tîgrîs, *Gotinên Pêşîyan* (Stocholm: Weşanên Rewşen, 2001), 121.

⁹ Tîgrîs, *Gotinên Pêşîyan*, 159.

“Dewlemend zehf bûn, kul û derd **pir** bûn.”¹⁰ (Mêjer)

“Te cin komkirin, divê tu zanibê **çawa** belavkê.”¹¹ (Pirs)

“**Baş** be û ne belaş be.”¹² (Rewş)

Di jorê de diyar e ku hoker di hevokê de li gor bikaranîna mebestê têne binavkirin. Ji bo ku navên van hokeran rast werin binavkirin, pêwist e ku meriv li hevokê li wateya wan û ji bo kîjan armancê têne bikaranîn binêre. Ji bo wateya demê “ **Hokerên Demê**”, wateya neyînîyê “**Hokerên Neyînîyê**” wateya cih û alî “**Hokerên Cih û Aliyan**” tê binavkirin. Rêbazeke şaş jî ev e ku mirov pirsê li lêkerê bike carinan bersiva me rastûrast nade me.

Mînak: Barê ker tîfing bin jî dê **dîsa** gur kerê bixwe.

Em nikarin pirsekê ji vê lêkera “ xwarin” bikin. Ne gengaz e. Lê belê em zanin ku “**dîsa**” peyveke dubarekirinê ye. Lewma em dikarin bibêjin ev hoker “**Hokera Dubarekirinê**” ye. Eger em hokeran wiha bidin nasîn dê hînkirina ziman jî hesantir bibe. Lewra rêbaza ziman jî heye. Divê em li gor wê rêbaza ziman herin û hokeran wiha bidin nasîn. Wê demê kesên biyanî jî zimanê me hesantir hîn bibin.

Mînak: Feqîr ji lewma jar e, **ji ber ku** axîna wî av û dar e. (Wateya **sedemîn** e.)

Feqîrî ne **tu** çek e, li xwe meke. (Wateya **neyînîyê** ye.)

Bavêje pişt **belkî** jê derkeve tişt. (Wateya **guman û pêşbînîyê** ye.)

Erê me deve nedîtiye, **ma** pişkulên wan jî nedîtiye? (**Erê** wateyan **Erêkirinê** ye û **ma** jî wateya **pirsyariyê** ye.)

¹⁰ Elî Cefer, *Gotinên Pêşiyayî* Weşanên Xanî, 2006), 21.

¹¹ Cefer, *Gotinên Pêşiyayî*, 63.

¹² Tîgrîs, *Gotinên Pêşiyayî*, 20.

1.2 HOKER JI ALIYÊ WATEYÊ VE

1.2.1 CUREYÊN HOKERÊ

Di pirtûkên me yên rêzimanî de hoker cuda cuda hatine dabeşkirin. Rêbazên dabeşkirina van pirtûkan ji hev cuda ne. Em ê li jêrê qala van pirtûkên hatin analîzkirî bikin.

Celadet E. Bedirxan hoker kiriye heft cure: “1. Hokerên rewşê 2. Hokerên mêjer û hejmar 3. Hokerên cih û alî 4. Hokerên demê 5. Hokerên erêkirinê û xwestekê 6. Hokerên neyîniyê 7. Hokerên pirsê û pêşbîniyê.”¹³

M. Malmîsanij jî hoker di pênc beşan de analîz kiriye: “1. Hokerên cih û alî 2. Hokerên demê 3. Hokerên pirsyarî 4. Hokerên rewşê, çawaniyê 5. Hokerên çendaniyê.”¹⁴

K. Yıldırım hoker di şeş beşan de analîz kiriye: “1. Hokerên demê 2. Hokerên cihî 3. Hokerên rewşê, çawaniyê 4. Hokerên çendî 5. Hokerên pirsyariyê 6. Hokerên nerêniyê.”¹⁵

S. Tan di nav zimannasên me analîzkirî de cureyên hokeran herî zêde ew nivîsandîye. Wî hoker kirine sêzdeh beş: “1. Hokerên rewşê 2. Hokerên şanîdanê 3. Hokerên demê 4. Hokerên cih û berekê 5. Hokerên çendanî û hevrûkirinê 6. Hokerên pirsyariyê 7. Hokerên sedemîn 8. Hokerên teqezî û erêkirinê 9. Hokerên neyîniyê 10. Hokerên guman û pêşbîniyê 11. Hokerên kê-m-zêdetiyê 12. Hokerên dubarekirinê 13. Hokerên bisînorkirinê.”¹⁶

B. Baran jî hoker kirine şeş beş: “1. Hokerên çawaniyê 2. Hokerên demê 3. Hokerên mêjerê 4. Hokerên cih û aliyan 5. Hokerên pirsîyarî 6. Hokerên nîşanî.”¹⁷

¹³ Celadet Alî Bedirxan-Roger Lescot, *Kürtçe Gramer* (İstanbul: Weşanên Avesta, 2012), 259-268.

¹⁴ Mehmet Malmîsanij, *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kurmancca (Zazaca) Dilbilgisi* (İstanbul: Weşanên Vate, 2015), 159-176.

¹⁵ Kadri Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi* (İstanbul: Weşanên Avesta, 2013), 174.

¹⁶ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 184.

¹⁷ Baran, *Rêzimana Kurmancî*, 99-103.

N. Ocek jî hoker kirine şeş beş: “1. Hokerên çawaniyê 2. Hokerên şanîdanê 3. Hokerên demê 4. Hokerên cih û berekê 5. Hokerên çendaniyê 6. Hokerên pirsiyariyê.”¹⁸

A. Bakır jî hoker kirine şeş beş: “1. Hokerên demê 2. Hokerên cih û bergê 3. Hokerên çawaniyê 4. Hokerên çendanî û payeyê 5. Hokerên şanîdanê 6. Hokerên pirsiyarî.”¹⁹

Ş. Aslan jî hoker kirine pênc beş: “1. Hokerên demê 2. Hokerên rewşê 3. Hokerên cî û alî 4. Hokerên çiqasiyê 5. Hokerên pirsê.”²⁰

H. Altuğ jî hoker kirine pênc beş: “1. Hokerên demê 2. Hokerên rewşê (çawani) 3. Hokerên cih û alî 4. Hokerên çiqasî 5. Hokerên pirsê.”²¹

Kamran Bedirxan hoker kirine pênc babet: “1. Hokerên cihkî 2. Hokerên demkî 3. Hokerên çiqasî 4. Hokerên awakî 5. Hokerên erîni û gumanî 6. Hokerên neyinî”²²

K. Badıllı jî hokera wî şeklî dabeş dike: “1. Hokerên demê 2. Hokerên cih 3. Hokerên Çawaniyê û Hêjmar 4. Hokerên Erêkirinê, Nefî, Guman û Pirs”²³

Mûrad Ciwan jî hoker kirine pênc beş: “1. Hevalkarên deme 2. Hevalkarên cih û bergehê 3. Hevalkarên rewş 4. Hevalkarên çendahî 5. Hevalkarên pirsînê”²⁴

Feqi Huseynê Sağnıç hoker kirine pênc babet: “1. Hokerên demin 2. Hokerên chin 3. Hokerên çawani 4. Hokerên çiqasi 5. Hokerên pirsiyari.”²⁵

Mela Yunusê Helqetanî jî hokera dixê bu beş: “Zerf dibe du kisim. 1. Zerfê heqîqî (Hokera rasteqînî) 2. Zerfê mecazî (Hokera mîrandî).”²⁶

Zimannasên me di pênc-şeş cureyên hokeran de wek hevdu difikirin. Dabeşkirina wan hokeran li gor binavkirina hokeran diguhere. **Mînak:** Ji hokerên mêjerê re Samî Tan dibêje Hokerên çendanî û hevrûkirinê, Kadri Yıldırım dibêje Hokerên çendî. Nezîr Ocek

¹⁸ Ocek, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, 172-178.

¹⁹ Bakır, *Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî*, 131-135.

²⁰ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*, 187.

²¹ Altuğ, *Gramera Kurdî-Kürtçe Gramer*, 440.

²² Kamiran Bedirxan, *Rêzimana Zimanê Kurdî* (Paris: 1971), 55.

²³ Kemal Badıllı, *Türtçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)* (İstanbul: Med Yayınları, 1992), 99.

²⁴ Mûrad Ciwan, *Türkkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kumanc Lehçesi* (İsviçre: Jîna Nû Yayınları, 1992), 157.

²⁵ Feqi Huseyn Sağnıç, *Hêmana Rêzimanê Kurdî* (İstanbul: MELSA Yayınları, 1991), 194.

²⁶ Mele Yûnisê Helqetanî, *Ez-Zuruf ve't-Terkib* (İstanbul: Şifa Yayınevi, 2015), 10.

jî dibêje Hokerên çendaniyê. Şêxmûs Aslan jî dibêje Hokerên çiqasiyê. Ev nîqâşeke dûvdirêj e. Em dikarin bibêjin nav di dayîna hokeran de hema bê ramanêke hevpar tune ye.

Divê hoker di hevokê de li gor armanca bikaranînê ve cuda cuda bê binavkirin. Eger ku ji bo armanca bikaranîna cih hate ragihandin “**Hokerên Cih**”, ji bo armanca bikaranîna demê hate ragihandin “**Hokerên Demê**”, ji bo armanca bikaranîna beranberî hate ragihandin “**Hokerên Beranberî**”.

“Hikmê “Pênç hêmanên hevokê hene” wek qanûna bingehîn parastina wê divê em jê biqerin. Ji ber ku hejmartina hêmanên temamkerê pêveberê, li cihekî sabit kirin ji zimannasiyê nûjen re gengaz naxuyê. Hewl didin ku hevokê têxin nav pênc hêmanan me neçar dike ku em bêjeyan û komên bêjeyê yên ku di hevokê de ji bo mebestên cihêreng hatine bikaranîn bi heman navî binavbikin. Em bawer dikin ku binavkirina hêmanan li gorî armanca wan a karanînê rêbaza herî guncan e ku dikare di hînkirina tirkî de were şopandin. Dema ku ev rêbaz were şopandin, dê were dîtin ku ew di analîzkirina nivîsê de zehf bibandor e.”²⁷

Samî Tan cureyên hokeran herî zêde dane pêş me. Ew jî li gor vê rêbazê jêrê çûye. Yanî di senifandina hokeran de sînor li gor wateyê ye. Çend wate hebim ewqas jî cureyên hokeran hene. Lê belê zimannasên me wek tixûbek danîne ber xwe û zêdetir hoker nepejirandine.

Di kurdî de dema me lêkolîn kir ne tenê pênc an jî şeş cure tene me dîtin. Nêzîkî 25-30 cureyên hokerê derketin pêş me. Lê belê ji bona hinkirina kurdî zimannasên me hoker xistine 5 an jî 6 cure. Di vê tezê de jî em sînorekî nadin dabeşkirina hokeran û em çiqas karibin behsa hemî hokeran bikin. Lê belê zimannasanên kurdî hoker xistine pênc-şeş cure. Ew hokerên em ê behsa wan bikin jî di nav cureyên Hokerên rewşê de ne. Lewra Hokerên rewşê an jî çawaniyê rewşa hemî tiştan dide nîşan.

²⁷ Celal Demir, "Türkçe Öğretiminde Zarf Tümlerleri", *TÜBAR* 13/2003 Bahar), 417.

Tesnîfkirina cureyên hokeran di vê tezê de wiha ye:

1. Hokerên Demê

- a) Hokerên Demê yên Sînordiyar
- b) Hokerên Demê yên Sînornediyar
- c) Hokerên Frekansê (Pircarî)

2. Hokerên Cih û Aliyan

3. Hokerên Mêjerê, Çendanî

- a) Hokerên Wekhevîyê:
- b) Hokerên Berawirdî
- c) Hokerên Herî Raserî

4. Hokerên Pirsyarîyê

5. Hokerên Rewşê / Çawaniyê (neyîniyê, teqezî, erêkirinê, xwestekê, guman û pêşbîniyê, sedemîn, dubarekirinê, bisînorkirinê, şanîdanê û kêmezêdeyîyê, amûrî, armancê, beranberîyê, bibîrxistinê, birêzkirinê, cextdarê, dabeşanî, dijberîyê, domdarîyê, berdewamîyê, jimarîyê, mînakdayinê, mercê, şaşbûyinê)

1.2.1.1. Hokerên Demê

Hokerên demê wateya lêkerê ji aliyê demê ve dîyar û zelal dikin. Ev cure dema karên lêkeran nîşan dide. Em ji vê hokerê zanin ku di hevokê de kar kengî çêdibe. Ne hewce ye ku mirov pirsan li lêkerê bike. Li armanc û wateya hevokê binêrin bes e.

Mînak: Adar e **sibehê** sar e, **nîvro bihar** e. Li vê mînakê de sê bejeyên wateya demê nîşan dide hene. Ew peyvên hevokê ji aliyê demê ve lêkerê tamam dike.

Ev mînakên hokerên me li jêrê dan bi gelemperî di nav pirtûkên me yên rêzimanî de derbas dibin. Bi piranî di nav gel de têne bikaranîn. Armanca me ev e ku di nav gotinên pêşiyên de ihtîmala bikaranîna van hokeran em ê nîşan bidin. Varyasyonê van hokeran jî me meraq kir ka çawa têne bikaranîn. Ji ber ku

mînakên hokeran pir zêde bûn, me jî gotinên pêşiyên zêde mînak dan. Ev rêbaz ji hemû hokerên kurdî ku em ê qalê bikin re gengaz e.

Mînakên ji gotinên pêşiyên:

Berê, berî: “**Berê** bi axive, paşê bikene.”²⁸

Berê şekir û şîr, paşî şûr û tîr.

Mêvan **berî** ku rûne mîr e, gava rûnişt esîr e û dema rabe begzade ye.

Berî derziyê di xwe de bike û paşê jî şujinê di hevalê xwe de bike.

Bi roj, nîvroj: Bi roj li dêrê ye, bi şev li mizgeftê ye.

Bi roj pîrhevok e bi şev şemamok e.

Bi şev: Bi şev rêwî li riyan, qeda li ber pîyan.

Dewleta pelegewr e **bi şev** sahî ye û bi roj ewr e.

Car: Qewlê mêran sê **car** e.

Malxotî ket destê kurî, kîskê salê sê **car** birî.

Carekê: Ker **carekê** dikeve heriyê.

Were ba min salê **carekê** bi sultanî, mehê **carekê** bi mêvanî, rojê **carekê** bi dilmanî.

²⁸ Tîgrîs, *Gotinên Pêşiyên*, 24.

Danê êvarê: Tava biharê dikeve **danê êvarê**.

“Adar e dew li dar e, danê sibehê sar e, **danê êvarê** kûçik xwe davêje ber siha dîwar e.”²⁹

Dawî, dawiyê: Bi keran re negerin dê **dawî** bizirin.

Pêşî xweş dike **dawî** reş dike.

Yê ku **dawiyê** bikene xweştir dikene.

Ez gerîm û min dinya dot, **dawiyê** vegerîm pêz û cot.

Dem: Zêr narize û **dem** naze.

Demekê: **Demekê** gulê ye yekê sosinê ye.

Dinya dewran e, **demekê** gul e, **demekê** gulşîlan e.

Dereng: Bila baş be bila **dereng** be.

Biharê zû pez ter meke payîzê jî **dereng** mexe.

Biharê xwe têr neke payîzê xwe **bi derengî** nexe.

Do: **Do** ji hêkê derketiye îro bi mirîşkê qayîl nabe.

Ro bi ro, xwezil bi **do**.

Dusibê: Îro sar û serma ye sibê def û zirne ye **dusibê** daweta te ye.

Êvar(ê): “Adar e dew li dar eberf gîya serê darê lê ne bû **êvarê**.”³⁰

Bayê sibehê li mirovan nexe yê **êvarê** hîç e.

²⁹ Cefer, *Gotinên Pêşiyên*, 5.

³⁰ Azad Badikî, *Pêşgotinê Kûrdî-Gotinên Berya* ts.).

Ewil: Ewil dibêjin şêrejin paşê dibêjin şêremêr.

Gav, vê gavê: Vê navê, **vê gavê** Mihemed Givê “g...k” divê.

Geh...geh: Dinya bi dor e **geh** li jêr û **geh** li jor e.

“Dinya siya darê ye **geh** li vir e û **geh** li wir e.”³¹

Her: Riya ga **her** gelî ye.

Serê merdan **her** bilind e.

Her û her: Xelkê bîyanî bide wan goştê canî, **her û her** tu poşman î.

Her roj, her ro, hero: Şekir şêrîn e lê **her roj** nayê xwarin.

Mêrxas carekê dimire, bizdonek **her roj**.

Apê Xidir e **her ro** li vir e.

Mala li kerekî, **her ro** li derekî.

Kero, mevanê **hero**.

Kesîs **hero** kata naxwe.

Heta: Xaniyê xwe xirab neke **heta** ku tu yekî din çênêkî.

Kusî çû tovê garis, **heta** hat li şimêlan leqîfî.

Hêj, hê, hîn: Dîkê dewlemendan **hêj** jî dîk e.

Ev lêlê ye **hêj** lolo maye!

Piştî tirê **hê** kezîkurê.

³¹ Çiya Mazî, *Ferhenga Gotinên Pêşîyan* Elma Yayınları, 2005), 25.

Hê di kaniya xortan da av venexwariye.

Cîhê ku jinan xerab nekiriye **hîn** ava ye.

Ev **hîn** nîna ye timîna **hîn** maye.

Hindî, hingê: Xwedê hind baranê dide ku **hindî** erd ragire.

Hindî adarîk li nav mehan be, zozan li pîrê heram be.

Ber li şixulê bigire ku hîn ne qewimî ye, **hingê** qewimî bê feyde ye.

Kengî bibarî **hingê** zivistan e!

Îcar: De **îcar** (**îja**) te girte xwe.

Melezade melezade, me ter xwar zed u zewad e **îcar** her yek me di alîkî de bad e.

Îro: Ol û îman e, **îro** Ezdî ye û sibehê Musilman e.

Îro derziyek dizî sibe dê deveyekê bidize.

Îsal: **Îsal** dîsa bal kesîv e.

Par mirdî, pêrar mirdî, kefen zerdî, **îsal** dibejî “şîrdî birdî”.

Niha, nûka: Apke (Apê) Faris, **niha** tu nemirî tuy e beyî nav garis!

Heke ya min/wî bikira **niha** hustuna wî zer bû.

Piştî tirê **nûka** kezîkurê.

Nivro: Adar e sibehê sar e, **nivro** bihar e.

Sibehê pez, **nivro** rez, êvarî tu û ez.

Nû: Xelk ji hewarê tê, em **nû** diçin hewarê.

Mirî bin ax dibe, **ji nû de** bi xwedî û şax dibe.

Par: Sal bi sal xwezî bi **par**.

Feqîr û jar wek **par** û pêrar.

Paşê, paşî: Pêşî gotina xwe bipêje û **paşê** bibêje.

Gur neçîra xwe vedişêre, **paşê** bi ser ve nabe.

Xudê serî dibînit, **paşî** şaşê tê dialînit.

Paşî to kûşê bi ser Moşê da tînî xarê.

Pêrar: Belengaz û jar wekî par û **pêrar**.

Par mirdî, **pêrar** mirdî, kefen zerdî, îsal dibejî “şîrdî birdî”.

Piştî: **Piştî** baranê kerê cil neke.

Piştî her şerî aşî heye.

Piştire: Ulmdar peşî ji kîsê xwe dixwe, **piştire** ji eqilê xwe dixwe.

Pêşî can û **piştire** canan.

Rojek: Mirov hezar sal li dinê be **rojek** mêvanê gorê ye.

Rojek rijîya, **rojek** pijîya û bihar qediya.

Semî, yeksem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem, î: **Semî** maka hemû rojan e.

Cihû te bibim buhiştê! *Got:* Na, îro **semî** ye bi kêr naye.

Salek: Êk ê danî jina xwe, got to çima **salek** dî naçî kerenga.

Heft salên xelayê xweştir in ji **salek** neyartiyê.

Sal bi sal: **Sal bi sal** xwezî bi par.

Sibe: Îro heye **sibe** tune.

Îro nebû bihêle **sibe**.

Şev, bi şev: Qedrê hîve tune heta ku nebe **şev**.

Şev çiqas dirêj bê, roj yê derkeve.

Bi roj pîrhevok e **bi şev** şemamok e.

Bi roj li dêrêye, **bi şev** li mizgeftê ye.

Timî: Cewrê seyê dir **timî** dir in.

Çiyaye bilind **timî** li ser dûman heye

Tim û tim: Qîza xizan e, wek strîkên ezman e, **tim û tim** erzan e.

Tim û tim çêlek naye dotin, her gotin naye gotin.

Zû: Tu bi hijdî bazdî dê tu **zû** biwestî.

Xebera reş **zû** belav dibe.

Kadri Yıldırım Hokerên Demê kirine du beş. “**1.Hokerên Demê yên Sînordiyar:** Vana hokerên demê ne ku destpêk û dawiyana wan diyar û sînordar in. **Mînak:** Sal, demsal, meh, hefte, roj û şev, dan, saet, deqe/deqêqe, saniye, salîse”³²

³² Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, 174-175.

“Tablo 1 Demsal û Meh”³³

Bihar	Havîn	Payîz	Zivistan
Adar	Xizêran	Îlon	Kanûn
Nîsan	Tîrmeh	Cotmeh	Çile
Gulan	Tebax	Mijdar	Sibat

“Tablo 2 Rojên Hefteyê”³⁴

Şem(î)
Yekşem
Duşem
Sêşem
Çarşem
Pênçşem
În

“Tablo 3 Dan”³⁵

Berbang
Sibeh
Nîvro
Berêvar
Êvar
Îşa
Şev

Mînakên dî: Duh, pêr, par, pêrar, îsal, îro, îşev, niha, hîn, cih de, hema, zû...

“2.Hokerên Demê yên Sînornediyar: Vana hokerên demê ne ku destpêk û dawiya wan nediyar û nesînordar in.”³⁶

³³ Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, 175.

³⁴ Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, 175.

³⁵ Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, 175.

³⁶ Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, 176.

“**Mînak:** Gav/dem, hergav, hertim, heyam, berê, paşê, berî, heta evarê, dawiyê, piştî, peyre/dûre, di pey re, hindî/hingê, zû, dereng, kotek/ancax, gavinan, carinan, geh geh, carekê, îcar, zinhar, cardin, dîsa(n), ji nû ve, êdî, hew, hêj, gavekê, roj bi roj, bîstekê, pîçek, gelekî”³⁷

Mirov dikare cureke dî jî hokerên demê ve zêde bike. Navê wê jî **Hokerên Frekansê/Pircarî** ye. Ev hoker gumrehiya karê lêkerê nîşan dide û lêkerê ji aliyê gumrehiyê ve temam dike. Di Ingîlizî de ev cure heye. Navê vê cureyê jî “Adverbs of Frequency” ye. Dibe ku di kurdî de jî ev cure hebe. Lê mixabim tu zimannasên kurdî derheqê vê hokerê de tiştek negotine. Me jî wek îngîlizî ev cure amade kir û nivisî.

Tablo 4 Hokerên Frekansê/Pircarî

% 100	Hertim, Her dem, Her gav
% 85	Bi piranî, Bi gelemperî
% 75	Zaf caran, Pir caran
% 50	Carna, Carinan
%25	Kêm caran
% 0	Tu carî, qet

Mînak: **Carna, carina, carinan, car caran:** Carna mirin dibê zêrê zer, lê bi dest mirov nakevê.

Carna mirov ji yarê diya xwe re dibê bavo.

Carinan dims rûn e, **carina** qetil xwîn e.

³⁷ Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, 176-178.

Rastî, **carinan** serî dişkîne.

Carina mirov ji mecburî goştê kewan jî dixwe.

Car caran tîne, gayê reş baran tîne.

Her dem: Dem bi demê re **her dem** bi Xwedê re.

Her dem şer çêdibe li ser tola jinan.

Her car: **Her car** ji mirov re li hev nayê.

Her car kewa gozel nakeve torê.

Her gav: Dem bi dor e **her gav** li ber deriyê yekî disekine.

Diya mirov **her gav** law nayîne.

Hertim: Coka av tê re çûye wê **hertim** tê re here.

Serê kesê rastgo **hertim** bilind e.

Qet: Dinyayeke boş û betal e ji kesî re **qet** nebû mal e.

Tava sibehan pere nake, tava êvaran **qet** pere nake.

Tu carî, tu car : **Tu carî** derew meke, heke derew zîv be, rastî elmast e.

Hîleker **tu carî** têr naxwe.

Ya **tu car** hilnegire bar ya jî tu ketî meke hewar.

Aşvan **tu car** nabe poşman.

1.2.1.2. Hokerên Cih û Aliyan

Hokerên cih û alî ji navê xwe jî dîyar e ku ev hoker wateya lêkerê ji hêla cih û aliyan ve tamam dike û xurt dike. Piranî bi daçekan tên bikaranîn. Di hinek pirtûkan de pirs li lêkera têne kirin. Wî şeklî jî dixwazin hokerên cih û aliyan bibînin. Lê ne pêwist e ku mirov pirsan li lêkerê bike. Li armancê an jî wateyê binêrin bes e.

Mînak: Ferehî zû **li pey** tengasîye tê. Di vê mînakê de “**li pey**” wateya alî nîşan dide. **Banê xanî** tenê bi keviran bilind nabe. Li vê mînakê jî “**ban**” wateya alî û “**xanî**” jî wateya cih dide nîşan. Em ê li gor armancê û wateya van hokeran nas bikin.

Mînakên ji gotinên pêşiyên:

Alî, hêla: Ruto ha **vî alî** ave, ha **wî alî** av e.

Ba **vî alî** dixê, **wî alî** re derbas dike.

Eşîretek **li hêla** Hekarî.

Ba, li bal: Agir û barût **li ba** hev nabin.

Astenga mezin **li ba** deriyê mala mirov e.

Tiştê min li mal e, xeyala min **li bal** e.

Bajar: Çiya bilind e, li dorê **bajar** û gund e.

Galgala ket nav dev û dirana, wê bigere li **bajar** û şaristana.

Bakur: Bayê **bakur** ji bav û bira çêtir e.

Li Başûr bihar zû tê lê li **Bakur** dereng tê.

Banî: Kubarî mirov hildikişîne **banî**, pozbilindî mirov dadixe binê xanî.

Behr, derya: Ji hevdu re mar in, ji xelkê re **behr** in.

Behr bi devê se nalewite.

Bi kulmek xwê **derya** şor nabe û bi tozek ax çav kor nabe.

Anî ji **derya** da xêra mirîya.

Ber, li ber: Agirê dilan, darê **ber** pilan.

Av **ber** bi hevrazî ve naçe.

Agir girtibû mala yekî yê din ser û pê **li ber** dikizirandin.

Apê Faris çi li mal çi **li ber** garis.

Berjêr: Heta hevraz nekeve ber mirov, mirov qedrê **berjêr** nizane.

Şivano heger mêrg e, serê miya reş **berjêr** meke.

Berjor: Çûk çûk e gava avê vedixwê, **berjor** li Xwedê dinêrê.

Berjêr tûkî rih e, **berjor** tûkî simbêl e.

Berve: Timî bere kevçî **berve** xwe dike.

Bilind: Banê xanî tenê bi keviran **bilind** nabe.

Bilind nefire da ku tu li erdê nekevî.

Bin, binî, li bin, di bin de: Bila mirov xwedî qedir be lê ne di **bin** siya qedir de be.

Cenet û cehenem di **bin** pîyê dayikê de ye.

Pîvaz, pîvaz e, çi serî ye çi **binî** ye?

Mala Eliye Xişo, ba dibe û baran dişo, serî qûç e û **binî** pûç e.

Axa li kêfê ye mal **li bin** berfê ye.

Bila mirov dûr be ne **li bin** axa kûr be.

Çavê ku bi kêr nayê, tiliya xwe **di bin de** ke û rake.

Dewleta ku ba **di bin de** here ne tu dewlet e.

Bi pêş ve: Qantir **bi peş ve** gez dike, bi paş ve zîtik davêje.

Bi ser de: Ku dev bi derd e, kevir **bi ser de**.

Me Cizîr ava kir, Heso **bi ser de** zava kir.

Bi şûn ve: Gur dibêje: Heta kuştina heft pezan wesîyeta bave min e, ji wir **bi şûn ve** mêraniya min e.

Cem: Di **cem** kuçikê har re mere.

Ga û parî li **cem** mirovê comerd yek e.

Çem: Hîn **çem** nedîtiye derpiyê xwe derdixe.

Ji deryayê derbas dibe di **çem** de dixeniqe.

Çep: Felek çerx e **çep** û rast dizivire.

Firfirka li ber til e, **çep** û rast diftile.

Dawî: Parî bi fêde ne **dawî** bi serhevde ne.

Qise hezar e **dawî** bê kar e.

Der: Roja bager ji malê meçe **der**.

Yê **der** hat yê hundir qewitand.

Derve, derva, ji derve, li derve: Mala mamê şeker e, **derve** ji hundir çêtir e.

Ê **ji derve** hat, ê hundir qewirand.

Çume **derva** Fatekor, hatim hundir xatekor.

Hundir bi qurbanî **derva** be, **derva** bi qurbanî hundir be.

Pisîka hundur bera a **ji derve** dide.

Li nav malê sêr e, **li derve** (yan: li nav êlê) kitika bê kêr e.

Di ber de: Hat ji der de topiz **di ber de**.

Heger xwarin **di ber de** ma avê bînin, û heger av dîber de ma kefen bînin.

Dibistan: Dibistan kana zanîne ye.

Mal **dibistan** e dê û bav mamoste ne.

Di nav de: Şer ku mirov **di nav de** be xweş e.

Welat welatê Kurda ye, milletê Kurd **di nav de** wenda ye.

Dor: Hat nav mala tirî, Zeyno da bêjîngê li **dor** benderê zivirî (fetilî).

Wêde têm heytehol e, sara piştê **dor** bi gol e, dê xatûn e û qîz tol e.

Dû, li dûv: Bi **dû** tengasiye re firehî ye.

Gilî ku çû edî nede **dû**.

Her gulîsorek, çavreşek **li dûv** heye.

Her se **bi dûv** mirov naye ku zanibe hestî ji dest naye.

Dûr: Gûndê ava ji **dûr** ve xuya ye.

Heçî ji çav **dûr** e, ji dil jî **dûr** e.

Gund, li gund: Jin ku heye zeviya li ber **gund** e.

Ne jina parî rind ne mêvanê mal **li gund** û ne belengazê pozbilind.

Cîhê yekê **li gund** nebû, digot: Cîh kê in.

Hindur, hundir: Mala Mamê Şekir e, derve ji **hindur** çêtir e.

Zor di derî re bikeve **hundir**, qanûn di kulekê re derdikeve.

Yekî du gaye wî hebun, yek nediket **hundir**, yek jî ji **hundir** dernediket.

Hember: Konê mêran li **hember** in.

Kûsiyen kendalan xwe dikin **hember** xezalan.

Ji ser, di ser re: Pismam, dotmamê **ji ser** pişta hespê peya dike.

Xêr li ser xêrê tê, baran **ji ser** deryayê tê.

Alim bibe rê **di ser re** derbas nebe.

Jêr, li jêr: **Jêr** erd e jor ezman e.

Jor xemiland **jêr** qefiland.

Cîhan bi dor e, mirov li **jêr** e, yan li jor e.

Çerxa felekê geh **li jêr** e û geh li jor e.

Jor, li jor, jor de, bi jor: Ez kor û tu kor, dê kê mehîrê bibe **jor**.

Ber jor tu tif bikî rû ye, ber **jor** simêl e.

Dem bi dor e geh li jêr e geh **li jor** e.

Dewran siya darê ye, geh **li jor** e, geh li jêr e.

Zer da bi zer, kirkirk **jor de** daser.

Ava dînan **ber bi jor ve** dimeşe.

Piyal ser **bi jor** tijî dibe, kom ser bi jêr.

Kêlek, li kêlekê: Mirov ji qehrê dijminê xwe **kêlek** xwe dixwe.

Di ortê de dirî **li kêlekê** rudine.

Li dûv: Her gulîsorek, çavreşek **li dûv** heye.

Gazîya **li dûv** girî ye.

Li her derê: Lawo **li her derê** ji xwe re malekê çêke.

Li nik: Doz **li nik** şûr û pera.

Hesp û kesp **li nik** wî yek in.

Li ser: **Li ser** bextê keçan rûnenin.

“Aqil tacek zêrîne belê **li serê** hemî kesê nîn e.”³⁸

Li ser hev: Deve çiqas dûrên hev biçêrin dîsa guhên wan **li ser hev** in.

Mal, li mal, ji mal, di malê de: Diz **ji mal** e, derî bê havil e.

Mal ji can re, can **ji mal** re.

Dizê te **li mal** be dergeh girtin betal e.

³⁸ Mele Mehmûd Dêrşewî, *Miştaxa çiya ji gotinên pêşiya*, thk. Serbest Zaxoyî (Stockholm :[s. n: 1989), 16.

Feqîr **li mal** e, aş betal e.

Agir **di malê de** leme-leme, cîh ji keç û mişkan re nema.

Bila şîn **di malê de** be lê şer **di malê de** nebe.

Nav, li nav, di nav de: Derew bibin xwelî navêje **nav** zeviya xwe.

Ez axa, tu axa kê pez bibe **nav** baxa?

Bila bi dil be tûrê parsê **li nav** mil be.

Bila rezê min **li nav** rezan be bila tirî li min heram be.

Beranê bisko bûya dê **di nav** pezê bavo bûya!

Bila jina çê be bila **di nav** ordiya Romê de be.

Dara **di nav rez de** gurê **di nav pez de.**

Di nav mêran de mêr be **di nav şêran de** şêr be!

Nêzîk: Dûr gerî, **nêzîk** dî.

Pal: Heger tu havînê li her sîyê **pal** bidî, dê tu zivistanê jî zikê xwe miz bidî.

Paş, paşve, li paş, ji paş ve, bi paş ve: Şêr xwe ji mêşan didin **paş.**

Tewaş nan dide **paş.**

Tirsonêk tim **li paş** in lê di revê de li pêş in.

Ye pênan dide li pêş wî here yê gez dike **li paş** wî here.

Hewar **ji paş ve** tê ew li pêş dinêre.

Ji paş ve refek e û ji pêş ve qefek e.

Qantir bi pêş ve gez dike, **bi paş ve zîtik** davêje.

Roja ku çû ava êdî **bi paş ve** venagere.

Paş de: Paş de anî manî peş de korpoşmanî.

Pey, li pey, pey ra: Se daye **pey** se, nan ji pisîkê re nema.

Rûtên **pey** şiliyê dest û piyên wan ziwa ne.

Ferehî zû **li pey** tengaziyê tê.

Li pey mirî kesî xwe nekuştî ye.

Miriyê mezêl şeva pêşî mêvan e, ya **pey re** cîran e û ya siseyan gundî ye.

Merik na pîre, **pey ra** guneh hat bîre.

Pêş, li pêş, ji pêş ve, bi pêş ve: Ku Xwedê bêje “erê” êdî kes nikare **pêş** lê bigire.

Malê te dibe belayê serê te û tê **pêş** te.

Li pêş diçe, dibejin “bîj e,” li paş diçe dibêjin “gêj e.”

Li pêş ziman ne dîwar in ne dîyar in.

Ji paş ve refek e û **ji pêş ve** qefek e.

Ji paş ve hanî manî, **ji pêş ve** korpoşmanî.

Qantir **bi pêş ve** gez dike, bi paş ve zîtik davêje.

Pêş de: Paş de anî manî **pêş de** korpoşmanî.

Pişt, li pişt, ji pişt: Bavêje **pişt** belkî jê derkeve tişt.

Deyndaran xwe avetin **pişt** xwîndaran.

Bizin ne tişt e lê nêrî **li pişt** e.

Çi **li pişt** dergûşê û çi **li pişt** deşta Mûşê.

Ji pişt te dixwin, şîretra li te dikin.

Rast: Bar xwar bû, divê heval hebe **rast** bike.

Bibêje **rast**, raze **rast**.

Rex: Kulê kovanê, mijê dûmanê, kêzika reş xwe daye **rex** mircanê.

Şêr **li rex** şêran dikeve.

Mîha xerîb **li rex** kerî mexel tê.

Ser, li ser: Şûrê hesin, tu heft salan bipesin, dê her biçe **ser** guhê gêsin.

Teyr biçe erş dê dîsa dakeve **ser** reş.

Şêrê her kesî **li ser** singa wî girêdayî ye.

Te dî kanî **li ser** danî!

Serpiştê: Belkî bi **serpiştê** ji mala xwe derdikeve.

Şûn, şûn de: Her kes qeleme bigire, sa wî **şûn** pir e.

Lawekî mirov hebê, mirov **şûn** wara namîne.

Bizina ku **bi şûn de** bimîne para gur e.

Gur dibêje: Heta kuştina heft pezan wesîyeta bave min e, ji wir **bi şûn ve** meraniya mine.

Memir heyfa te, tu mirî **ji şûn ve** kêfa te.

Gayê kor, **li şûn** afiran dimîne.

Tê de: Cineta ku ez ne **tê de** bim bila ker **tê de** bigevize.

Coya ku av **têde** çûye dê tim **têde** here.

Vir, li vir: Dinya siha darê ye geh **li vir** û geh li wir e.

Hîva gulanê, gamêşa qiranê ne **li vir** û ne derya Wanê.

Însan teyrê bê per û **ji vir** difire heta Feynter e.

Heta tu **ji vir ve** çûyî, ez ji wir ve hatime.

Wêda, wirde: Diz dibêje berosê; **wêda** biçe rû teniyê.

(filan kes) Jê **wir de** sevresî ye, kes nikare avê li destake.

Wir, li wir, bi wir ve, di wir da/de, ji wir, li wê derê: Çi li şîrê, **wir** li pîrê.

Kor li kilek dine (siwar dibe), heta digihên **wir**.

Jinebî li kur e, şer **li wir** e.

Kûçik li kû nan dixwe, **li wir** direyê.

Jin topaçî heriyê ne, tu li ku xî, wê **bi wir ve** bizemire.

Qanûn lastîk e, tu bi ku de bikişînî **bi wir re** dere.

Di kuda zirave (yan: qalinde), bila **di wir da** biqete.

Gerî li deşt û berî hew gundekî ebo-lebo hebû, çu **di wir de** jî rî.

Ew devera ku miskê heram bi namus be zanîn Xwedê evdên xwe **ji wir** dûr bixe.

Ev riya ku tu tê de diçî ez **ji wir** hatime.

Li ku derê komek **li wê derê** kedek.

Li kû derê leş **li wê derê** qijik.

Xanî: Mal jin e. Binyat **xanî**.

Ne ji min be ne ji te be dê **xanî** û mal xerabe be.

Xwarê: Paşe tu goşê bi ser Mûşê de tînî **xwarê**.

Tu çi texî kewarê de ew bê **xwarê**.

1.2.1.3. Hokerên Mêjerê / Çendanî

Ev cure hoker wateya lêkerê ji aliyê mêjerê ve tamam dike û xurt dike. Asta karê hatiyekirin nîşan dide. Em li Hokerê mêjerê/ çendanî yê pirsan li lêkerê nakin. Carna xeletî û şaşî derdikeve pêş me.

Mînak: Av **pir** rabe dê qirşikan bi xwe re bibe. Di vê gotina pêşyan de peyva “**pir**” wateya lêkerê xurt û tamam dike. Asta wê bilind dike.

Hokerên mêjerê di nav xwe de dibin 3 babet:

1. **Hokerên Wekhevîyê:** Ev cureya hokerê wateya wekhevîyê li lêkerê dike. Di nav hevokê de du tiştên wek hevdu hene. **Mînak:** Hema wisa, wek, weke, wekî, her wekî, fena, fîna, mîna, nola...

Mînak: Fena: Hebîbe Necar rakev **fena** her car, Xwedê yek e dergeh hezar.

Kevirê aş çiqas giran be jî, aşvan bi **fena** xwe wî radike.

Mîna: Herçî bi bira be **mîna** xaniyê bi çira be.

Herçî zanîn da zanyaran **mîna** hespê çê siwar e.

Wek, wekî, weke: Îlm **wek** behrekê bê binî ye, mirov di nav de wenda dibe.

Jina berdayî **wek** kerê bindore ye.

Jina bira **wekî** gura.

Kewên lîsandî **wekî** kelandî.

Wekî mêşê ye, deng **wekê** şeşê ye.

Ava ser berûyê **wekê** zavayê bi dilê xesûyê.

2. Hokerên Berawirdî: Ev cureyên hokerê wateya berawirdî li ser rengdêr, hoker û lêkeran dike. Em ji vê hokerê dizanin ku tiştin têne mukayesekirin. **Mînak:** Hinde, bi qasî, qeder, pirtir, zêdetir...

Hinde: Hinde pirtir e, çêtir e.

Ew ji ew **hinde** xurt e.

Pirtir: Hinde **pirtir** e, çêtir e.

Ji axê **pirtir** tine lê kûsî têr ax naxwe.

Qas, bi qasî: Kund dibêje ez ew **qas** im lê aqilê min jî ew **qas** e.

Dims çiqas di kûp de bimîne ew **qas** nêzîkiyê bi sîrkê dike.

Lingê xwe **bi qasî** mitêla xwe dirêj bike

Li ber çavê mişk pisîk **bi qasî** deve ye.

Zêdetir: Derb ji derban **zêdetir** e.

Gur ku gur e ew nikare ji qîsmetê xwe **zêdetir** bixwe.

3. Hokerên Herî Raserî: Ev cureya hokera bi peyva “**Herî**” tê çêkirin. “**Herî**” hokerek e bo diyarkirina ku tiştek yan kesek xwedî taybetmendiyekê ye ji hemû yan kesên din zêdetir e. “**Herî**” tê pêşiya rengdêran û dibe hoker.

Herî: Riya ku mirov dizane ya **herî** kurt e.

Ne xebitiye, para **herî** mezin ji xwe re girtiye.

Heçî li hespê hevalan siwar e, **herî** peyar e.

Mînakên hokerê mêjerê/çendanî ji gotinên pêşyan:

Bêtir, bêhtir, bihtir: Pêlên mayî ji ên buhurtî **bêtir** in.

Ker ku ket ji xwedî **bêtir** kes bi qisûr tine.

Ji laserê **bêhtir** ji ava sekan bitirse.

Rojên tên ji yên çûyîn **bihtir** in.

Çend: Çend pêtir e çêtir e.

Gur nizane quweta wî **çend** e.

Çêtir: Bav divê kur jê **çêtir** be seyda divê şagirt jê jîrtir be.

Ga mirar dibû xwedî digot ji min **çêtir** kes tune.

Ewqas: Beq çiqas kok dibe, “q.n” **ewqas** lê qalin dibe.

Çiqas sax bimînî, **ewqas** zehiya bibînî.

Gelek, gelekî: Berxa ber çêlekê, mala sermiyan yek, ava bû **gelek**.

Bide xortê çardeh salî dê **gelek** bîne bîra xwe wî halî.

Yê raze **gelekî** dizane hinekî.

Hindik re jî, **gelekî** re jî nabêje şukur.

Her car: Hoste necar rabe wek **her car**, rizq yeke û derge hezar.

Her car ji mirov re li hev naye.

Herçî: **Herçî** bi bira be mîna xaniyê bi çira be.

Herçî bindest e xwelî li ser e.

Hindik, hinek, hinekî: **Hindik** bide ber dasê ku tu nemînî li asê.

Hindik bixwe **hindik** bipeyve û **hindik** raze.

Yê raze gelekî dizane **hinekî**.

Hingî: **Hingî** rez qene bû teyrokê jî lêxist.

Mişkê kor **hingî** axê dikole, li ser serê xwe de dike.

Hîç: Bayê sibehê li mirovan nexer yê êvarê **hîç** e.

Hîn: Ber li şixulê bigire ku **hîn** ne qewimî ye, hingê qewimî bê feyde ye.

Cîhê ku jinan xerab nekirye **hîn** ava ye.

Kêm: Dema çeleka te **kêm** şîr bide wê bifroşe.

Girara pirkevanî yan şor e yan **kêm** xwê ye.

Mişe: Pere hebe helaw **mişe** ye.

Eger kelax ketin teyr **mişe** dibin.

Piçek, piçik: Yê kinisî çû ba yê dinisî gote: Ka **piçek** nanê garisî.

Mirov **piçik piçik** diçe ber kuçik.

Pir: Heger mirov diz be şev **pir** in.

Heger tu mêt bî, rojên cengê **pir** in.

Tev: Jina revandî dims û rûnê **tev** helandî.

Li mala bavê nexş û tevn çêdikir, li mala mêr **tev** ji bîr kir.

Têr: Gewende **têr** xwar dê li deholê bixe.

Bi berxêfî **têr** şîr venexwar bi kavirtî **têr** giya nexwar.

Zef, zehf: Li Bexdayê xurme **zef** in ji min ra çi ye?

Qîzan re neçin qîze ter in, jinebiyan re neçin **zef** digerin, dayikên derguşan re herin, zû vezerin.

Bila serî hebin kum **zehf** in.

Ez **zehf** stran dizanim lê dengê min tune.

Zêde zêde: Ji eşîran eşîra me, ji gundan gundê me, ji malan mala me, ji mala me jî ez û birayen xwe, lê **zêde zêde** jî ez.

Zêde, zêdetir: Balgiya pêşî **zêde** ye!

Bila sor be bila pênc qurîşên wê **zêde** be.

Derb ji derban **zêdetir** e.

Gur ku gur e ew nikare ji qîsmetê xwe **zêdetir** bixwe.

Zor: Zer zane, **zor** zane, devê tifînga mor zane.

Çov stûr e, tixûb **zor** e; çov zirav e, tixûb av e.

1.2.1.4 Hokerên Pirsyarîyê

Ev cureyên hokeran wateya lêkeran ji aliyê pirsê ve temam dike û xurt dike. Ev hoker bejeyên ku dem, cih û alî, mêjer an jî rewşa lêkerê ji aliyê pirsê ve dîyar dîkin.

Mînakên ji gotinên pêşyan:

Bi ku ve, bi ku de: Tu teyr î, ez xak im; tu **bi ku ve** herî dê tu li min vegeî.

Dar dikeve, berî **bi ku ve**?

Gur **bi ku de** diçe gurîtiya xwe bi xwe re dibe.

Tu **bi ku de** herî keç xwediye du “m...n” e.

Çawa, çer: Kor **çawa** li Xwedê dinêre, Xwedê jî weha lê dinêre.

Pisîkê **çawa** bavejî dîsa ew li ser lingen xwe disekine.

Dew tune fir bike lê li hespê siwar dibe **çir** dike.

Çend: Zan zane, bê baqê nîskan **çend** tane?

Gur nizane quweta wî **çend** e.

Çi: Heger ga bixebite û bi xwe bixwe dê golik **çi** bike?

Heger gelê te, ji te ne razî be, tu bibî Sultan Sileman xêr **çi** ye?

Çima, çira, çire: Ji kevjalê pirsîn: **Çima** tu lîyan lîyan bi rê ve diçî? *Got:* Pêşî bi reşî ye.

Ji deve re gotin ”**çima** tu bêmade yî?” *Got:* Hevsarê min di destê ker de ye.

Çira tu kesî heta sibehê naşixule.

Gotin: Flankeso jina te zehf digere! *Got:* **Çira** nexwe ez rojekê di mala xwe de nabînim.

Çire xizanî? Ji nezanî.

Çilo: Axayê me Pilo şîva kerê me bû **çilo**?

Ku malxoyê me Silo be dê xwarina me **çilo** be?

Çiqas, çiqas: Gotin: Te **çiqas** tenten kir? *Got:* Bi qasî vê demê.

Qijik reş e, **çiqas** xwe bişo dîsa spî nabe.

Mal **çiqas** mezin dibin, kul û derd giran dibin.

Mirîşk û mitirb û mêş, her sê bi ser êş, **çiqas** tu paş de bidê, tèn pêş.

Gelo: Gotin bavê te kuştin, got “**gelo** siwar bû an peya?”

Ev riya kin, ev bertîla giran, **gelo** piştî min kê ye bixwe?

Ka, kanê, kanî: Yekî li mirêkê nêrî û got: Ev pêşiya min e, **ka** paşiya min?

Dêr çêkirin **ka** poplîska wê?

Ez dibejim hanê tu dibejî **kanê**?

Bavo min tevîrek dît! Bav jê pirsî: **Kanê?** *Got:* Min wenda kir!

Got: **Kanî** gilîvan? *Got:* Bi qurbana te û wî zimanî, te ev kurmanciya delal ji kû anî?

Kengê, kengî: Bela nabêje “ez **kengê** têm.”

Bila avis be, **kengê** dizê bila bizê.

Mirov zanîba dê **kengî** bimire, wê ji xwe re gorek jî hazir bikira.

Kengî bibarî hingê zivistan e!

Kuder: Ji kew pirsîn, **kuder** xweş e? *Got:* Cihê ez lê bûme çêlik.

Kuder xwar e, ew der war e.

Kî, kê: Ez çiya û tu çiya **kî** ji golik re bîne giya?

Ez mêr tu mêr **kî** ji me şêr?

Çavê te **kê** derxist? -Mirovê min derxist.- Loma kûr derxist!

Dinyayê **kê** dot **kê** kirî u **kê** firot?

Ku, kû: Hiş nebe dê hebûn ji **ku** be?

Ji axa re dibêjin “pîroz be,” ji xizanan re dibêjin “te ji **ku** anî?”

Got: Kanî gilîvan? *Got:* Bi qurbana te û wî zimanî, te ev Kurmanciya delal ji **kû** anî?

Gotin: Kelkele meskenê te li **kû** ye? *Got:* Li ba dizan e.

Ku re, kur: Bi **ku re** zer bû bi **ku re** der bû?

Jinebî li **kur** e, ser li wir e.

Ku da, ku de: Derew sêwî ye tu bi **ku da** lêxî bi wê re dihere.

Dar dikeve gulî bi **ku de** diçin.

Gur bi **ku de** diçe gurîtiya xwe bi xwe re dibe.

Ku derê, li kû, li ku: Ji hiştirê re dibêjin piştta te xwar e, *ew dibêje:* **Ku derê** min rast e?

Kes wek dest nizane ku li **kû derê** mîrov dixwire.

Tir **li kû** û das **li kû**?

Yekî digote yekî: Were mala me! *Yê din digot:* Ma ez şûr û mertalê xwe **li kû** dayînim?

Kelkelo cîhe te **li ku** ye? *Got:* “Ba dizane.”

Av zanê binav **li ku** ye.

Ma: Erê me deve nedîtiye, **ma** pişkulên wan jî nedîtiye?

Gotin: Kero were em te bibin buhiştê. *Got:* **Ma** gevzonek li wir heye?

Qey: Ma **qey** tû filehî?

Qey beq dixesandin?

1.2.1.5. **Hokerên Rewşê / Çawaniyê**

Hêmana ku ji bo diyar bibe ka di kîjan şertan de pêk hatiye çalakiya ku di lêkerê de hatiye ragihandin ji wê re **Hokerên rewşê, çawaniyê** tê gotin. Ev hoker piranî rengdêr in. Lê belê dema tên ber lêkeran dibin hoker. Di vê beşê de me cih da hokerên din. Ev cure hoker berfireh e. Lê belê mirov dikare ev hokerên mayî wek hokerên serbixwe jî bi kar bîne. Di hokerên rewşê de wateya **neyîniyê, teqezî, erêkirinê, xwestekê, guman û pêşbîniyê, sedemîn, dubarekirinê, bisînorkirinê, şanîdanê û kêmezêdeyîyê** heye. Ev hoker zimannasên kurdî di pirtukên xwe de qala wan kirine.

Ji bilî van wateyan hinek wateyên dî jî hene: **Amûr** (bi piyan, bi şûjinê), **armanc** (ji bo, ji bona, ji bonî, ji boyî, bo, bona, ji bo ku, ji ber ku, ji ber ve), **beranberî** (beramber, beranber, beraber, bi hev re, bi hev dû re, bi hevûdin re, bi yedan, digelhev, hevra, ligelhev, pêkve, pev re, têkre, vêkre, bi hevalan re), **bibîrxistinê** (hêne, ka, kanê, kanî) **birêzkirin** (pêşiyê, serdawayê), **cextdar** (ripîreş, ripîrast, şipşîn), **dabeşan** (yeko yeko, teko teko, hebo hebo, yekayek, yekeyek, yekoyek, yek bi yek, libo libo, kit bi kit, dudo dudo, sisê sisê...), **dijberî, domdarî** (her, her tim), **berdewamî, jimarî, mînakdayinê** (mînak, nimûne, mesele, embaz, manend), **merc** (eger, ger, heger, heke, hekî), **şaşbûyinê** (ecêba, eceba, gelo, êra...) hwd.

Minakên ji gotinên pêşyan:

Aşkere, eşkere: Ma bi dizî hat nêrî, wê **aşkere** jî nezê.

Mangên bi dizî tên ga, **eşkere** dizên.

Bizin bi dizî gon dixwe **bi eşkera** dize.

Baş: Werîs bi herçîn e, bar percîn e, **baş** bijdîne.

Baş be û ne belaş be.

Bi dor: **Bi dor** e ne bi zor e.

Şuxil bû **bi dor**, ocax bû kor.

Bi hev re: Du **bi hev re** rast bin yê sisêyan Xwedê ye.

Gur û mîh **bi hev re** naçêrin.

Bi lez: Kî pir **bi lez** ket, ew li paş ket.

Bûk anî **bi lez** da bi ga û pez, sivika malê dîsa ez.

Bilind: Çiqas **bilind** bifirî hewqas berjêr dikevî.

Çiya çiqas **bilind** be dîsa rojekê riya mirov pê dikeve.

Bi rastî: Biratî **bi rastî**.

Hevaltî **bi rastî**.

Bi xwe: Car ji cara kerê boz **bi xwe** were bara.

Çêkiro **bi xwe** kiro xerobkiro **bi xwe** kiro.

Bi zor, bi zorê: Dinya bi dor e ne **bi zor** e.

Gilî heye **bi zor** in.

Kar **bi zorê** nabe.

Mirov dikare bistîne lê nikare **bi zorê** bide.

Dîzika, bi dizî: **Dîzika** kewaniye bişikê, deng jê nayê.

Tu bidî zîtika nedî zîtika, tê bidî heqe **dîzika**.

Bizin **bi dizî** gon dixwe bi eşkera dize.

Ma **bi dizî** hat nêrî, wê aşkere jî nezê.

Fena: Kevirê aş çiqas giran be jî, aşvan **bi fena** xwe wî radike.

Hebîbê Nekar rakev **fena** her car, Xwedê yek e dergeh hezar.

Geh: Jina bi mîna meha adarê ye **geh** digirî û **geh** dikene.

Dinya siha darê ye **geh** li vir û **geh** li wir e.

Giran: Ewr heye **giran** e, ewr heye sivik e.

Heta barê qantirê **giran** be nizane bavê wî ker e.

Herçî, herçi: Ziko, ziko zikakî, **herçî** nikarî peydakî, tu namûsê jênakî!

Herçî bi bira be mîna xaniyê bi çira be.

Herçi jar e, li havînê jî sar e.

Hela: Xatê wisa dibêje, **hela** ka Fatê çî dibêje.

Dê li qîzê şîret kir, qîzê got dayê **hela** tu çîkê kerê binêre çend e.

Hêdî: Ez **hedî** diçim, bela digihe min, ez zû diçim, ez digihîm belayê.

Hedf diçim dibêjin gêj e, zû diçim dibêjin bij e.

Hêsan: Wêrankirin **hêsan** e, avakirin giran e.

Hişk: Av li ser masî, masî **hişk** bû ji tîhna.

Dara ku neyê avdan **hişk** dibe.

Yekcar: Garis gul bî tevîk baran jî lê hat **yekcar** bî şil û mil.

Ji dil: Lîstika zarokan **ji dil** e.

Vire vir e, ne **ji dil** e.

Jixwe: Çav xên **jixwe** her tiştî dibîne.

Heçî dizane **jixwe** dizane heçî nizane baqê nîskan e.

Kurt: Werîs **kurt** be nagêhe te.

Emrê mêran **kurt** e.

Lez, bi lez, bi lez û bez: Kî pir **bi lez** ket, ew li paş ket.

Bûk anî **bi lez** da bi ga û pez, sivika malê dîsa ez.

Mîn bûkek anî **bi lez û bez**, me lêda rez û pez, lê sivika malê her mame ez.

Mîna: Gotina ne ji dil **mîna** meşka bê kil.

Karê bi wext, **mîna** xatûna li ser text.

Nizm: Bilind nefire tu **nizm** bikevî.

Nola: Tehm dikişîne goştê kerê, dibêje: Guhên wî **nola** yên kewroşkê ne.

Pêt: Kera xwe **pêt** girêde, cîranê xwe diz dermexe.

Qelew: Ker bi karwan **qelew** nabe.

Mirîşk çen **qelew** dibît, pêtir “q...n” lê teng dibît.

Qenc: Mar ku **qenc** bûya dê lingen wî ne di zikê wî de buya.

Birîna şûr qenc dibe şûna gotinan **qenc** nabe.

Qestî, bi qestî: Dê bi rastî digirîn wekî din **bi qestî** digirîn.

Rast: Destê dizan **rast** naçe paşilê.

Mar xwar bi rê ve diçe lê **rast** diçe qulê.

Rehet: Şûna xenceran **rehet** dibe lê şûna xeberan **rehet** nabe.

Yê dilê mirov **rehet** dike dew e, canê mirov **rehet** dike xew e, mala mirov xerab dike derew e.

Rû bi rû: Rû bi rû, guneh efû.

Tûj: Kêr heta **tûj** dibe, gelek çakûçan dixwe.

Pîvaz **tûj** e çi sor, çi spî.

Vala: Şer bi tifînga **vala** nabe.

Xwedê qirika qul **vala** nahêle.

Wek, wekî, weke: Xwendin **wek** bîra ku tu bi derziyê bikolî.

Belaş e **wek** laş e.

Berhev dikim bi çocikan **wekî** bidim kûçikan.

Derdê bêkesan giran e **wekî** dirana bi jan e.

Xwedê yekî **weke** te li te derxe.

Guh li şîretê teva bike, paşê **weke** xwe bike.

Xwe bi xwe: Apo mezinî, bi xwe pesinî. Ha jî tê gotin: Tosino, **xwe bi xwe** dipesino.

(filan kesan) Bûne gurê Musa, **xwe bi xwe** bi canî hev ketine.

Xweş: Bihar **xweş** tê serê keçelan disotê.

Bûka malê **xweş** xebitî ker girêda û ceşş filitî.

Zû: Çavê tirsîyayî **zû** xwelî dikeve.

Dar çiqasî stûr dibe, hewqas jî **zû** dişike.

1.2.1.5.1. Hokerên Neyîniyê

Ev cureya hokeran wateya neyîniyê li lêkerê dike. Em ji peyvên neyîniyê dizanin ku bandora nerêniyê li ser lêkerê heye.

Mînakên ji gotinên pêşyan:

Çu, tu, ti: Cixara li ba bayê û raketina li ser kayê ne **tu** tişt in.

Dewleta ku ba di bin de here ne **tu** dewlet e.

Yê ku ji jina xwe bitirse, ne **ti** mêr e.

Bî lezî, nagihîjî **ti** mirazî.

Hew: Mirî **hew** zanin zindî helaw dixwin.

Serê ku ji cîhê xwe derkeve **hew** diçe cîhê xwe.

Hîç: Bayê sibehê li mirovan nexa yê êvarê **hîç** e.

Na: Cihû te bibim buhiştê! *Got:* **Na**, îro şemî ye bi kêr nayê.

Di dinê de her tişt bi dest dikeve lê dê û bav **na**!

Ne... ne, çi... çi: Dil dil e **ne** ard e û **ne** bulxur e.

Em **ne** ji malekê **ne** ji halekê ne.

Apê Faris **çi** li mal **çi** li ber garis.

Av ku herikî **çi** gazek **çi** sed gaz.

Qet, qe: Dinyayeke boş û betal e ji kesî re **qet** nebû mal e.

Tava sibehan pere nake, tava êvaran **qet** pere nake.

Tu bû Erebî tir kirî, çû û li paş xwe **qe** nenirî.

Virekê (derew) dike **qe** xuyê tê tune.

Tu caran, tucar, tu carî: Kolan **tu caran** nakevin ser banan.

Mirovê eqilsivik **tu caran** lê meke rik.

Donê genî nabe rûn, qereçî **tucar** nabe xatûn.

Gulek **tucar** nake buhar.

Neyar **tu carî** nabe yar.

Destê diziyê **tu carî** nasitre.

1.2.1.5.2. Hokerên Teqezî, Erêkirinê û Xwestekê

Ev hoker wateya teqezî, erêkirinê û xwestekê li lêkerê dike. Pêkhatina yan ji pêknehatina karekî ji aliyê teqezî, erêkirinê û xwestekê ve dîyar dike. Celadet Elî BEDÎRXAN ev hoker “Hokerên Erêkirinê û xwestekê”³⁹ binavkiriye. Samî TAN jî wek “Hoker Hokerên Teqezî û Erêkirinê”⁴⁰ binavkiriye. Ji ber vê yekê jî me jî ev cuda cuda nenivîsand. Wek cureyekî lê belê sê wate jî tê de hene.

Mînakên ji gotinên pêşyan:

Belê: Ew hewş e **belê** ne ew rewş e.

Kar şêr e, **belê** gava mirov dest pê dike, dibe rovî.

Bêguman: Mala bê mêvan, gundê bêşivan, ew herdu jî **bêguman**.

Bivê nevē: Ji **bivê-nevē** mirov goştê kewan jî dixwe.

Erê: Ku Xwedê bêje “**erê**” êdî kes nikare pêş lê bigire.

Erê me deve nedîtiye, ma pişkulên wan jî nedîtiye?

Helbet: Zemanek diçe, zemanek tê **helbet** Kurmanc li hespê siwar dibe.

Jixwe: Yê ku dizane **jixwe** dizane yê ku nizane, di bêje qey ji bo baqê nîskan e.

Jî: Yek toto be, yek boto be dê halê me **jî** ev be.

Yê baştir Behdîn e, ew **jî** hîz e û derewîn e.

³⁹ Bedirxan-Lescot, *Kürtçe Gramer*, 266.

⁴⁰ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 189.

Naxwe, nexwe: Gotin: Filankeso jina te zehf digere! *Got:* Çira **nexwe** ez rojekê di mala xwe de nabînim.

Tev: Xwedê yar be bila dinya **tev** neyar be.

Agir bi çiyê dikeve, ter û hişk **tev** dişewitin.

Xwezî: Jina ser mezin a pî biçûk **xwezî** li wê malê bibe bûk.

Mîr gote diya xwe: **Xwezî** tiştê me neba li dinê.

1.2.1.5.3. Hokerên Guman û Pêşbîniyê

Ev cureya hokeran pêkhatina an jî pêknehatina karê lêkerê de teqezî tune ye. Ev hoker wateya guman û pêşbîniyê dide li ser lêkerê. Bi tenê Samî TAN di pirtûka xwe de cih dide vê cure hokerê.⁴¹ Celadet Elî BEDÎRXAN jî di behsa hokerên pirsîyariyê de wek “**Hokerên pirsîyarî û pêşbîniyê**”⁴² bi kar aniye.

Mînakên ji gotinên pêşyan:

Belkî: Bavêje pişt **belkî** jê derkeve tişt.

Belkî bi serpiştê ji mala xwe derdikeve.

Dibe ku: Tu **dibê ku** tu di paş stûnê ra kirine!

Heye ku: Cîh **heye ku** bêdengî ji axavtinê çêtir e.

Hurmet **heye ku** ji mêraniyê zêdetir e.

Qey: Qiloçên keran çenabin dibêjin **qey** em tim ceş in.

⁴¹ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 189.

⁴² Bedirxan-Lescot, *Kürtçe Gramer*, 268.

“G.” li ser dil dikele, ew dibêje **qey** helaw e.

1.2.1.5.4. Hokerên Sedemîn

Ev cureya hokerê pêkhatina an jî pêknehatina karê lêkerê ji aliyê sedemê ve nîşan dide. Wateya sedemê dide lêker. Tenê Samî TAN di pitûka xwe de qala vê cureyê kiriye.⁴³

Mînakên ji gotinên pêşyan:

Da : Li ber xwe binêre **da** stûyê te neşike.

Tenûreke germ ji xwe re bihêle **da** ku tu nan pê bipêjî.

Ji... : Av li ser masî, masî hişk bû **ji** tîhna.

Ava goleke homoş heram nabe **ji** devê toleke.

Ji ber... : Çiya bilind û cîhe rûmetê ye **ji ber** vê yekê berf lê dibare.

Berxê çê **ji ber** kozê ve kîfş e.

Ji ber ku: Feqîr ji lewma jar e, **ji ber ku** axîna wî av û dar e.

Ji gur pirsîn: Çima stuyê te qute (yan: qalinge)? Got: **Ji ber ku** ez bi destê xwe dikim, û bi devê xwe dixum.

Ji bo ku: Kevir navêje kûçikê xwe **ji bo ku** xelk jî navêje.

Sibatê gazî kir adarê, wa xuşka minî Adar, bide min çend roj xedarê, **ji bo ku** ez Gîsko ji zinêr (yan: tehtê) bînim xwar.

⁴³ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 189.

Lewra: Her kes bi dilê xwe şay e, **lewra** dinya ava ye.

Loma, lewma, lema: Kê çavê te derxist? - Mirovê min. - **Loma** weha kûr derxist.

Xwedê bi fêla marî dizane **loma** dest û pê kirine zik.

Feqîr ji **lewma** jar e, ji ber ku axîna wî av û dar e.

Serê sing du çiq e ji **lewma** li axê naçit!

Lema tal, ecûrê tal lê dikeve.

1.2.1.5.5. **Hokerên Dubarekirinê**

Tiştta ku tê de diyar dibe ku karê ku di lêkerê de hatî raporkirin di navberê de an pir caran tê dubare kirin jê re **Hokera dubarekirinê** tê gotin. Tenê Samî TAN di pitûka xwe de qala vê cureyê kiriye.⁴⁴

Mînakên ji gotinên pêşyan:

Dîsa, dîsan : Bi dînan bişêwire lê **dîsa** jî wek xwe bike.

Bilbilê kirine qefesa zêrîn **dîsa** gotiye ax welatê min.

Dûvê rovî jêkî jî **dîsan** rovî ye.

Qebihet bibe taca zêrîn, **dîsan** kes nade serê xwe.

Eynî jin weynî jin **dîsan** jin.

Ji nû ve: Mirî dimire **ji nû ve** şêrîn dibe.

Pîra sibatê dê **ji nû ve** biçê liqatê.

⁴⁴ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 190.

1.2.1.5.6. Hokerên Bisînorkirinê

Ev cureya hokeran wateya sînordariyê dide lêkerê. Tenê Samî TAN di pitûka xwe de qala vê cureyê kiriye.⁴⁵

Mînakên ji gotinên pêşiyên:

Êdî: Roja ku çû ava **êdî** bi paş ve venagere.

Serê ku hat berdan **edî** bi heft werîsan nayê girêdan.

Nema: Kêr gihist hestî ya, **nema** gutir dibe.

Şîret li gur dikirin, gur digot: Zû ez **nema** digihime dawiya kerî.

Tenê, tinê: Banê xanî **tenê** bi keviran bilind nabe.

Gilî **tenê** gotinê ji bo bihîstinê.

Hemî kul diçin, kulê Bersêl Begê bi **tinê** naçin!

Gûzek **bi tenê** nake xir-xir.

Sê kesên bêhiş hene li dinê: Yê bi rê de diçe **bi tene**, yê erzanî dikişine titûnê, yê ku dike bi gotina jinê.

1.2.1.5.7. Hokerên Şanîdanê

“Hokerên şanîdanê ew cure hoker in ku karê ku tê kirin, awayê pêkanîna wî karî ji hêla nêzîkbûn û dûrbûn, diyarbûn û nediyarbûnê ve nîşan didin.”⁴⁶

“Hokerên şanîdanê li gor nîşandanîyê dibin du beş:

⁴⁵ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 190.

⁴⁶ Ocek, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, 175.

a) Hokerên şanîdanê yên ku karên **diyar** û **nêzîk** nîşan didin peyvên mîna “**wiha**”, “**halo**”, “**hanî**”... ne.

b) Hokerên şanîdanê yên ku karên **nediyar** û **dûr** nîşan didin peyvên mîna “**wisa**”, “**wilo**”, “**welê**”, “**werê**”... ne.”⁴⁷

“**Va**” karên nêz, “**Wa**” jî ji bona yên dûr tê bikaranîn. Nezîr OCEK, Samî TAN, Bahoz BARAN û Abdûrrahman BAKIR di pirtûkê xwe de qala vê cureya hokerê dikin.

Mînakên ji gotinên pêşiyên:

Eve: Nalbenda kihêl nal dikirin, kêvjalê got: **Eve** lingê min jî.

Yekî li neynikê nêrî, got: **Eve** pêşiya min, ma ka paşiya min?.

Welê, wilo, weha, wisa, wer, holê: Ba çawa tê, benderê **welê** bide bayê.

Çawa dirîsit **welê** ba bide.

Çilo kor li Xwedê dinêre **wilo** Xwedê jî lê dinêre.

Heger didwê xerab pev ketan **wilo** li ser wan dihat gotin, ango xweska hevdû bikuştan.

Ba çawa tê, benderê **weha** bide bayê.

Bav çawa ye kur **wisa** ye.

Xate **wisa** dibêje, hela ka Fatê çi dibêje.

Heta ew kûçik li devê deriyê we be dê “g..”ê zaroka we **wer** be.

Ez çotkê dixrînim da lezetek **holê** bibînim!

⁴⁷ Ocek, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, 175.

Va: Ez dibejim hirç **va** ye tu dibêjî rêç **va** ye.

Hirç hat **va** ye rez, diz hat **va** me ez.

Wa: Sibatê gazî kir adarê, **wa** xuşka minî Adar, bide min çend roj xedarê, ji bo ku ez Gîsko ji zinêr (yan: tehtê) bînim xwar.

Dinya **wa** hatiye, we **wa** jî here.

Wisana: Ber balûsan, çav li ramûsan, derê werê dîsa **wisana**.

1.2.1.5.8. Hokerên Kêm-Zêdetiyê

Ev cure tenê Samî TAN qala wê kiriye. Wiha gotiye: “Ev cure hoker rêje û hejmareke tam diyar nakin.”⁴⁸ **Mînak:** Bihezir, devdev, devedev, devdevî, devadevî, devedevî, hema, hema bêje, hema hema, hemen hemen, nêzî, nêzike, teqrîben, teqrîbî, kêm zêde, kêmûzêde, pirhindik, pir û hindik, zaf hindik..

Minak: “Mijar **pir-hindik** zelal bû.”⁴⁹

“Karê min **hema bêje** nivê şevê qedîya.”⁵⁰

Herî kêm bist kes hebûn.

Kêm zêde me fam kir.

⁴⁸ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 189.

⁴⁹ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 189.

⁵⁰ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, 189.

BEŞA DUYEM

HOKER Û CUREYÊN HOKERÊ DI ÎNGÎLÎZÎ DE

(ADVERB AND TYPES OF ADVERB IN ENGLISH)

2.1. PÊNASEYA HOKERÊ (THE DEFINITION OF ADVERB)

Terma hokerê di îngîlîzî de wek “**adverb**” tê bikaranîn. Hoker wek kurdî divê rengdêran, lêkeran an jî hokeran dîyar bike. L.O.Fossum hokerê wiha dîyar dike. “Hoker peyvek e ku lêker, rengdêr, an hokereke din diwesfîne.”⁵¹ Mark Lester jî di pirtûka xwe da wiha dibêje: “**Adverb** bi kevneşopî lêker, rengdêr û hokerên din dîyar dikin ku wekî hêmanên rêzimanî (peyv, firaze, an jî hevokî) tê pênase kirin.”⁵² Ji ber ku ew hokeran wek peyv, firaze û hevokî dabeş dike pir girîng e. Di vê tezê de jî bi piranî evê were bikaranîn.

“Sê awayên cuda yên hokeran hene: hokerên yek-bêjeyî (single-word adverbs), hokerên firaze (adverbs phrases), û hokerên hevokî (adverbs clauses).

	Subject Noun Phrase (Firazeya Biker-Navdêr)	Verb (Lêker)	Complement (Birêser)	Adverb (Hoker)
Word-level adverb: (Hokerê asta bejeyî)	John	met	Mary	recently. (di demên dawiyê de)
Adverb prepositional phrase: (Hokerê firazeyê daçek)	John	met	Mary	on the weekend. (di dawiya hefteyê de)
Adverb infinitive phrase: (Hokerê firazeyê raderî)	John	met	Mary	to borrow her computer. (ji bo kompîtira wê deyn bigire)
Adverb clause: (Hokerê hevokî)	John	met	Mary	<i>when he was on campus.</i> ⁵³ (dema ku ew li qampûsê bû)

⁵¹ L. O. Fossum, *A Practical Kurdish Grammar* (Minneapolis: Augsburg Publishing House, 1919), 197.

⁵² Mark Lester, *McGraw-Hill's Essential ESL Grammar: A Handbook for Intermediate and Advanced ESL Students* (Chicago: Mc Graw Hill, 2008), 249.

⁵³ Lester, *McGraw-Hill's Essential ESL Grammar: A Handbook for Intermediate and Advanced ESL Students*, 250.

2.1. HOKER JI ALIYÊ WATEYÊ VE (ADVERB BY MEANING)

2.1.1. Cureyên Hokerê (Types of Adverb)

Di pirtûkên kurdî de hoker cuda cuda hatine dabeşkirin. Rêbazên dabeşkirina wan jî ji hev cuda ne. Di îngilîzî de jî hoker (adverb) ji aliyê zimannasan ve curbecur hatiye dabeşkirin. Ji bo vê jî em ê qala hokerên herî girîng bikin. Di beşa yekem de me behsa hoker û cureyên hokeran kiribû. Di vê beşê de em ê ji bilî pênaseyan hokeran, zêdetir mînakên bidin.

Di vê tezê de cureyên hokerên Îngilîzî wiha hatiye dabeş kirin.

1. Adverbs of Time (Hokerên Demê)
2. Adverbs of Location (Hokerên Cih û Alîyê)
3. Adverbs of Degree/Intensifiers (Hokerên Mêjer/Çendanîyê)
4. Interrogative Adverbs (Hokerên Pirsyarîyê)
5. Adverbs of Manner (Hokerên Rewşê/Çawaniyê)
6. Adverbs of Frequency (Hokerên Frekansê/Pircarî)
7. Sentence Adverbs (Hokerên Hevokê)
8. Focusing Adverbs (Hokerên Fokusê)
9. Comparative and Superlative Adverbs (Hokerên Berawirdî û Herî Raserî)
10. Adverbs of Reason (Hokerên Sedemîn)
11. Connecting/Linking Adverbs (Hokerên Gihanekê)

2.2.1.1 Hokerên Demê (Adverbs of Time)

Hokerên demê, dema ku tiştek diqewime ji me re vedibêjin. “Hokerên demê dibin sê beş: 1. Point in time (yên di demê de nîşan dide), 2. Frequency (pircarî), û 3.

Duration (berdewamî).”⁵⁴

1. Point in time (Yên demê nîşan dide): Ev cure dema ku tê qal kirin tam û bê kêmasî tê gotin.

When are they coming to home? (Ew ê kengî werin malê?)

Word/Expression	Prepositional Phrase	Clause
(Bêje/derbirîn)	(Firaza daçek)	(Hevokî)
Thursday (Pênçşem)	On the fifth of June (Di pêncê hezîranê de)	When I fell in love her (Gava ku dilê min ketiyê)
Tomorrow (Sibê)	On New Year (Di Sersalê de)	After they come from course (Piştî ku ew ji qursê bên)
Only this month (Tenê vê mehê)	In March (Di Adarê de)	While we are playing in the garden (Dema ku em li baxçe dilîstin)

Mînak: I'll finish my project **on thursday**. (Ez ê projeya xwe **roja pênçşemê** biqedînim.)

His family will return to USA **tomorrow**. (Malbata wî dê **sibê** vegere DYA.)

We met each other **on New Year**. (Me **di Sersalê de** hevûdu dît.)

Flowers smell great **in March**. (**Di Adarê de** bêhnek xweş ji kulîlka tê.)

I forgot the everything **when I fell in love her**. (**Gava ku dilê min ketiyê** min her tişt ji bîr kir.)

⁵⁴ Lester, *McGraw-Hill's Essential ESL Grammar: A Handbook for Intermediate and Advanced ESL Students*, 253.

They should tidy their room **after they come from course**.

(**Piştî ku ew ji qursê werin** divê ew mezela xwe bidin hev.)

2. Frequency (Pircarî): Ev cure di Hokerên Freqansê de hatiye nivîsîn. Ji bona vê yekê jî di vir de kurtasî hatiye qal kirin.

How often does she go opera? (Ew çend caran diçe operayê?)

Word/Expression	Prepositional Phrase	Clause
(Bêje/derbirîn)	(Firaza daçek)	(Hevokî)
Sundays	On the weekdays	Whenever I run across her
(Yekşeman)	(Di rojên hefteyê de)	(Kengî ku ez rastî wê hatim)
Often	Throughout May	Every time she listens to music
(Pir caran)	(Seranserê gulanê)	(Her dema ku li muzîkê guhdarî dike)
Every now and then	Twice a year	When I have enough money
(Carinan)	(Salê du caran)	(Gava ku perê min têra min kir)

Mînak: She watches a film **on sundays**. (Ew **yekşeman** li filmekê temaşê dike.)

John **often** gives gifts to his wife. (John **pir caran** diyariyan dide jina xwe.)

I go to my school **on the weekdays**. (Ez **rojên di nav hefteyê de** diçim dibistana xwe.)

My grandpa go to hospital for a check-up **twice a year**. (Bapîrê min **salê du caran** ji bo venêrînê diçe nexweşxaneyê.)

I get excited **whenever I run across her.** (Gava ku rastî wê têt ez dilşad dibim.)

3. **Duration (berdewamî):** Ev cure qala pêvajoyekî an jî hengamekî dike.

How long was he waiting her? (Ew heta kengî li benda wê mabû?)

Word/Expression	Prepositional Phrase	Clause
(Bêje/derbirîn)	(Firaza daçek)	(Hevokî)
Whole day Friday (Hemî rojê inê)	During the day (Li dema rojê de)	While she is studying for homework. (Dema ku wê spartek çêdikir)
A year (Salek)	For a long time (Di demeke dirêj de)	Till you go to your home (Heya ku hûn biçin mala xwe)
Many years (Gelek salan)	Until next wednesday (Heya çarşema bê)	As long as you are need. (Heya ku hewcetiya te pê bê)

Mînak: We worked with my brother **whole day Friday.** (Em **hemû rojên înan** bi birayê xwe re xebitîn.)

Philip had to live in Germany in **many years.** (Philip diviyabû ku di **gelek salan** de li Almanyayê bijî.)

Sanders is living here **for a long time.** (Sanders **di demeke dirêj** ve li vir dijî.)

I will wait girlfriend in England **until next wednesday.** (Ez ê **heya çarşema bê** Îngilistanê li benda hevala xwe bimînim.)

Her father came in **while she is studying for homework.** (Dema wê spartek **çêdikir**, bavê wê hat hundir.)

I will support you with money **as long as you are need**. (**Heya ku hewcetîya pê hebe**, ez ê bi pere piştgiriyê bidim te.)

Mînakên Hokerên Demê yê din: Afterwards (paşê), again (dîsa), already (êdî, jî), before (berî), early (zû), late (dereng), now (niha), soon (di nêzda), still (hîn), then (paşê), today (îro), tomorrow (sibê), tonight (îşev) yesterday (duh), yet (hîn), hwd.

I get up **early** at the weekends. (Ez dawiya hefteyan de **zû** radibim.)

Have you seen Roza **today**? (We **îro** Roza dît?)

She went to Istanbul **yesterday**. (Ew **duh** çû Stenbolê.)

They will be here **soon**. (Ew ê **dê di demeke nêz de** li vir bin.)

We watch a movie **tonight**. (Em ê **îşev** li filmekê temaşe bikin.)

2.2.1.2. Hokerên Cih û Alî (Adverbs of Location)

Hokerên cih û alîyan ji me re dibêjin ka li ku tiştek diqewime an li ku derê tiştek heye. “Di Hokerên cih û alî de du wateyên cuda hene: Wateyek **position (cih)** e. Ya din jî **direction (alî)** e, yanî ber bi cihekî ve ye”⁵⁵

1. **Position (cih):** Ev cure wateya lokasyonê an jî cihê tiştekî nîşan dide.

Where are they now? (Ew niha li ku ne?)

Word/Expression	Prepositional Phrase	Clause
(Bêje/derbirîn)	(Firaza daçek)	(Hevokî)
Forward	In the room	Where Emily eats pizza

⁵⁵ Lester, *McGraw-Hill's Essential ESL Grammar: A Handbook for Intermediate and Advanced ESL Students*, 254.

(li ber)	(Li mezelê)	(Dera ku Emily pizza dixwe)
Around city	In village	Everywhere he has seen until now
(Li dora bajêr)	(Li gund)	(Li her derê ku wî heya niha dîtiye)
Below	At the classroom	Anywhere you want
(Jêr)	(Li polê)	(Li her derê ku hûn dixwazin)

Mînak: I walk **around city** every monday. (Ez her duşemê **li dora bajêr** digirim.)

Sally sees **below**. (Sally **li jêr** dinêre.)

Sam was playing **in the room** when she came home. (Gava ku ew hat malê, Sam **li odeyê** dilîst.)

There is no teacher **at the classroom**. (**Li polê** tu mamoste tunene.)

My parents are at **where Emily eat pizza**. (Dê û bavên min **li wê dera ku Emily pizzayê dixwe** nin.)

I can come with you **anywhere you want**. (**Hûn li her ku derê bixwazin** ez dikarim ber bi wî alîyê ve bêm.)

2. Direction (Alî): Ev cure wateya aliyê destnîşan dike.

Where are you going to? (Hûn ê biçin ku derê?)

Word/Expression	Prepositional Phrase	Clause
(Bêje/derbirîn)	(Firaza daçek)	(Hevokî)
North	To the center	Anywhere I'll find peace
(Bakur)	(Ber bi navendê ve)	(Li derê ku ez ê aramîyê bibînim)
Behind car	Onto the street	Where I prepare my video

(Li pişt erebeyê) (Li ser cadeyê) (Li dereke ku ez vîdyoya xwe amade bikim)

Out Into the forest Wherever I can draw a portrait

(Derve) (Di nav daristanê de) (Li derêke ku ez dikarim portreyek xêz bikim)

Mînak: The child is hiding **behind car**. (Zarok xwe **li pişt erebê** vedişêre.)

We all go **out** tonight. (Em îşev derdikevin **derve**.)

They try to go **to the centre**. (Ew hewl didin biçin **navendê**.)

The girl lost **into the forest**. (Keçik **di nav daristanê de** winda bû.)

It is my paradise **anywhere I'll find peace**. (**Li her devera ku ez ê aramîyê bibînim** ew der bihuşta min e.)

He is searching **where he can draw a portrait**. (Ew **li dereke ku dikare portreyekê xêz bike** digere.)

Mînakên Hokerên Cih û Alî yên din: Above (ser), abroad (ji derve), ahead (pêşve), away (serve), back (paş), behind (paş), down (jêr), everywhere (herder), far (dûr), forward (pêşde), here (li vir), high (bilind), inside (hundur), low (nizm), near (nêz), on (li ser), outside (li derve), up (bi jorve), upstairs (jorve), there (li wir), hwd.

You should go **upstairs**. (Divê hûn biçin **jorve**.)

When we got **there**, the tickets had sold out. (Gava ku em gihîştin **wir**, bilêt hatibûn firotin.)

We live **here** each other. (Em **li vir** bi hevûdu re dijîn.)

She is **far away** from them. (Ew ji wan **dûr** e.)

Please come **inside** immediately. (Ji kerema xwe zûka werin **hundur**.)

2.2.1.3. Hokerên Mêjer/Çendanî (Adverbs of Degree/Intensifiers)

Hokerên Mêjer/Çendanî (Adverbs of Degree/Intensifiers) dereceyên xislet, taybetmendî, şert, merc û têkiliyan îfade dikin. Ev hoker dikarin lêker, rengdêr an jî hokeran asta wan destnîşan bikin. Peywira van hokeran kêmkirin an zêdekirina nirxa lêkerê, rengdêr an hokera ku ew diyar dikin e.

Mînak: A bit (piçekê), enough (bes, têr), fairly (nêzîkî), hardly (bi zehmetî), just (tam, tenê), little (hinek), much (pir, gelek), pretty (zehf), quite (pir), rather (bêtir), too (pir), very (pir), hwd.

He decided to wait her **a bit**. (Wî biryar da ku **hinekî** li benda wê bimîne.)

It's **rather** cold, isn't it? (**Bêtir** sar e, ne wusa?)

I find archeology **quite** interesting. (Ez arkeolojîyê **pir** balkêş dibînim.)

He was driving **very** fast. (Wî **pir** bilez diajot.)

It is **too** late for go out tonight. (Îşev ji bo derketina derve **pir** dereng e.)

a) “**Awfully, terribly, badly**” di wateya “**(very) pir, (very much) gelek**” tên bikaranîn.”⁵⁶ Ji xwe di Îndilîzî de ji va hokeran zêde nînin. Tenê sê-çar heb tenê hene.

The price of this car is **awfully** expensive. (Ev erebe **gelekî** bihagiran e.)

The patient suffered **terribly** from cancer. (Nexweş bi êşek **mezin** ji pençeşêrê kişand.)

His illness is **terribly** serious. (Nexweşiya wî **pir** giran e.)

The driver is not **terribly** careful. (Ajokar **pir** ne baldar e.)

The poor man needs money **badly**. (Mirovê belengaz **pir** hewceyê pere ye.)

This vase is not **badly** needed. (Ev vazo ne **pir** lazim e.)

⁵⁶ Nesibe Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out* (İstanbul: ELS Yayıncılık, 2007), 372.

b) “**Too, enough, very, very much, much too**” ev peyv tèn pêşiya hokeran û wan dîyar dîkin.”⁵⁷

It is a **too** rainy day. (Rojeke **pir** bibaran/şilî e.)

Chinese are speaking English **too** fluently.(Çînî bi îngîlîzî **pir** herikbar diaxivin.)

Her friend seems well **enough**. (Hevala wê **têra xwe/pir** baş xuya dike.)

Students don't sleep early **enough**. (Xwendekar **têra xwe/pir** zû ranazin.)

Time is slipping by **very** slowly. (Dem **pir** hêdî diherike.)

Your father behaved you **very** badly. (Bavê te miameleyek **pir** xirab li te kir.)

I missed you **very much**. (Min **pir** bêriya te kir.)

Thank you **very much** for correct answer. (Ji bo bersiva rast **gelek** spas.)

This car is **much too** cheap. (Ev erebe **pir zêde** erzan e.)

That teddy bear is **much too** dangerous for baby. (Ew hirçê pelîşk ji bo pitikê **pir** xeternak e.)

“**Too**” nikare tenê lêkerê dîyar bike. Lêbelê, heke ew di teşeyê de “**too much**” were bikaranîn, em dikarin lêkerê bi nav bikin.”⁵⁸

You can drink water **too much**. (Hûn dikarin avê **pir** vexwin.)

He spends **too much** money. (Ew pereyî **gelek** xerc dike.)

Don't make **too much** noise. (**Pir zêde** deng nekin.)

I have **too much** time for exam. (Ji bo azmûnê wextê min **pir** heye.)

⁵⁷ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 373.

⁵⁸ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 373.

“**Enough**” dikare rengdêrê, hoker, lêker û navdêrekê diyar bike. “**Enough**” tê pêşiya navdêrê û tê pişt rengdêr û hokeran tê.”⁵⁹

(adj. + enough):

Our dog is loyal **enough**. (Kûçikê me **têra xwe** dilsoz e.)

He is not honest **enough**. (Ew **têra xwe** ne rastgo e.)

(adv. + enough):

I talk fluently **enough**. (Ez **têra xwe herikbar** diaxivim.)

You should drive fast **enough**. (Divê hûn **têra xwe zû** biajon.)

She write slowly **enough**. (Ew **têra xwe hêdî hêdî** dinivîse.)

(enough + N (navdêr)):

We have **enough** time. (Wextê me **têra** me heye.)

There is not **enough** detail in this book. (Di vê pirtûkê de **têra xwe** hûrgulî tunene.)

(V (lêker)+enough):

The teacher have emphasized on this **enough**. (Mamoste **têra xwe** li ser vê sekinî.)

I couldn't change **enough** for you. (Ez nikarim **têra te** biguherînim.)

“**Very**” dikare rengdêrekî an jî hokerekî diyar bike. “**Very**” di dema pênasikirina lêkerekê de “**very much**” tê bikaranîn.”⁶⁰

(very + adj.)

Rodî was **very** sick yesterday. (Rodî duh **pir** nexweş bû.)

My Kurdish language teacher is **very** respectful. (Mamosteyê min ê zimanê kurdî **pir** rêzdar e.)

(very + adv.)

⁵⁹ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 373.

⁶⁰ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 373.

Please, Speak **very** slowly. (Ji kerema xwe, **pir** hêdî bipeyivin.)

She dislikes rafting **very much**. (Ew ji raftîngê **pir** hez nake.)

“**“Much”** bi piranî di hevokan û pirsên neyînî de tê bikaranîn. Bikaranîna wê di hevokên erênî de pir kêr e.”⁶¹

We have not **much** options. (Vebijarkên me **zêde** nînin.)

To healthy life, don't sleep **much**. (Ji bo jiyaneke tendurist, **pir zêde** ranezê.)

He **much** admire her blonde hair. (Ew **pir** heyrana porê wê yê bêrîk e.)

I **much** hope to be an interesting journey. (Ez **pir** hêvî dikim ku bibe rêwîtiyek balkêş.)

c) “**“Almost, nearly, practically, virtually”** wateya van hokeran **“hema hema”** an jî **“nêzî”** ye. Di îngilîzî de ev hoker têne li ber lêkeran û wan destnîşan dikin.”⁶² Di kurdî de navê van hokeran **“Hokerên Kêr-Zêdetiyê”** ye.

Almost new, I didn't used it very much.

(**Hema bêje** nû ye, min ew pir zêde bi kar neanî.)

I go to gym **nearly** every day.

(Ez **hema hema** her roj diçim werzîşgehê.)

The thief **practically** killed the man at home.

(Diz **hema mabû** zilamê malê bikuşt.)

The lazy students know nothing **virtually** about English.

⁶¹ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 373.

⁶² Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 374.

(Xwendekarên bêxîret di derheqê îngîlîzî de **hema bêje** tiştêk nizanin.)

d) “**Rather**” wateya wê “**bêtir, pir zêde**” ye. “**Rather**” bi pirani tê pêşiya hokerên ku wateyên wan neyînî ne. **Mînak:** Late (dereng), sadly (bi xemgînî), foolishly (bêaqilî), hwd.”⁶³

Barcelona has **rather** passionate fans.

(Piştewanê Barcelona yê **pir** coşdar hene.)

He is **rather** serious at work.

(Ew di kar de **bêtir** micid ye.)

She is a **rather** sadly girl.

(Ew keçikeke **pir** bixemgîn e.)

“**Fairly**” bi piranî bi hokerên ku taybetiyek erênî vedibêjin tê bikaranîn.”⁶⁴
Wateya wê jî “**bêtir, hema hema**” ye.

My uncle has a **fairly** good house. (Apê min xaniyeke **bêtir** baş heye.)

The president spoke **fairly** simple. (Serok **bêtir** asayî peyivî.)

I expressed my ideas **fairly** clear. (Min ramanên xwe **bêtir** zelal îfade kirine.)

“**Quite**” du wateyê wê hene. Yek wek “**fairly**” ye. Piranî bi hokerên ku taybetiyek erênî vedibêjin tê bikaranîn.”⁶⁵

My friend is **quite** cleverly. (Hevalê min **pir** jîr e.)

⁶³ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 375.

⁶⁴ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 375.

⁶⁵ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 375.

Corona is **quite** common nowadays. (Corona di van rojan de **pir** berbelav e.)

Buses depart **quite** regularly. (Otobus **pir** birêkûpêk diçin.)

Surprisingly, the twins are **quite** different (Ecêb e, cêwî **pir** cuda ne.)

“**Quite**” wateya wê ya din jî “**completely (tam, bi tamamî)**” ye. Heke lêkerên “**Agree (bipejirînin), think (bifikirin), understand (fam kirin)**” were bikaranîn wateya quite, bi tamamî ye.”⁶⁶

He hasn't **quite** cleaned the kitchen. (Wî mutbex **bi tamamî** paqij nekiriye.)

I don't **quite** know who he is. (Ez **tam** nizanim ew kî ye.)

They don't **quite** understand this illness. (Ew vê nexweşiyê **tam** fam nakin.)

“**Quite**” û “**Rather**” ji bona lêkeran dîyar bikin bi lêkerên “**like (hez kirin), enjoy (kêf kirin), dislike (hezekirin), object (li ber rabûn)**” tê bikaranîn. Wateya wan jî “**pir, bêtir**” e.”⁶⁷

I **rather** object to her ideas. (Ez **bêtir** li dijî ramanên wê derdikevim.)

I **quite** liked the film. (Min filmê **zêde** eciband.)

Joe **quite** enjoyed himself at the village. (Joe li gund **pir** kêfa xwe kir.)

The girls **rather** likes doing homework. (Keç **bêtir** ji spartekan hez dikin.)

2.2.1.4. Hokerên Pirsyarîyê (Interrogative Adverbs)

Hokerên Pirsyarîyê (Interrogative Adverbs) wateya lêkeran ji aliyê pirsê ve dîyar dike. Di îngîlîzî de ev cure di serê hokeran de Wh- destpê dike, ji bo vê yekê jê re **Wh- question (Pirsên Wh-)** jî tê gotin.

⁶⁶ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 375.

⁶⁷ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 375.

Tablo 5 Hokerên Pirsyarîyê (Interrogative Adverbs)

What (Çi)	Asking about thing (Li ser tiştekî pirsîn)
What time (Çi demî)	Asking about exact time (Li ser dema bi tamamî pirsîn)
When (Kengî)	Asking for the time (Li demê pirsîn)
Where (Kûder)	Asking about place (Li cîh pirsîn)
Who (Kî, kê)	Asking about person/subject (Li ser kes/bikerê pirsîn)
Whom (Kê)	Asking about person/object (Li ser kes/bireserê pirsîn)
Whose (Ya/yê/yên kê)	Asking about possession (Li xwedîtî pirsîn)
Which (Kîj, kîjan)	Asking about an option or choice (Li ser vebijarkek an bijarekî pirsîn)
Why (Çima)	Asking for a reason (Sedemek pirsîn)
How (Çawa)	Asking about procedure or method (Li ser prosedûr an rêbazê pirsîn)
How often (Çend caran)	Asking about frequency (Li ser frekansê/pircarî pirsîn)
How many/much (Çiqas)	Asking about quantity (Li ser hejmar pirsîn)
How far (Çiqas dûr)	Asking about distance (Dûrbûnî pirsîn)
How long (Heya kengî)	Asking about period of time (Li ser demekê pirsîn)

Mînak: What do you cook? (Hûn **çi** dipijirîn?)

What time is it? (Saet **çend** e?)

When did you come to home? (Tu **kengî** hatî malê?)

Where are you going? (Tu bi **ku de** diçî?)

Who did homework? (**Kî** spartek çêkir?)

Whom does he play football? (Ew ê fûtbolê dilîze **kî** ye?)

Whose pens are on the table? (Pênûsên **kê** li ser masê ne?)

Which book is the best one? (**Kîjan** pirtûk ya herî baş e?)

Why didn't you drink milk? (Te **çima** şîr venexwar?)

How are you going to theatre? (Hûn ê **çawa** biçin şanoyê?)

How often do you watch news? (Hûn **çend caran** li nûçeyan temaşe dikin?)

How many flowers are there? (Li wir **çend** kulîlk hene?)

How much money do you have? (**Çiqas** perê we heye?)

How far is her school to your home? (Ji dibistana wê heya mala we **çiqas** dûr e?)

How long will you stay in Siirt? (Hûn ê **heya kengî** li Sêrtê bimînin?)

2.2.1.5. **Hokerên Rewşê/Çawaniyê (Adverbs of Manner)**

Hêmana ku ji bo diyar dibe ka di kîjan şertan de pêk hatiye çalakiya ku di lêkerê de hatiye ragihandin ji wî re **Hokerên Rewşê/Çawaniyê (Adverbs of Manner)** tê gotin. Ev hoker piranî rengdêr in. Lê belê dema tên ber lêkeran dibin hoker. Di îngîlîzî de gireya “-ly” tê li pişt rengdêran û wan dike hoker. di îngîlîzî de Hokerên Rewşê bi piranî wiha çêdibin.

Mînak: Bravely (bi mêrxasî), carefully (bi baldarî), correctly (bi rastî), eagerly (bi dilxweşî), easily (bi hêsanî), fast (zû), frankly (eşkere), gently (bi nermî), loudly (bi dengê bilind), patiently (bi sebir), quickly (bilez), quietly (bêdeng), slowly (hêdî), well (baş), hwd.

He ate **quickly**. (Wî **zû** xwar.)

She speaks Russian **fluently**. (Ew **bi herikbarî** Rûsî diaxive.)

He drives the car **carefully**. (Ew **bi baldarî** erebê diajo.)

She sings **successfully**. (Ew **bi serfirazî** stranan dibêje.)

She acted **deliberately**. (Wê **bi zanebûn** tevgeriya.)

He listened **politely**. (Wî **bi nermî** guhdarî kir)

Em bi gelemperî ji bo wateya hokerên rewşê hinek pêşdaçek wek “in, on, with, by” û peyvên “manner, way, person, care” bi kar tînin.

Preposition + an adjective noun (Pêşgir + rengdêr navdêr)

Mînak: “They inspected the car **in an officious manner/officiously**.”⁶⁸ (Wan erebe **bi awayekî fermî** kontrol kirin.)

They want to move house **in a hurry/hurriedly**. (Ew dixwazin **bi lez û bez** mala xwe bar bikin.)

They must have bought that extra mouse **by accident/accidentally**. (Divê wana ew mişkê zêde **bi tesadufî** kiribe)

The cargo box was prepared **with great care/very carefully**. (Sindoqa qargoyê **bi baldariyek mezin** hatiye amadekirin)

Her heart filled **with sorrow/sorrowfully**. (Dilê wê **bi xeman** tijî bûye.)

They were doing it **on purpose/deliberately**. (Wan ew **bi zanayî** dikirin)

2.2.1.6. Hokerên Frekansê/Pircariyê (Adverbs of Frequency)

Di îngîlîzî de Hokerên Frekansê/Pircariyê (Adverbs of Frequency) karê di hevokê de ka çiqas hatiye kirin behsa wê dike. Karê lêkerê ka çend caran hatiye kirin qala wê dike. Di îngîlîzî de 9 hokerên frekansê hene. Lê belê di kurdî de em dikarin bêjin 6 heb hene.

⁶⁸ John Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar* (Hong Kong: Oxford University Press, 1994), 266.

Tablo 6 Hokerên Frekansê/Pircariyê (Adverbs of Frequency)

% 100	Always	Hertim, her dem, her gav
% 90	Usually	Bi piranî, bi gelemperî
% 80	Generally, normally	Bi gelemperî, bi giştî
% 70	Often, frequently	Zaf caran, pir caran
% 50	Sometimes	Carnan, carinan
% 30	Occasionally	Car caran, carinan
% 15	Seldom	Kêm caran
% 5	Rarely, hardly ever	Kêm caran
% 0	Never	Tu carî, qet

Mînak: I always get up early.

(Ez **her tim/her dem/her gav** zû radibim.)

He **usually** brush his teeth.

(Ew **bi piranî** diranên xwe firçe dike.)

She **generally/normally** cooks soup.

(Ew **bi gelemperî/bi giştî** şorbe çêdike.)

They **often/ frequently** have breakfast.

(Ew **zaf caran/pir caran** taştê dixwin.)

I **sometimes** go out with my friends.

(Ez **carna/carinan** bi hevalên xwe re derdikevim derve.)

I **occasionally** play golf.

(Ez **car caran/carinan** golfê dilîzim.)

He **seldom** go to hospital.

(Ew **kêm caran** diçe nexweşxaneyê.)

You **rarely/hardly ever** listen to radio.

(Hûn **kêm caran** guhdarîya radyoyê dikin.)

We **never** watch horror movie.

(Em **tu carî/qet** li filmên xofê temaşe nakin.)

2.2.1.7. **Hokerên Hevokê (Sentence Adverbs)**

Ev cure hoker guvaşê li ser hevokê tevahî dike. Di îngîlîzî de bi piranî ev cure tê bikaranin. “Ev hoker hevokê tevde diyar dikin û şîrove û ramana axaftvanan tînin ziman. Piraniya hokerên ku hevokê diyar dikin, dereceya ihtimalê îfade dikin. Bi gelemperî ji yên tene bikaranîn ev in:”⁶⁹

Mînak: “Actually (bi rastî)	obviously (bi eşkere)
certainly (bêguman, bêşik)	of course (helbet)
clearly (bi eşkere)	perhaps (belkî, dibe ku)
definitely (teqez)	presumably (bi texmîni)
doubtlessly (bêguman)	possibly (belkî)
evidently (eşkere)	probably (qey)

⁶⁹ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 382.

in fact (bi rastî)	really (bi rastî)
in deed (bi rastî)	surely (bêguman)
maybe (belkî, dibe ku)	undoubtedly (bêguman, bêşik) ⁷⁰

Mînak: He is **actually** responsible for this big fire. (Ew **bi rastî** berpirsiyarê vî agirê mezin e.)

They may **probably** be at home. (Ew **dibe ku** li malê bin.)

We **definitely** understood what they would get divorce. (Me **teqez** fam kir ku ew ê hevûdu berdin.)

In fact, he was aware of everything. (**Bi rastî**, haya wî ji her tiştî hebû.)

Presumably, Göbeklitepe was built 12,000 years ago. (**Bi texmînî**, Göbeklitepe 12,000 sal berê hatiye avakirin.)

They must **surely** have trusted you very much. (**Bêguman** divê wan pir ji we pir bawer kiribin.)

Evidently, we anticipated him to come graduation ceremony. (**Bi eşkere**, me pêşbîniya wî kir ku were merasîma mezûnbûnê.)

“Hokerên din ên ku dikarin hevokek tevahî rave bikin û diyar bikin:

Admittedly (bi naskirinî)	personally (bi kesane)
annoyingly (acizbûyî)	rightly (bi rastî)
fortunately (pir baş e ku)	seriously (ji dil, bi cidî)
frankly (bi eşkere)	surprisingly (ecêbmayî)
honestly (rastbêjkî)	understandably (bitêgehiştinî)
luckily (bi bext)	unfortunately (mixabîn)
naturally (bi xwezayî)	unluckily (bêbextî)

⁷⁰ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 382.

chiefly (bi taybetî)	only (tenê)
especially (bi taybetî)	particularly (bi taybetî)
either (yan jî)	primarily (di serî de)
even (jî, hetta)	purely (tenê)
exactly (bi tamamî)	simply (bi kurtî)
exclusively (bi taybetî)	solely (tenê)
just (tenê)	too (herwiha, jî)
mainly (bi awayi sereke) ⁷³	

Mînak: That law was found plausible **chiefly** due to last remonstrations. (Ew zagon **bi taybetî** ji ber xwepêşandana paşîn maqûl hate dîtin.)

Taylor helps **especially** homeless people. (Taylor **bi taybetî** ji kesên bêmal re dibe alîkar.)

Exclusively, we noticed that his project isn't done alone. (**Bi taybetî** me dît ku projeya wî bi tenê nayê kirin.)

My brother and me grow up in many cities, **mainly** Istanbul and Ankara. (Ez û birayê xwe, **di serî de** Stenbol û Enqere, li gelek bajaran mezin bûn.)

Doctors try to find **primarily** Covid-19 vaccine. (Bijîşk hewl didin ku **di serî de** derzîya Kovid-19 bibînin.)

a) “**Merely (bi tenê), purely (bi tenê) û simply (tenê)** hema hema her gav têne pêşiya peyva ku guvaş dîkin.”⁷⁴

⁷³ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 384.

⁷⁴ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 384.

To me, he **merely** acted in an unforgivable way yesterday. (Bi ya min, wî **bi tenê** duh bi awayekî nebexşîn tevgeriya.)

They are **purely** little boys. Never mind (Ew **bi tenê** kurên piçûk in. Guh nedê)

Don't panic, that is **simply** operation. (Netirsin, ew **bi tenê** niştergerî ye.)

b) “**Just (bi tenê), only (tenê) û even (hetta)** dikarin rast werin pêşiya peyva ku ew bal kişandî.”⁷⁵

I **just** states Hamlet is a masterpiece. (Ez **bi tenê** dibêjim Hamlet şaheserekê e.)

You should **only** press green button. (Divê hûn **bi tenê** pê li bişkoja kesk bikin.)

He said he had forgot **even** her (Wî got ku ew **jî ji** bîr kiribû.)

My mother **even** opened a twitter account. (Dêya min heta hesabeke twitterê **jî** vekir.)

c) “**Too (jî), also (jî), as well (jî), û either (jî)** bêjeyên ku wateya "jî" didin. **Either** her dem di dawiya hevokê de û di hevokê neyînî de tê bikaranîn.”⁷⁶

You, **too**, have right to become happy. (Mafê we **jî** heye ku hûn bextewar bibin.)

Children will **also** like these toys. (Dê zarok **jî ji** van lîstokan hez bikin.)

Every young makes his/her own way **as well**. (Her ciwan **jî** riya xwe çêdike.)

You should buy tickets **either** if you want come with me. (Ger hûn dixwazin bi min re werin divê hûn **jî** bilête bikin.)

⁷⁵ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 384.

⁷⁶ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 384.

d) “Wek hokera guvaşê “**exactly (bi tamamî)**” bi piranî peyvên pirsê Wh- dest pê dike tên bikaranîn.”⁷⁷

How **exactly** was the fire starting last week? (Hefteya borî şewat **bi tamamî** çawa dest pê kir?)

What **exactly** do you think about academic succession? (Hûn **bi tamamî** li ser serfiraziya akademîk çi difikirin?)

2.2.1.9. Hokerên Berawirdî û Herî Raserî (Comparative and Superlative Adverbs)

Ev cure hoker di îngîlîzî de di rengdêran de jî heye. Lê belê em ê qala hokeran bikin. Hokerên xerû dema ku “er an jî more” digire ev dibe Comparative adverbs. Dema ku “est an most” digire hingê jî dibe Superlative adverbs. “Di zimanê îngîlîzî de bi gelemperî sê teşeyên hokeran hene. Ya yekem, the based form (teşeya bingehîn), ya duyem comparative form (teşeya berawirdî). Ev teşe bi “-er” diqede. Ê ya sêyem superlative form (teşeya herî raserî). Ev teşe jî bi “-est” diqede.”⁷⁸

Mînak: Adverb (Hoker)	Comperative (Berawirdî)	Superlative (Herî raserî)
near (nêz)	nearer (nêztir)	nearest (herî nêzîk)
slow (hêdî)	slower (hêdîktir)	slowest (herî hêdîk)
soft (nerm)	softer (nermtir)	softest (herî nermik)
deep (kûr)	deeper (kûrtir)	deepest (herî kûr)
hard (hişk)	harder (hişkîr)	hardest (herî hişk)

⁷⁷ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 385.

⁷⁸ Gerald Nelson, *English An Essential Grammar* (London: Routletge, 2002), 55.

Mînak:Based form	Comparative form	Superlative form
(Teşeya bingehîn)	(Teşeya berawirdî)	(Teşeya herî raserî)
Hakan run fast .	Hakan run faster .	Hakan run fastest .
(Hakan zû dibeze)	(Hakan zûtir dibeze.)	(Hakan herî zû dibeze.)
Our home is near .	Our home is nearer .	Our home is nearest .
(Mala me nêz e.)	(Mala me nêztir e.)	(Mala me herî nêzîk e.)

Lê belê ku hoker peyveke du kîte û jor ve bê divê ji bo teşeya berawirdî “-more than” were. Ê ji bona teşeya herî raserî jî “-the most” divê were bikaranîn.

Mînak: Adverb (Hoker)	Comperative (Berawirdî)	Superlative (Herî raserî)
quickly (zû)	more quickly (zûtir)	most quickly (herî zû)
sweetly (şîrîn)	more sweetly (şîrîntir)	most sweetly (herî şîrîn)
softly (nerm)	more softly (nermtir)	most softly (herî nermik)
seriously (jidil)	more seriously (jidiltir)	most seriously (herî jidil)
quietly (bêdeng)	more quietly (bêtir bêdeng)	most quietly (herî bêdeng)

Mînak:Base form	Comparative form	Superlative form
(Teşeya bingehîn)	(Teşeya berawirdî)	(Teşeya herî raserî)
Girls speak quickly .	Girls speak more quickly.	Girls speak the most quickly.
(Keç zû dipeyivin.)	(Keç zûtir dipeyivin.)	(Keç herî zû dipeyivin.)
Zîn smiles sweetly .	Zîn smiles more sweetly.	Zîn smiles the most sweetly.
(Zîn bi nazikî dibişire)	(Zîn bêtir bi nazikî dibişire)	(Zîn herî bi nazikî dibişire)

He drives **carefully**. He drives **more** carefully. He drives **the most** carefully.

(Ew **bi baldarî** diajo.) (Ew **bêtir bi baldarî** diajo.) (Ew **herî bi baldarî** diajo.)

“Tablo 7 Irregular Comparative and Superlative Forms”⁷⁹

Adverb (Hoker)	Comperative (Berawirdî)	Superlative (Herî raserî)
well (baş)	better (baştir)	best (herî baş)
badly (xirab)	worse (xirabtir)	worst (herî xirab)
little (kêm)	less (kêmtir)	least (herî kêm)
much (pir)	more (pirtir)	most (herî pir)
far (dûr)	farter/further (dûrtir)	fartest/furthest (herî dûr)

Mînak: Base form

Comparative form

Superlative form

(Teşeya **bingehîn**)

(Teşeya **berawirdî**)

(Teşeya **herî raserî**)

I am **well** now.

I am **better than** last night.

I am **the best** all day.

(Ez niha **baş** im.)

(Ez ji şeva borî **baştir** im.)

(Ez li tevahiya rojê **herî baş** im.)

She eats a **little**.

She eats **less than** me.

She eats **least** at home.

(Ew **kêm** dixwe.)

(Ew ji min **kêmtir** dixwe.)

(Ew di mal de **herî kêm** dixwe.)

Ankara is **far**.

Ankara is **farter**.

Ankara is **fartest**.

(Enqere **dûr** e.)

(Enqere **dûrtir** e.)

(Enqere **herî dûr** e.)

⁷⁹ Philip Gucker, *Essential English Grammar* (New York: Dover Publications, 1966), 66.

2.2.1.10. Hokerên Sedemîn (Adverbs of Reason)

Ev cure hoker di îngîlîzî de pir tê bikaranîn. Wateya sedemîn li lêkerê dike. Lester ev cure wiha aniye zimên. “Hokerên sedemînê ji du wateyan pêk tên. Wateya ewil **sedem** e. Wateya din **armanc** e. Ji bo cûdahiya di navbera her du wateyan de bibînin, em ê hevokên li jêrîn bidin ber hev:”⁸⁰

Reason (Sedem): He was very happy **as** he passed the exam.

(**Ji ber ku** ew di ezmûnê de serket, pir kêfxweş bû.)

Purpose (Armanc): It is not difficult **to** reach real success.

(Zehmet nîne **ku** meriv bigihîje serfiraziya rast.)

1. Reason (Sedem):

Why do you do so? (Hûn çima wusa dikin?)

Word/Expression	Prepositional Phrase	Clause
(Bêje/derbirîn)	(Firazeya daçek)	(Hevokî)
(None commonly used)	For healthy life	As I feel uneasy
(Bi giştî nayê bikaranîn)	(Ji bo jiyaneke tendurist)	(Wekî ku ez xwe nerehet hîs bikim)
	From working	Because motivation is important
	(Ji xebitandinê)	(Ji ber ku motîvasyon girîng e)
	Out of the control	Since our company went bankrupt
	(Ji kontrolê derketin)	(Ji ber ku firma me îflas kir)

⁸⁰ Lester, *McGraw-Hill's Essential ESL Grammar: A Handbook for Intermediate and Advanced ESL Students*, 255.

Mînak: You must eat fruits **for healthy life.** (Divê hûn **ji bo jiyaneke tendurist** fêkiyan bixwin.)

The students in class are **out of the control.** (Xwendekarên di polê de **ji kontrolê derdikevin.**)

I took a medicine **as I feel uneasy.** (**Ji ber ku min xwe nerehet hês dikir** min dermanek xwar.)

I couldn't pay my installment **since our company went bankrupt.** (**Ji ber ku firma me îflas kir** min nikaribû teqêstê xwe bidim.)

2. Purpose (Armanç):

Why do you do so? (Hûn çima wusa dikin?)

Prepositional Phrase (Firaza daçek)	Infinitive Phrase (Firaza raderî)	Clause (Hevokî)
For you. (Ji bo te)	To win the match (Ji bo maçê qezenc bikin)	As we can drive a car (Ji bo ku em bikarin erebeyekê biajon)
	To read a book (Ji bo xwendina pirtûkekê)	Because Adam needs money (Ji ber ku pêdivîya bi pereyî heye)
	To cook the meat (Ji bo ku goşt bipije.)	So that he can see her (Da ku ew wê bibîne)

Mînak: These beautiful flowers are **for you.** (Ew kulîlkên bedew **ji bo te ne.**)

L. Messi did his best **to win the match.** (L. Messi **ji bo serketina maçê** çî ji destê wî hat kir)

She went to her room **to read a book**. (Ew çû mezela xwe **ku pirtûkekê bixwîne**.)

We enrolled on a course **as we can drive a car**. (Em ketin qursekê **ji ber ku em bikarin erebeyê biajon**.)

He has waited at school **so that he can see her**. (Ew li dibistanê sekiniye **da ku ew wê bibîne**.)

2.2.1.11. Hokerên Girêdanê (Connecting/Linking Adverbs)

Hokerên girêdanê di navbera du bend an jî hevokan de têkiliyekê nîşan didin. Ev cure hoker wek gihanek jî tê binavkirin. Di îngilîzî de gihanek pir in.

Mînak: Also (ji ber ku), consequently (loma, lewra), furthermore (hê jî), hence (ji ber vê yekê), however (lê, lê belê), moreover (hê jî), nevertheless (lê belê), otherwise (neku, wekî dî), then (paşê), therefore (ji ber vê yekê, loma), thus (ji ber vê yekê), hwd.

He does his homework **furthermore** he helps his mother everyday.

(Ew spartekên **ji** çêdike her roj alîkariya dayika xwe dike.)

New informations are coming about earthquake. **However**, they are not definite.

(Di derbarê erdhejê de agahdariyên nû tên. **Lêbelê**, Ew teqez nînin.)

Study a lot for final exams **then** you can get good points. (Ji bo azmûnên dawîn pir bixebitin **paşê** hûn dikarin encamên baş bistînin.)

And **thus** Albert Einstein was born in 1876, Germany. (Û **bi vî rengî** Albert Einstein di 1876, Almanya de hate dinê.)

BEŞA SÊYEM

BERAWIRDKIRINA HOKERAN DI KURDÎ Û ÎNGÎLÎZÎ DE

3.1. TAYBETIYÊN HOKERAN DI KURDÎ DE

Hoker carina tên ber lêkeran, lekernavan rengdêran û hokeran. Ew qaîdeyeke sereke ye. Di kurdî û îngîlîzî de ew qaîde heye. Carina jî bi daçekan jî hoker dikare bê çêkirin. Bi piranî di kurdî de bi daçekan hoker tên çêkirin.

- Hoker tên ber **lêkeran**:

Mînak: Baş bilîze.

Kêm pîva.

- Hoker tên ber **lekernavan**.

Mînak: Hevalê ku **gelek** dinivîse îro nehat.

Zaroka ku **zû** dimeşe li vir e.

- Hoker tên ber **rengdêran**:

Mînak: Alê şilî

Zêde xemgîn

- Hoker tên ber li **hokeran**:

Mînak: Pir **hêdî** dişewitî.

Herî **kêm** yazdeh kes bûn.

- Di kurdî de hoker bi piranî bi pêşdaçekan (bi, di, ji, li) û paşdaçekan (de, re, ve) pêk tên.

Mînak: Bi pêşdaçekan: (bi, di, ji, li): Bi şev, bi roj, ji binî, ji dil, li bin...

Mînak: Bi paşdaçekan: (de, re, ve) nîvî de, vir de, paş re, pêş re, ser ve, bin ve...

- Hoker carinan jî dikevin navbera pêşdaçekan û paşdaçekan. (bi...de, bi...re, bi...ve- di...de, di... re- ji...de, ji...re, ji...ve)

Mînak: bi ser de, bi hev re, bi pêş ve, di nêz de, di pey re, ji îro pê de, ji xêra xwedê re, ji niha ve...

3.1.1. Taybetiyên Peyvsazîya Hokeran di Kurdî de

Di zimanê kurdî de hoker bi gireya û daçeka tên çêkirin. Ji bo ve yekê jî hoker li gor gire û daçekan were dabeşkirin. Di vê tezê de ev rêbaz hat bikaranîn. Di kurdî de peyvsazîya hokeran dibin 4 babet. 1-Hokerên Xwerû 2-Hokerên Dariştî (Çêkirî) 3-Hokerên Hevgirtî 4-Hokerên Hevedudanî.

3.1.1.1. Hokerên Xwerû

Hokerên xwerû bi tenê ji bêjeyekê pêk tînin. Gireyên wek pêşgir û paşgir qet nagirin. Ev cure hoker yek wateyeke wan heye. Wexta ku ev hokerên xwerû bînin parçekirin wateke dî jê dernakeve.

Mînak: Alî, banî, baş, bes, bilind, çî, der, dirêj, hêsan, giran, ka, kêr, kurt, niha, qey, par, pêr, pir, ser, sibê, tev, vêca, zaf...

Ji **aliyê** dibistanê ve hat.

Yunus derheqê vê mijarê de **baş** difikire.

Niha pirtûkê dixwîne.

Mîna **pêr** ew film temaşa kir.

Karê bavê min **sibê** diqede.

Baran edî **kêm** dibare.

Zarokan **pir** danûk xwarin.

Qey ez yê jinbavê me.

3.1.1.2 Hokerên Dariştî (Çêkirî)

Hokerên dariştî gireyên çêkirinê digre, û ew bejeyên ku di eslê xwe de nav bin, wan dike hoker. Ev cure hoker bi daçek, pêşgir û paşgiran pêk tên. Wateyeke din dide navan.

a) Hokerên daçekan distênin: Bi dor, bi hev re, bi kû ve, bi lez, bi qasî, bi pêş ve, bi rastî, bi roj, bi şev, bi tamamî, bi xwe, cot bi cot, di pey re, di ser re, ji dil, ji ber çî, ji niha ve, ji ser, li ber, li bin, li jêr, sal bi sal...

Mînak: Em **bi dorê** li kerê siwar bûn.

Keçik **bi kû ve** diçe?

Dêya min **ji dil** digot.

Xwendekaran **bi şev** spartek çêdikirin.

Ez **bi xwe** tişteki naxwazim.

b) Hokerên pêşgiran digirin: “**Binaz**”⁸¹, “**îro**(evro), **îsal**(evsal), **îşev**(evşev)”⁸², “**îcar**”⁸³...

Mînak: Bûk pir **binaz** direqisî.

Birayê min **îro** çû navendê.

Îsal zivistan pir xweş bû.

Îşev bi hevalên xwe re çû li derve.

Îcar tu dibêjî ku neheqe?

c) Hokerên paşgiran distênin:

⁸¹ Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, 173.

⁸² Malmîsanij, *Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kırmanca(Zazaca) Dilbilgisi*, 166.

⁸³ Bakır, *Réziman û Peyvsaziya Kurmancî*, 131.

-ane: Bûkane, dilêrane, hovane, jinane, Kurdane, mêrane, şêrane, tirane...

-anî: “Bûkanî, mêranî, şîranî”⁸⁴...

-ar: Pêrar...

-arî: “Gemarî, kevnarî, zengarî”⁸⁵...

-asî: “Kêmasî, tengasî”⁸⁶...

-e: “Nêzike”⁸⁷...

-ik: “Hindik, kertik, qertik, piçik”⁸⁸, çênik...

-î: “Belaşî, lalikî, nazikî, qeraşî, pêşî, sûtî, şorikî, veşartî”⁸⁹, banî, êvarî, paşî, piştî, tenikî...

-ka: Dizîka, hêdîka, qestîka, zûzûka, xwezîka...

-kî: Balorkî, berêvarkî, berjorkî, berwarkî, bi derewkî, çargavkî, çarlepki, çarmêrkî, çepkî, devdevkî, êvarkî, gişkî, lezkî, mêvankî, nivîskî, nivrokî, paşkî, paşpêşkî, paşpaşkî, qeşmerkî, qilûskî, rexxî, serêvarkî, serserkî, şaşkî...

-ko: “Berwarko, dirêjko, dîwarko, paşpaşko”⁹⁰...

-okî: “Çarixokî, devokî, dilbîzokî, dînokî, şermokî”⁹¹...

-nî: “Kutanî”⁹²...

-tir: “Baştir, dirêjtir, pirtir, xweştir”⁹³, hêsantir, hişkî, sibetir...

-tî: “Axatî, bavtî, cîrantî, dîntî, hevaltî, kirivatî, paletî, serokatî”⁹⁴...

⁸⁴ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 183.

⁸⁵ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 183.

⁸⁶ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 183.

⁸⁷ Bedirxan-Lescot, *Kürtçe Gramer*, 259.

⁸⁸ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 184.

⁸⁹ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 184.

⁹⁰ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 184.

⁹¹ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 184.

⁹² Bedirxan-Lescot, *Kürtçe Gramer*, 259.

⁹³ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 184.

⁹⁴ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 184-185.

3.1.1.3. Hokerên Hevgirtî

Ev cure hoker di nav xwe de hoker dubare dibin û bi hev re tèn nivîsîn. Wateyake cuda derdikeve holê. Şêxmûs Aslan ji derheqê van hokeran de wiha gotiye: “Hin hoker dubare dibin an hokerek û bêjeyek bi hev ve bikelijin dibin hokerên hevgirtî.”⁹⁵

- a) Hokerên hevgirtî, dikarin gireyên çêkirinê jî bistînin. **Mînak:** “Berwarko, paşpaşko, pirpir, qetqetî, zûzûka”⁹⁶...

Mînak: Elî **paşpaşko** ji mezelê derket.

Rojda xwarin **pirpir** dixwar.

Rodî guldank **qetqetî** kir.

Hemû mamoste **zûzûka** hatin ba hev.

- b) “Du hoker dengê “e” digirin û dikelijin dibin hokerê hevgirtî. **Mînak:** Berepaş, berevacî, deverû, serejêr”⁹⁷

Mînak: Fanorê keçikê **berepaş** bû.

Şalê xwe **berevacî** li xwe kiribû.

Kurê Eysê li zaningehê **deverû** ketibû.

Erebe **serejêr** xweş diçe.

- c) Du nav an jî hoker tene ba hev û dibin hokerên hevgirtî. **Mînak:** “Berjêr, berqame, çargavî, derdor, dorhêl, hurhurî, pitirpêr, serjêr”⁹⁸

⁹⁵ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*, 185.

⁹⁶ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*, 185.

⁹⁷ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*, 185.

⁹⁸ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*, 185.

Mînak: Ew **berjêr** dimeşiya.

Ez **derdor** geriyan.

Hakan **dorhêl** pir eciband.

Dêya min kartol **hurhurî** kir.

Ew **serjêr** diçin dibistanê.

3.1.1.4. Hokerên Hevedudanî

Di van cure hokeran de jî herî kêma du hoker an jî nav tîna ba hev û hokerekî din çêdikin. Ev her du hoker dikarin werin cem hev û dikarin ji hev cuda jî bibin. Lê belê wek firazekî tîna bikaranîn.

a) “Qalibê hokerekê û bejeyekê ji alî (cî, hêl...) de bandorê li lêkera hevokê bike dibe hokera hevedudanî. **Mînak:** Zu dereng, her ro, du ro, ber êvarê, ser nîga, pêş çavan”⁹⁹

Mînak: **Zû dereng** em ê welatekî azad û demokratîk damezrînin.

Rezan **her ro du ro** diçe ber çem.

Serok **ber êvarê** agahî da gel.

Ez **ser nîga** diçim zaningehê.

Pêş çavan diçe malê.

b) Bi gihaneka “-û” yê: **Mînak:** “Çep û rast, der û dor, der û hundir, heta û heta”¹⁰⁰, birêkûpêk, pir û hindik, her û tim, her û her...

Mînak: Hevalê wî **çep û rast** dinivîsî.

⁹⁹ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*, 185.

¹⁰⁰ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*, 185.

Der û dor bi vê meseleyê re têkildar bû.

Pirtûkên xwe **birêkûpêk** rêz dikir.

Heta û heta ez ê li benda te bim.

Pir û hindik rengê herdu çûka jî wek hev bû.

Her û tim di mala wan de şer heye.

c) Hoker carinan jî bi dubarekirinê dibin hokerên hevedudaniyê. **Mînak:**

“pir pir, car caran, tim tim, hema hema, hêdî hêdî, wer wer, zêde zêde”¹⁰¹, “pol pol, deste deste, dido dido, sisê sisê, roj bi roj”¹⁰²

Mînak: Pir pir li qadan dilîze.

Şerîf **car caran** diçe Mêrdînê.

Em **tim tim** diçin gund.

Hema hema mabû bikeve erdê.

Divê hûn **hêdî hêdî** bimeşin.

Ez îro **zêde zêde** xemgîn bûm.

Em **dido dido** diçûn hundir.

Mirovatî **roj bi roj** xirab dibe.

d) Hokerên hevedudanî carinan bi ravekekê re tèn çêkirin. Carinan wek qalibekî jî ravek tê bikaranîn.

Mînak: Sala borî pir sar bû.

Berê êvarê ghişt mala xwe.

Nîvê şevê spartek qedand.

¹⁰¹ Aslan, *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmançî)*, 186.

¹⁰² Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmançî Lehçesi*, 124.

Wek gur xwe avêt xwarinê.

Mîna bilbilan stran digot.

Nîvê payîzê derbas bû.

Kêm zêde me kar xilas kir.

e) “**Her + navdêr**”¹⁰³: Di kurdî de bi “her” wateya wê “hemî, giş, tev” e.

Mînak: Herdem, hertim, hergav, hercar, hero, herçend...

Mînak: Ew **herdem** dilşad e.

Bavê wî **hertim** nexweş bû.

Hergav baş dipeyvî.

Wê **hercar** pirtûk dixwend.

Ez **hero** dişixulim.

Herçend ew zarok bû jî, pir jêhatî bû.

3.1.2. Taybetîyên Peyvsaziya Hokeran di Îngilîzî de (Features of Adverbs

Forms in English)

Taybetîyên peyvsaziya hokerên îngilîzî gelek in. Di beşa wan de li ser hokeran û rengdêran R. Quirk behsa taybetmendiyên hokeran dike û bi dabeşandina wan a morfolojîkî dest pê dike. R. Quirk “Dibêje ku di bingeh de sê cure hoker hene: **Xwerû** (now (niha), here (li vir), then (paşê)), **Hevedudanî** (somehow (bi rengekî), herein (ji ber vê yekê), therefore (ji ber vê yekê) û **Darijtî (çêkirî)**, gireyên -ly, -wise, -wards, -ways, -fashion û -style. (badly (xirab), clockwise (rêka saetê), backwards (paşve), sideways (li rex), gangster-style (şêwaza gangster) û schoolboy-fashion (şêwaza xwandekar).”¹⁰⁴

¹⁰³ Yıldırım, *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*, 174.

¹⁰⁴ R. Quirk vd., *A Grammar of Contemporary English* (london: Longman, 1972), 631-647.

Mirov dikare bibêje hoker di beriya her tiştî de lêkeran tamam dike û wateya wan dîyar dike. Ji ber ku têkiliya hokerê hertim bi lêker an jî pêveberê re heye. Ev têkilî xwe bi eşkere nîşan dide.

Mînak: We have to go quickly to catch him. (Ji bo ku em bigêjin wî lazim e em ecele biçin.)

She wears her clothes slowly. (Ew hêdî hêdî cilên xwe li xwe dike.)

My boss fired me yesterday. (Birêveberê min duh ez ji kar avêtim.)

Everybody knew him well. (Her kesî ew baş nas dikir.)

Meltem will come here today. (Îro Meltemê dê were li vir.)

Hokerek dikare rengdêrekî an jî hokereke weke xwe tamam bike û wateya wê dîyar bike. Ev qaîde ji bona wateya “pir” bide hevokê tê bikaranîn.

Mînak: Adverb (Hoker) + Adjective (Rengdêr):

an extremely tiring job (karekî pir westîner)

desperately sick (gelek nexweş)

very good behavior (tevgera pir baş)

Adverb (Hoker) + Adverb (Hoker):

unusually quickly (bi rewşek awarte zû)

terribly sweetly bayby (bebika pir şîrîn)

very fluently (pir herikbar)

Di îngîlîzî de hoker bi piranî gireya “-ly” tê dawiya rengdêran û rengdêr piştê dibe hoker. Bi giştî ev qaîde di Hokerên Rewşê/Çawaniyê (Adverbs of Manner) de têne bikaranîn.

Mînak: Bad-badly (xirab-bi xirabî)

quick- quickly (zû-bi ecele)

cold-coldly (sar-bi sar) serious-seriously (ji dil-bi ji dilî)

extreme-extremely (zêde- bi zêdeyî) shy-shyly (şermîn-şermokî)

full-fully (tam- bi temamî) true-trully (rast-bi rastî)

happy-happily (dilşad-bi dilşadî) wise-wisely (aqil-bi aqil)

heavy-heavily (giran-bi giranî) whole-wholly (tevahî-bi tevahî)

Di îngîlîzî de hokerên ku yên sê cure paşgiran distênin ev in: “**-ly, -wards û -wise**”. Di nav van gireyan de yên herî tîn bikaranîn “-ly û -wards” in. Di pirtûkên îngîlîzî de “-wise, -ways, -fashion, -style” kêma tê bikaranîn.

Adverb Suffixes (Paşgirên hokerê):

-ly: clearly (bi eşkere), cleverly (jîr), delicately (binaz), easily (bi hêsanî), superficially (di ser re), timidly (şermokî), urgently (zûzûka)...

-wards: afterwards (paşê,), backwards (paşde, paşve), forwards (pêşve, pêşde), homewards (ber bi malê), onwards (pêşve), upwards (ber bi jor), westwards (ber bi rojava)...

-wise: “anticlockwise (brevajî saetê), clockwise (rêka saetê), healthwise (ji alê tenduristî ve), relationshipwise (bi têkilî)...

Carinan jî hinek hoker hene ku gireya “ly” nastênin. Di dawiya hokerê de qet gire tune ye. Bi piranî di Hokerên Demê (Adverbs of Time), Hokerên Cih û Alî (Adverbs of Place) û Hokerên Mêjerê (Adverbs of Degree) de tîne bikaranîn.

Mînak: All (tev) tomorrow (sibê)

always (herdem) near (cem)

back (paş) now (niha)

front (ber)

outside (derve)

here (li vir)

perhaps (dibe ku)

soon (di nêzde)

yesterday (duh)

Mînak: I **always** clean my house. (Ez **herdem** mala xwe paqij dikim.)

He was **very** tired **yesterday**. (**Duh pir** westiyabû.)

▶ **Perhaps**, you might be really right. (**Belkî**, hûn bi rastî jî mafdar bin.)

Your mother will come here **soon**. (Dê dêya we **di nêzda** were vir.)

Dîlan will be **there tomorrow**. (Dîlan dê **sibê li wir** be.)

Di îngîlîzî de peyvên teşeya hoker û rengdêrê wan wekî hevdu jî hene. Ev cureyên hokeran tenê di hevokê de têne fêmkirin. Mîrov zane peyv ku navan dîyar dîkin rengdêr in. Ku lêkerê, rengdêrê an ji hokerekî dîyar bike ew jî hoker e.

Mînak: Early (zû), far (dûr), fast (bilez), hard (hişk), high (bilind), late (dereng), long (dirêj, zêde), low (nizm), hwd.

Adjective (Rengdêr)

Adverb (Hoker)

Mînak: “Louise caught the **fast** train.”¹⁰⁵

“The train was going quite **fast**.”¹⁰⁶

(Louise gihişt trêna **bilez**.)

(Trên pir **zû** diçû.)

I don't want to wait for a **long** time.

The teacher can't stay **long** there.

(Ez naxwazim demek **dirêj** li bendê bim.)

(Mamoste nikare li wir **zêde** bimîne.)

¹⁰⁵ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 262.

¹⁰⁶ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 262.

Dave got on an **early** plane.

Helen woke up **early** yesterday morning.

(Dave li balafirek **bilez** siwar bû.)

(Helen duh serê sibehê **zû** hişyar bû.)

Hinek rengdêrên ku bi “-ly” diqedin hene. Ev rengdêr in û ne hoker in. Ev rengdêrên ku di dawiya wan de “-ly” hene em nikarin cardin ji “-ly” pêve zêde bikin. Lê belê em dikarin wek frazeyê bi kar bînin. Bi peyvên “manner an jî way” bi kar bînin. An jî şûna hokerê hokerek dî bi kar bînin.

Mînak: Costly (biha)

lowly (nizm)

cowardly (tirsonek)

lonely (tenê)

deadly (mirarî)

lovely (delal)

elderly (pîr)

manly (mêranî)

early (zû)

silly (pûç)

friendly (hevaltî)

ugly (nexweşik)

likely (dibe ku)

timely (biwext)

lively (zindî)

Mînak: “We received a **friendly** greeting.”¹⁰⁷

(Me silaveke **hevaltiyê** qebûl kir.) (Rengdêr e.)

“They greeted us **in a friendly manner**.”¹⁰⁸

(Wan **bi rengek hevalane** pêşwazî me kirin.) (Hoker e.)

He is a **cowardly** person. (Ew kesek **tirsonek** e.) (Rengdêr e.)

He acted **in a cowardly way**. (Wî **bi rengek tirsonek** tevgeriya.) (Hoker e.)

“That isn’t very **likely**.”¹⁰⁹ (Ew pir ne **gengaz** e.) (Hoker e.)

¹⁰⁷ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 262.

¹⁰⁸ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 262.

¹⁰⁹ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 262.

“That **probably** won’t happen.”¹¹⁰ (Ew **dibe ku pêk neyê**) (Hoker e.)

“Hinek hoker wek “**hard**” û “**hardly**” jî hene wateya wan ji hev cuda ye. Dema ku peyvek gireya “-ly” distîne wateya peyvê diguhere.”¹¹¹

We should study **hard** for exam. (Divê em ji bo azmûnê **zêh** bixebitin.)

Sally has got **hardly** any sugar. (Şekirê Sally **hima bêje** nema.)

Swimming pool is very **deep**. (Hewza avjeniyê pir **kûr** e.)

They **deeply** regret about their mistakes. (Ew ji ber xeletiyên xwe **pir** poşman dibin.)

Buses were **free** for students yesterday. (Duh ji bo xwendekaran otobus **belaş** bûn.)

Everyone can travel around the world **freely**. (Her kes dikare li dora cîhanê **bi azadî** bigere.)

Yesterday, my mother has **nearly** fallen into the hole in the Street.

(Duh, dêya min **hema mabû** biketiya qula Kolanê.)

Jane achieved **high** grades nowadays. (Jane van rojan notên **bilind** bi dest xistin.)

My car is a **highly** expensive one. (Erebeya min erebeyek **pir** biha ye.)

His university is fairly **near**. (Zanîngeha wî pir **nêz** e.)

Suzan often come to lesson **late**. (Suzan gelek caran **dereng** tê dersê.)

My close friend isn’t happy **lately**. (Hevalê min yê baş **di van demên dawî de** ne kêfxweş e.)

¹¹⁰ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 262.

¹¹¹ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 263.

Which series do you like **the most**? (Hûn ji kîjan rêzefilmê **herî zêde** hez dikin?)

They are **mostly** lovely people. (Ew **bi pîranî** mirovên delal in.)

“Piştî lêkerê hîlbijartina hokerekî an jî rengdêra pêveberêkî, ka modifiyer kiriyara lêkerê an xwezaya bikerê dîyar dîke an na bi vê yekê ve girêdayî ye. (piştî lêkera girêdanê)”¹¹²:

Mînak: Derya is a **happy** girl. (Adj.- **happy** modifies Derya)

(Deryayê keçek **dilşa** e. (Rengdêr) - **dilşa** Derya diwesfine)

Derya is playing **happily**. (Adv. - **happily** modifies how she is playing)

(Derya **bi kêfxweşî** dilîze. (Hok.) - **bi kêfxweşî** diyar dîke ka ew çawa dilîze.)

You are **slow**. (Adj.) (Hûn **hêdî** ne. (Rengdêr.)

You eat **slowly**. (Adv.) (Hûn **hêdî hêdî** dixwin. (Hoker.)

Di îngîlîzî de hokerên bêrêz jî hene. “**Good**” rengdêr e. Lê belê “**well**” hoker e.

Jan Dost is a **good** author. (Jan Dost nivîskarekî **baş** e.)

He writes **well**. (Ew **baş** dinivîse.)

3.1.2.1. Position of Adverbs in a Sentence (Di Hevokê de Cihê Hokeran)

Di hevokê de cihê hokeran îngîlîzî de pir girîng e. Carina wateya hevokê jî bi cihê hokerê diguhere. Ji ber vê jî di îngîlîzî de ev mijar pir mijareke girîng e. J. Eastwood ji li ser vê mijarê wiha dibêje: “Cihê hokeran peyva ku dîyar dîke ve têkildar e. Ew dikare peyvek an firazeyek an hevokêk tev biwesfine. Cihê wê jî girêdayî ye ku ew çi cure hoker e û gelo ew peyvek tenê ye an firazekêk e.”¹¹³

¹¹² Gucker, *Essential English Grammar*, 66.

¹¹³ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 263.

Mînak: He was walking **fast**. (Ew **zû** dimeşiya.) (Peyv e.)

My friend has been waiting him **for a olong time**. (Hevalê min **demeke dirêj** li benda wî ma.) (Firaze ye.)

Really, we were all happy. (**Bi rastî**, em hemû keyfxweş bûn.) (Hemû hevokê diwesfine.)

Di îngîlîzî de cihê hokeran ji bingehe ve dibin 3 babet. “1. Front position adverbs, 2. Mid position adverbs û 3. Last position adverbs.”

3.1.2.1.1. Hokerên serî (Front position adverbs)

Hokerên serî (Front position) tên pêşiya hevokê. Bi piranî ev hoker tên serê hevokê. **Mînak:** “Interrogative Adverbs (Hokerên Pirsyariyê), although (herçen de ku), besides (ji bilî vê), generally (bi gelemperî), however (lê belê), kindly (bi qencî), otherwise (neku, wekî din), unfortunately (mixabin), usually (bi piranî), therefore (loma, lewra)”¹¹⁴...

Mînak: And **finally**, we had reached the hotel. (**Û di dawiyê de**, em gihîştibûn otêlê.)

Sometimes, you can't achieve. (**Carinan**, hûn nikarin bi ser bikevin)

“**Sure enough**, the police car stopped us.”¹¹⁵ (**Bi rastî**, polîsan em sekinandin.)

“**Just** hold on a moment.”¹¹⁶ (**Bes** hinekî bisekine)

“**In the end** our efforts will surely meet with success.”¹¹⁷ (**Di dawiyê de** dê hewldanên me bê guman bi serfiraziyê re bi encam bibe.)

¹¹⁴ Laurretta Chinyeaka, "AN OVERVIEW OF ADVERBS FOR THE PROFICIENT USE OF THE ENGLISH LANGUAGE", *Awka Journal of English Language and Literary Studies* 6/1 (2017), 108.

¹¹⁵ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 264.

¹¹⁶ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 264.

¹¹⁷ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 264.

3.1.2.1.2. Hokerên nivî (Mid position adverbs)

Hokerên nivî (Mid position) bi lêkerên alîkar (auxiliary verbs) re tên bikaranîn. Bi gelemperî Hokerên Frekansê (Frequency Adverbs) di vê beşê de ne. “Already (êdî, ji ber vê), always (herdem), ever (qet, tu car), frequently (gelek caran), just (bi tenê, tam), merely (bi tenê), never (qet, tu carî), often (pir caran), actually (bi rastî), yet (hê, hîn)”¹¹⁸...

Mînak: The answers of exam is **certainly** wrong. (Bersivên azmûnê **bê guman** xelet in.)

He is **often** at home. (Ew **gelek caran** li malê ye.)

The quiz is **usually** either easy or difficult. (Quiz **bi gelemperî** an hêsan e an jî dijwar e.)

Men **always** gets up late. (Mêr **hergav** dereng radibin.)

My uncle **never** eats meat. (Apê min **qet** goşt naxwe.)

She **usually** listen to rap music. (Ew **bi gelemperî** li muzîka rapê guhdarî dike.)

- Di hevokên neyinî de hokerên nivî dikeve navbera lêkerên alîkar (auxiliary verbs) û lekera bingehîn de.

Mînak: I don't **probably** know who he is. (Ez **dibe ku** nizanim ew kî ye.)

He doesn't **always** go to school at the weekends. (Ew **hergav** dawiya hefteyê naçe dibistanê.)

Ali won't **certainly** come to here. (Elî **bê guman** dê neyê vir.)

¹¹⁸ Chinyeaka, "AN OVERVIEW OF ADVERBS FOR THE PROFICIENT USE OF THE ENGLISH LANGUAGE", 108.

- “Dema ku forma “**Verb (Lêker) + preposition (daçek) + object**

(birêser)” de hoker dikare were du ciha.”¹¹⁹

- ✓ I **said** to you **yesterday**. (Min ji te re **duh** got.)
- ✓ I **said yesterday** to you. (Min **duh** ji te re got.)
- “Heke birêser ji yekê zêdetir bêjeyê pêk were, hoker berî daçek an berî

lêkeran tê bikaranîn.

- ✓ She listened **carefully** to the delegates from various countries. (Wê **bi baldarî** li delegeyên ji gelek welatan guhdarî kir.)
- ✓ She **carefully** listened to the delegates from various countries. (Wê **bi baldarî** guh da delegeyên ji gelek welatan)”¹²⁰

3.1.2.1.3. Hokerên dawî (End position adverbs)

Di îngîlîzî de bi piranî hoker tîn paşya hevokê. Em dikarin bibêjin bi taybetî jî yê frazeyên daçeka pêk tîn. **Mînak:** “Prepositional phrases (Firazeyên daçek), clauses (hevokî), badly (xirabî), carefully (bi baldarî), easily (bi hêsanî), recently (di demên dawiyê de, soon (di nêzde), there (li wir), well (baş), yesterday (duh)”¹²¹...

Mînak: My father didn’t smoke **for weeks**. (Bavê min **bi hefteyan** cixare nekişand.)

They asked me **reluctantly**. (Wan **bi bêdilî** ji min pirsîn.)

Esra talks **very quickly**. (Esra **pir bilez** diaxive.)

- Heke bireserek hebe, wê hingê hoker bi gelemperî li dû wê diçe. Lê belê

¹¹⁹ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 379.

¹²⁰ Sevgi Öndeş, *English Grammar Inside and Out*, 379.

¹²¹ T. C. Baruah, "The English Teaching Handbook", *New Delhi: Sterling Publishers Private Limited* 2006), 123.

hokerên kurt pêşiya bireserê tên.

Mînak: I will finish my homework **tonight**. (Ez ê **îşev** sparteka xwe biqedînim.)

We have planted **carefully** beautiful flowers and trees. (Me **bi baldarî** kulîlk û darên bedew çandin.)

- Di dawiya hevokê de carinan jî yekê zêdetir hoker dikarin bên ba hev.

Dema ku wisa hoker hatin ba hev, hokerên kurt tên pêşiya hokerên dirêj.

Mînak: “Sam waited **impatiently outside the post office.**”¹²² (Sam **bêsebr li benda postexaneyê** sekinî.)

“We sat **indoors most of the afternoon.**”¹²³ (Em **nîvro piraniya li hindir** rûniştin.)

“They inspected the car **thoroughly in a very officious manner.**”¹²⁴ (Wan erebe **bi awayekî pir zexm û bi tevahî** kontrol kirin.)

3.1.3. BERA WIRDKIRINA HOKERAN DI KURDÎ Û ÎNGÎLÎZÎ DE

Di serî de dikare bê gotin di herdu zimanan de jî hoker pir tên bikaranîn. Hoker di îngîlîzî de wekî “Adverb” tê binavkirin di kurdî de jî bi piranî “Hoker”, “Zerf” an “Hevalkar” tê bikaranîn. Hoker di kurdî û îngîlîzî de jî hêmaneke pir girîng e. Têkiliya hokeran bi daçekan, rengdêran, lêkeran, lêkernavan û hokerên weke xwe ve gelek heye. Li gor vê têkilîyê hoker ji aliyê wate û peyvsaziyê ve dibin du beş:

- a) Taybetiyên hokeran yên hevpar
- b) Taybetiyên hokeran yên cuda

¹²² Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 265.

¹²³ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 265.

¹²⁴ Eastwood, *Oxford Guide to English Grammar*, 265.

3.1.3.1. Taybetiyên hokeran yên hevpar:

1. Di kurdî û îngîlîzî de jî hoker, lêkeran ji aliyê pir wateyan ve diyar û xurt dike.

Minak: Mamoste dê **niha** bê. The teacher is coming **now**.

Helinê ev mijar **baş** fam kir. Helin understood this topic **well**.

Wê xwarin **bi hêsanî** çêkir. She made the food **easily**.

Mamoste **dereng** hat dibistanê. The teacher came to school **late**.

Ew futbolê **çawa** dilîze? **How** does he play football?

2. Di herdu zimanan de jî hoker, rengdêran ji aliyê pir wateyan ve diyar û xurt dike.

Minak: Mêreke **pir** bilind bû. He was a **very tall** man.

Şanoyek **gelek** xweş bû. It was a **very beautiful** play.

Hûn **zêde** xemgîn in. You are **very sad**.

Bi alê şilî ve neçe. Do not go to the **wet side**.

Derî **pir** giran bû. The door was **very heavy**.

3. Di herdu zimanan de jî hoker, hokeran ji aliyê pir wateyan ve diyar û xurt dike.

Minak: **Gelek** baş dilîze. He plays **very well**.

Pir bi zanayî dipeyvî. He speaks **very wisely**.

Xwarina îro **zêde** hêdî dixwar. He eats **more slowly** today's food.

Herî kêm bîst kes hatibûn. **At least** twenty people came.

Ev mal **bêtir** nêzik bû.

This house was **much** closer.

4. Hinek hoker hene ku tu gireyan nastînin. Ew cure hoker di kurdî de wekî

“Hokerên Xwerû” di îngîlîzî de wekî “Simple Adverbs” tên binavkirin. Di herdu zimanan de ji wek yek bêje tê bikaranîn.

Mînak: Hokerên Xwerû Simple Adverbs

sibê	tomorrow
cem	near
pir	very
baş	well
zêde	more

5. Hokerên Hevgirtî (Compound Adverbs): Ev cure hoker di herdu zimanan de jî heye. Du peyvên têne ba hev, bi hev re dikelijin û dibin hokerên hevgirtî (compound adverbs).

Mînak: Herçawa	anyhow
	sometimes (carinan)
	somehow (bi avakî)
nîveşev	midnight
nîvroj	midday

6. Hokerên Hevedudanî (Composite Adverbs): Ev cure hoker du an sê peyv têne ba hev û bi hev re dibin Hokerên hevedudanî (Composite adverb).

Mînak: Berê êvarê towards evening

pêş çavan front sight

çep û rast left and right

hema hema so so

roj bi roj day by day

her dem all the time

herî kêr at least

7. Cureyekî hokerê wekî “**Hokerê firazeyê daçek**” (**Adverb prepositional phrase**) di herdu zimana de ji heye. Lê bi piranî di zimanê îngilîzî de zêde tê bikaranîn.

Mînak: at the weekend **di** dawiyê heftêyê **de**

in the evening **di** serê sibêhê **de**

at close range **ji** nêz **ve**

at the bottom **di** bin **de**

on top of **li** ser

because of **ji** ber

on account of **ji** ber

in pursuit of **di** dûv **ra**

in front of **di** ber **de**

8. Cureyekî hokerê wekî “**Hokerê frazeyê raderî**” (**Adverb infinitive**)

phrase) di herdu zimana de jî heye. Bi gelemperî Hokerên sedemîn de tên bikaranîn.

Mînak: We tried **to win the football match.**

Me hewl **da ku di maça futbolê de bi serkevin.**

My uncle went England **to work at good job.**

Apê min çû Îngilîstanê **da ku di karekî baş de bixebite.**

He came here **to see his mother.**

Ew hat vir **da ku dayika xwe bibîne.**

She has been in Paris **to learn language.**

Ew **ji bo fêrbûna ziman** li Parîsê maye.

I will go New York **to come together with my friends.**

Ez ê biçim New York'ê **da ku bi hevalên xwe re werin ba hev.**

9. Cureyekî hokerê wekî **“Hokerê hevokî”**(**Adverb clause**) di herdu zimanan de ji heye. Ji bilî lêkera sereke di hokerê hevokî de jî lêker heye. Lê belê ev lêkera alîkar e.

Mînak: I don't know **when it will happen.**

Ez nizanîm **dê kengê biqewime.**

She becomes different person **when she is angry.**

Dema ku hêrs dibe, ew dibe kesek cuda.

We can go to picnic **whenever you want.**

Kengê hûn bixwazin, em dikarin biçin geştê.

After we get through the experience, we will go to the cinema.

Piştî em ji ezmûnê derbas bibim, em ê biçin sînemayê.

Gava ku perê min çêbû ez ê biçim Kanada' yê.

Once I have money, I will go to Canada.

10. Di îngîlîzî de carinan jî bi daçek (preposition) wek “in, on, with, by” ve hoker tên çêkirin. Di dawîya hokerê de jî peyvên wek “manner, way, person, care” tene bikaranîn. Bi wî şiklî Hokerên rewşê/çawaniyê tê çêkirin. Di kurdî de jî ew qaîde wek “bi, bi awayek...” tê çêkirin. Yanî em dikarin bêjin di herdu zimanan de jî bi pêşdaçeka hoker tê çêkirin.

Mînak: in a realistic manner	bi awayekî realîst
by accident	bi tesadufî
with great care	bi baldariyeke mezin
on purpose	bi zanayî
in a different way	bi awayekî cûda

11. Di herdu zimanan de jî cureyên hokeran yên wek hevdû jî hene yên cûda jî hene. Wek rêbazekî jixwe pênc heb cure di herdu zimanan de jî hevpar in. Her sêyên mayî jî me pêşkeş kir. Em ê bi taybetî qala wan bikin.

Tablo 8 Hokerên Wekhevdû di Herdu Zimanan de

Hokerên kurdî	Hokerên Îngilîzî
1. Hokerên Demê	1. Adverbs of Time
2. Hokerên Cih û Alî	2. Adverbs of Location
3. Hokerên Mêjerê/Çendanî	3. Adverbs of Degree/Intensifiers
4. Hokerên Pirsîyariyê	4. Interrogative Adverbs
5. Hokerên Rewşê/Çawaniyê	5. Adverbs of Manner
6. Hokerên Frekansê/Pircarî	6. Adverbs of Frequency
7. Hokerên Berawirdî û Herî Raserî	7. Comparative and Superlative Adverbs
8. Hokerên Sedemîn	8. Adverbs of Reason

12. Hokerên frekansê/pircarî yê di rêzimanê kurmancî de nayê qal kirin. Di îngilîzî de wek Frequency adverbs jixwe heye. Me jî di vê tezê de ji îngilîzî sê wergirt û Hokerên frekansê/pircarîyê amade kir. Mirov dikare bibîne ku hemanên hevpar di herdu zimanan de jî hene. Di îngilîzî de 9 heb hokerên frekansê (Adverb of frequency) hene. Lê belê di kurdî de yên ku me tesbît kirine şeş heb in. kurdî de me tabloyên van hokeran di herdu zimana de jî di teza xwe da pêşkeş kir.

Tablo 9 Berawirdkirina Hokerên Frekansê/Pircariyê

	îngîlîzî	kurdî
% 100	Always	Hertim, her dem, her gav
% 90	Usually	Bi piranî, bi gelemperî
% 80	Generally, normally	
% 70	Often, frequently	Zaf caran, pir caran
% 50	Sometimes	Carnan, carinan
% 30	Occasionally	
% 15	Seldom	Kêm caran
% 5	Rarely, hardly ever	
% 0	Never	Tu carî, qet

13. Hokerên Pirsariyê (Interrogative Adverbs) di herdu zimana de jî rêbaza van hokeran wekhevdu ye. Ji Interrogative Adverbs dibêjin **Wh- question**. Di kurdî jî em dikarin bibêjin Pirsên Çk.

Tablo 10 Berawirdkirina Hokerên Pirsariyê

îngîlîzî	kurdî
What	Çi
What time	Çi demê
When	Kengî
Where	Kûder
Who	Kî, kê
Whom	Kê

Whose	Ya/yê/yên kê
Which	Kîj, kîjan
Why	Çima
How	Çawa
How often	Çend caran
How many/much	Çiqas
How far	Çiqas dûr
How long	Heya kengî

14. Hokerên Berawirdî û herî raserî me di beşa Hokerên mêjerê/çandanî yê de qala van herdu mijara jî kiribû. Di kurdî de ev mijareke ne serbixwe ye. Lê belê di îngilîzî de ev mijar wek mijareke serbixwe tê hesibandin. Niha em ê yeko yeko bi kurtasî qala van herdu hokeran bikin.

a) Hokerên berawirdî (Comperative Adverbs): Ev cure hoker di herdu zimana de jî rêbaza wan wekhevdu ye. Di îngilîzî de ji bo peyvên kurt “-er” tê bikaranîn. Gireya “-er” bi piranî tê piştta rengdêran û hokeran. Ji bo peyvên dirêj jî “more” tê bikaranîn. “More” tê ber rengdêran û hokeran jî. Di Kûrdî de jî ji bo peyvên kurt “-tir” û ji bo peyvên dirêj “bêtir” tê bikaranîn.

Mînak: Ev bajar ji ya dî **sartir** bû.

This city was **colder** than the other.

Eyfel ji Pisa yê mezintir e.

Eiffel tower is **bigger** than Pisa tower.

Hevala wî ji ya te **bêtir** binaz e.

His friend is **more** delicately than yours.

Ew **bêtir** xemgîn dipeyivî.

He spoke **more** sadly.

b) Hokerên Herî Raserî (Superlative Adverbs) jî wek Hokerên Berawirdî heman rêbaz pêk tê. Di îngilîzî de ji bo peyvên kurt “-est” tê paşiya peyvê. Ji bo peyvên dirêj jî “the most” tê pêşiya peyvê. Di Kûrdî de jî ji bo peyvên kurt û ji bo peyvên dirêj “herî” tê pêşiya peyvê.

Mînak: Pirtûka **herî** arzan min kirî. I bought the **cheapest** book .

Bawer di polê de lawikê **herî** dirêj e. Bawer is the **tallest** child in the classroom.

Lê ya **herî** girîng em di xeterê de ne. But **most** importantly, we are in danger.

Mezela **herî** birêkûpêk ya wê bû. It was her **most** regular room.

15. Hokerên Sedemîn (Adverbs of Reason) di herdu zimana de jî zimannasan qala van kirine. Ev cure hoker du wateya di nav xwe da dihewîne. Ya yekem **sedem** e. Ya duyem jî **armanc** e. Ev herdu cure jî bi aliyê frazeyên daçek û hokerên hevokî tîn bikaranîn.

Mînak: Ez ê ji te re pêlîstokek bikirim **ji bo tu bîaqil bisekinî.**

I will buy a toy to you **for being smart.** (Sedem)

All my friends has visited me **as I was ill**

Ji ber ku ez nexweş bûm hemî hevalên min serdana min kirin. (Sedem)

We do everything **to win this match.**

Em **ji bo serketina vê maçê** her tiştî dikin. (Armanc)

Ji bo ku ezmûnê bibûrî, heta sibehê xebitî.

He has worked until morning **because he pass the exam.** (Armanç)

3.1.3.2. Taybetiyên hokeran yên cuda:

1. Di îngîlîzî de ji bo çêkirina hokeran bi piranî gireya “-ly” heye. Ev gire tê pişt peyvan û van peyvan dike hoker. Lê belê di kurdî de gireke wek “-ly” serbixwe tune ye. Ji şûna wê de curbicur gire hene. Hem dikarin bên pêşiya peyvê hem jî piştî peyvê jî bên. Ji bilî gireya “-ly” di îngîlîzî de “-wards û -wise” jî heye. Lê ev gire zêde nayine bikaranîn.

Mînak: Zû	quickly
hêdî	slowly
birêkûpêk	tidily
paşê	afterwards
ji alê tenduristî ve	healthwise

2. Di îngîlîzî de carinan jî hinek peyv gireya “-ly” distînin. Lê belê dîsa ji nabin hoker. Ev peyv bi piranî rengdêr in.

Mînak: Early	zû
likely	dibe ku
ugly	nexweşik
lively	zindî
elderly	pîr

3. Hokerên dariştî (Çêkirî): Hokerên dariştî di îngîlîzî de jî navê wan “Derivative Adverbs” tê gotin. Di kurdî de pêşgir û paşgiran, pêşdaçek, paşdaçek û bazindaçek re hokerên dariştî tene çêkirin. Di îngîlîzî de bi piranî bi gireya “-ly” Derivative Adverb tên

çêkirin. Ji bilî “-ly” gireyên wek “-wards (afterwards/paşê), -wise (clockwise/rêka saetê), -ways (sideways/ kêlekda), -fashion (schoolboy-fashion/modedayibistanê), -style (gangster-style/şêwaza keleşa)” jî hene. Di nav van gireyan de bi piranî “-wards” zêdetir tê bikaranîn.

Mînak: Binaz	delicately
îro	today
îşev	tonight
hovane	wildly
ji dil	seriously
di ser re	superficially
paşpaşko	backwards
rexxî	sidewards

4. Di kurdî de gireyê wek “ly” jî hene. Lê belê bi piranî pêşdaçek (bi, ji, li) û paşdaçek (de, re, ve) zêde tene bikaranîn.

Mînak: bi dor	in turn
ji dil	seriously
li ser	on
cih de	immediately
der ve	out

5. Di kurdî de carinan ji hoker tê di navbera pêşdaçek (bi, ji, li) û paşdaçekan (de, re, ve) û hokerek awarte çêdibe. Di îngîlîzî de bi wî şiklî hoker pir kêm in.

Mînak: bi hev re together

bi paş ve backwards

di ser re superficially

di dawiyê de finally

ji zû de for a long time

6. Di herdu zimanan de cureyên hokeran yên ji hev cûda jî hene. Di îngîlîzî de Hokerên Hevokê (Sentence Adverbs) û Hokerên Fokusê (Focusing Adverbs) hene. Lê belê di zimannasîya kurdî de qala van hokeran naye kirin. Di kurdî de jî hokerên neyîniyê, teqezî, erêkirinê, xwestekê, guman û pêşbîniyê, dubarekirinê, bisînorkirinê, şanîdanê û kêmezêdeyîyê û wekhevîyê henê. Lê di îngîlîzî de ev hoker kêmtê bikaranîn.

ENCAM

Di pîryûkên rêzimana kurdî de hoker bi kurtasî hatiye amadekirin. Pêşî pênasekirina hokerê ji aliyê zimannasan ve cuda hatiye nivîsîn. Her yekî li gor ramanê xwe pênaseyeke cuda pêşkeş kirine. Cureyên hokerê jî curbicur hatine dabaşkirin. Armanca vê xebatê di nav nivîsên zimannasan de hêmanên hevpar were dîtin e. Ji aliyê peyvsaziyê û wateyê ve hoker çawa hatiye dabaşkirin me qala wê kir. Di nav vê lêkolînê de me hinek encam dîyar kirin.

Pêşî me dest bi pênasekirina hoker kir. Ji ber ku di nav zimannasên me yê kurdî de dîmeneke hevpar tune ye. Her nivîskar li gor xwe pênasek çêkiriye. Hem hêmanên hevpar hem jî yê cuda me derxist holê.

Ji ber ku bêjeyên ku ji bo hokeran hatiye bikaranîn zêde neme piranî peyva “**hoker**”ê bikar anî. Lê belê di nav zimannasên me de bi piranî hoker hatiye bikaranîn. Di vê xebatê de me jî hoker bi kar anî. Tesbîtkirina cureyên hokeran de jî her zimannasekî rêbaz û teknîkê cuda bi kar anîne. Binavlêkirina cureyan jî ne wekhevdu ye.

Di beşa dawî de me derheqê taybetiyên hokeran de qala hinek xalan kir. Taybetiyên peyvsazîya hokeran di kurdî de çawa ye me behsa wê kir. Ev babet dibe çar beş. 1. Hokerên Xwerû 2. Hokerên Dariştî/çêkirî 3. Hokerên hevgirtî 4. Hokerên hevedudanî. Taybetiyên peyvsazîya hokeran di îngilîzî de çawa ye me ê qala wê jî kir. Xal xal me behsa wê mijarê kir. Ji xeynî wê cihê hokeran di hevokê da çawe ye me qala wê jî kir.

Em dikarin bibêjin beşa herî girîng beşa dawî ye. Lewra hokerên kurdî û îngilîzî bi teknîka berawirdî tê mukayese kirin. Ev jî dibe du babet. Yê hevpar û yê cuda. Ji aliyê wate û peyvsazîyê ve ev herdu ziman hatine berawird kirin. Me dît ku di nav hokerên kurdî û îngilîzî hêmanên hevpar bêtir in.

Em dikarin bêjin di nav herdû zimanan de jî hoker pêşî lêkeran, rengdêran û hokerên wekî xwe dîyar dike. Derbarê van me hinek mînakên girîng dan. Ji aliyê

peyvsazîyê ve hoker di herdu zimanan de hêmanên hevpar gelek in. **Hokerên Xwerû, hokerên dariştî/çêkirî, hokerên hevgirtî û hokerên hevedudanî** di herdu zimanan de jî pir wek hevdu ne. Rê û rêbazên van hokeran dişibin hev.

Hokerên wek **Hokerê firazeyê daçek, hokerê frazeyê raderî û hokerên hevokî** di herdu zimanan de jî hene. Tişta ku me tespît kirî bikaranîna van hokeran pir hevpar in. Ji aliyê wate û peyvsazîyê ve jî zimannasên herdu zimanan jî pir bi kar anîne.

Hoker ji aliyê wateyê ve jî **Hokerên Demê, hokerên cih û alî, hokerên mêjerê/çendanî, hokerên pirsyariyê, hokerên rewşê/çawaniyê, hokerên frekansê/pircarî, hokerên berawirdî û herî raserî û hokerên sedemîn** di herdû zimana de jî heye. Rêbazên van hokeran wek hevdu ye. Wateya wan de tu cudatî tune ye.

Belê di nav herdu zaimanan de hêmanên cuda jî hebûn lê yên me tespît kirî pir kêm bûn. Em dikarin vê jî bibêjin ku di nav îngîlîzî û kurdî de ji aliyên hokeran ve cudatî pir tune ye.

Bi saya vê lêkolînê kesên ku bixwazin kurdî hîn bibe bi taybetî kesên îngîlîz hêsantir Kurdi karibin hîn bibin. Ji ber ku hokerên kurdî û îngîlîzî ji aliyê wate û peyvsazîyê ve hêmanên hevpar pir in mirov dikare zûtir van herdu zimanan ji baş hîn bibin.

ÇAVKANÎ

- Altuğ, Halil. *Gramera Kurdî-Kürtçe Gramer*. İstanbul: Avesta, 2013.
- Aslan, Şêxmûs. *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*. Ankara: Weşanên NA, 2. Basım, 2018.
- Badikî, Azad. *Pêşgotinê Kûrdî-Gotinên Berya*. ts.
- Badıllı, Kemal. *Türtçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*. İstanbul: Med Yayınları, 1992.
- Bakır, Abdûrrahman. *Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî*. Diyarbakır: Weşanên Aram, 2015.
- Baran, Bahoz. *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Wardoz, 2. Basım, 2018.
- Baruah, T. C. "The English Teaching Handbook". *New Delhi: Sterling Publishers Private Limited* (2006),
- Bedirxan, Celadet Alî-Lescot, Roger. *Kürtçe Gramer*. İstanbul: Weşanên Avesta, 5. Basım, 2012.
- Bedirxan, Kamiran. *Rêzimana Zimanê Kurdî*. Paris: 1971.
- Cefer, Elî. *Gotinên Pêşyan*. Weşanên Xanî, 2006.
- Chinyeaka, Laretta. "AN OVERVIEW OF ADVERBS FOR THE PROFICIENT USE OF THE ENGLISH LANGUAGE". *Awka Journal of English Language and Literary Studies* 6/1 (2017), 96-113.
- Ciwan, Mûrad. *Türkkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kumanc Lehçesi*. İsviçre: Jîna Nû Yayınları, 1992.
- Demir, Celal. "Türkçe Öğretiminde Zarf Tümlerleri". *TÜBAR* 13/(2003 Bahar), 407-423.
- Dêrşewî, Mele Mehmûd. *Miştaxa çiya ji gotinên pêşiya*. thk. Serbest Zaxoyî. Stockholm :[s. n: Çapa 1 (bi tipen Latini). Basım, 1989.
- Eastwood, John. *Oxford Guide to English Grammar*. Hong Kong: Oxford University Press, 1994.
- Fossum, L. O. *A Practical Kurdish Grammar*. Minneapolis: Augsburg Publishing House, 1919.

- Gucker, Philip. *Essential English Grammar*. New York: Dover Publications, 1966.
- Helqetînî, Mele Yûnisê. *Ez-Zuruf ve't-Terkîb*. İstanbul: Şifa Yayınevi, 2015.
- Lester, Mark. *McGraw-Hill's Essential ESL Grammar: A Handbook for Intermediate and Advanced ESL Students*. Chicago: Mc Graw Hill, 2008.
- Malmîsanij, Mehmet. *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kırmancca(Zazaca) Dilbilgisi*. İstanbul: Weşanên Vate, 2015.
- Mazî, Çiya. *Ferhenga Gotinên Pêşiyân*. Elma Yayınları, 2005.
- Nelson, Gerald. *English An Essential Grammar*. London: Routledge, 2002.
- Ocek, Nezir. *Waneyên Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Sîtav, 2014.
- Quirk, R., Randolph, Q., Quirk, R., Greenbaum, S., Longman, Pearson, Leech, G.N.-Svartvik, J. *A Grammar of Contemporary English*. London: Longman, 1972.
- Sağnıç, Feqi Huseyn. *Hêmana Rêzimanê Kurdi*. İstanbul: MELSA Yayınları, 1991.
- Sevgi Öndeş, Nesibe. *English Grammar Inside and Out*. İstanbul: ELS Yayıncılık, 2. Basım, 2007.
- Tan, Samî. *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 3. Basım, 2015.
- Tîgrîs, Amed. *Gotinên Pêşiyân*. Stocholm: Weşanên Rewşen, 2001.
- Yıldırım, Kadri. *Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi*. İstanbul: Weşanên Avesta, 3. Basım, 2013.

PÊVEK¹²⁵

Tablo 11 Hokerên Demê-Adverbs of Time

kurmancî	îngîlîzî
Aline	When animals are grazed or left to rest at noon, at noon
Axirê, axir, axirkê	After all, finally, eventually
Berbanga sibê/sibehê	At the crack of dawn
Berê, berî	Once, before
Ber bi êvarî	In late afternoon, towards evening
Ber bi sibê, ber bi sibehê	Towards morning
Berêvarkî	Before evening
Berî nîvro	Before midday
Bi roj, nîvroj	By the day, midday, noon
Bi şev	At night
Bi şev û (bi)roj, bi roj û (bi)şev	Night and day, day and night
Betir pêr, bitir pêr, pitir pêr	Three days ago
Bitir bitir pêr, pitir pitir pêr	Four days ago
Bitir pêrar, betir pêrar, petir pêrar, pitir pêrar, pitir pêr	Three years ago
Bîstekê	In a moment
Car	...time
Carna, carcaran, car caran, ji carcaran	Sometimes, occasionally
Carekê	Once
Cih de, cî de, di cî de, di cih de, di cîh de	Immediately, instantly
Cirkî	Since
Çarsibe	Four days later
Çi car, tu car, yek car	At no time
Danê êvarê	In the afternoon

¹²⁵ Ev tabloyên jêrê hokerên Kurmancî bi pirtûkên Celadet Alî BEDIRXAN- Kûrtçe Gramer, M. MALMÎSANIJ- Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi, Kadri YILDIRIM- Temel Araştırma ve Metinlerle Kûrtçe Kurmancî Lehçesi, Samî TAN- Rêzimana Kurmancî, Bahoz BARAN- Rêzimana Kurmancî, Nezîr OCEK- Rêzimana Kurmancî, Abdûrrahman BAKIR- Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî, Şêxmûs ASLAN- Lêkonînek li Ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî), Halil ALTUĞ-Gramera Kurdî/Kûrtçe Gramer hatiye sûd wergirtin. Hokerên Kurdî jî me wergerand Îngîlîzî.

Danê sibê, danê sibehê	In the morning
Dawî, dawiyê	Then, finally, eventually
Dem	Time
Demekî, demekê	For a time, once, for a while
Demsal (Bihar, Havîn, Payîz, Zivistan)	Season (Spring, summer, autumn/fall, winter)
Dereng, bi derengî	Late
Dest, dest-dest, di dest da	Immediately, instantly
Di dawîyê de	Finally, eventually
Dihî, dihi, dihi, do, duh, duhî	Yesterday
Di nêzîk de, di nêz de, di nêzdik de	Soon, nearby, recently
Di pey re	Afterward, subsequently
Dusibê	The day after tomorrow
Êvarkî, êvarî, êvarê	In the evening
Ewil	Firstly
Gav (diş., an)	Time
Vê gavê, wê gavê	Now, then
Gavek, gavekê	In a moment
Gavekê din	A little later, soon
Gavîna, gavgavina, gavinan	Sometimes, occasionally
Geh geh, ge ge	Sometimes, occasionally
Halo, hele	Then, namely
Hem...hem, him...him	Both...and..., at the same time
Hema, Hima, heman, hemen	Immediately, instantly
Her	Every, always
Hercar, her car	Always, consistently
Herdem, her dem	Every time
Her û her	All the time, consistently
Hergav, her gav	Always, consistently
Her ro, her roj, hero	Every day, consistently
Heta	Until, till...
Hertim	Always, consistently
Hey bnr. Hema	
Heyam	Period, season
Hêj, hê, hêna, hîn, hîna	Still, yet
Hindî, himgaft, hingavî, hingê	Then, at that time
Hîn nû	Just new

Îcar, încar, îdorê, îjo, vê carê	This time
Îro, îroro, evro, îrû	Today
Îsal, evsal	This year
Îşev, evşev	This night, tonight
Jêlî	Since...
Ji berê ve, ji berê de	Since the past
Ji îro pê de, ji îro pê ve	Henceforward
Ji îşev heta sibê	From evening till morning
Ji niha ve	From now on, already
Ji niha û bi şûn de, ji niha pê ve	From now on, henceforward
Ji paşî, ji pê ve	From now on, anymore
Ji zû de, ji mêj de, ji mêj ve	For a long time
Kevn, kevin, kewn	Old, ancient
Kêm caran	Rarely, uncommonly
Niha, niho, nuha, nika, nûke, aniha, anika, anka, anaka, aneka, anêka, a nuha, hênûka, naga, naka, nako, noke, nuka, nûka	Now
Ji niha û pê de	From now on
Ji sibê heta êvarî	From morning till evening
Meh (Adar, nîsan, gulan, xizêran, tîrmeh, tebax, îlon, cotmeh, mijdar, kanûn, çile, sibat)	Month (March, April, May, June, July, August, September, October, November, December, January, February)
Nişk, nişka, nijkê ve, ji nijkê/nişka ve	Suddenly
Nîvro, nîvroj	Noon
Nîvrokî	At noon
Nîve şevê, nîveşev	Midnight
Nû, nuh, nuhû	New
Par	Last year
Paşê, paşî, paşkê, paşkî, paştir	After, afterwards, later, finally
Peyre	Afterward, subsequently
Pêde	Continuously, consistently
Pêr	The day before yesterday
Pêrar	Two years ago
Pêrşev	The night before last night
Pirî caran	Often
Piştî	After, later
Piştî nîvro, piştî nîvroj	In the afternoon
Piştire, di piştire	Finally, after, later

Roja berê	The day before, yesterday
Rojadin	Tomorrow
Roj bi roj	Day after day, day by day
Rojek, rojekê, rokê	A day
Rojên hefteyê(Şemî, yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem, în)	Days of the week (Saturday, Sunday, Monday, Tuesday, Wednesday, Thursday, Friday)
Sala borî	Last year
Sala ku bê, sala ku tê	Next year
Salek	A year
Sal bi sal	From year to year
Salê pêde	All year
Serdawîyê	Finally, eventually
Serêvarkî	In the evening
Serê sibê, serê sibêhê, serê sibêyê, serê subê	In the morning
Sêsibê	The third day after today
Sibe, subê, sibehê, sivê, siwê	Tomorrow, In the morning
Sibetir	After tomorrow
Sibetira dî	Three days later
Şefeqê, şefaqê, şebaqê, şebeqê, şeveqê, şibakê, şiveqê	At dawn
Şev, bi şev	At night
Şeva bertirê	The night before last night
Şeva din, dîşev	Last night
Şeva ku bê, şeva ku tê	Tomorrow night
Şevêkê	A day
Şevtira din	Two nights before last night
Tavilê, tafil, tafilê, tafilkê, tavil, tavilkê, tawil	Suddenly, abruptly
Tim, timî	Always, consistently
Tim û tim	Without stopping, constantly
Tu caran, tu carî, çi caran	Never, in no case
Ve, va	Then, at that time
Vêca, vêga	Then, at that time
Wextekî	For a time, once, for a while
Xafil de, xafil da, xaftila, ji xafil de, ji xaftila da	Suddenly, abruptly

Yekser	Immediately, instantly
Zaf caran	Many times, most of the time
Zemanekî	For a time, once, for a while
Zînhar	Never, in no case
Zû, pêşwext	Early, promptly
Zû dereng	Sooner, whenever

Tablo 12 Hokerên Cih û Aliyan- Adverbs of Location

kurmancî	îngîlîzî
Alî, ji vî alî ve, ji wî alî ve	Direction, side: This way ... that way
Alî, yalî, halî, hêl, hêla	Side
Ba, bal, li ba, li bal	Near
Bajar	City
Bakur	North
Bakurê rojhelat	Northeast
Bakurê rojava	Northwest
Bala	Upwards, high
Balorkî	Rolling down
Banî bnr. Bala	
Başûr	South
Başûrê rojhelat	Southeast
Başûrê rojava	Southwest
Behr, derya	Sea
Ber, wer, li ber	Front
Beraber	Reciprocal, side by side
Berbijêr, berjêr	Downhill, down
Berbijor, berjor, berjorkî	Uphill, up
Berepaş, beropaş, paşepaş	Back by back
Berve	Forward
Berwarkî	Sideways
Bilind	High
Bin, binî, li bin di bin de, di binî de	Bottom, at the bottom
Bi pêş ve	Forward, ahead
Bi ser de	Over, onto
Bi şûn ve	Behind
Bi vir de	Here

Bi wir de	There
Bi vir ve	Here
Bi wir ve	There
Ceber	Opponent
Cem	Near
Cîyekî din	Another place
Çem	River
Çaralî	Around, all around
Çep	Left
Dawî	End, final
Def	Side, part
Der	Out, outside
Derûdor, der-dor	Around, all around
Derve, derva, ji derve, li derve	Out, outside
Di ber de	In front of
Dibistan	School
Di nav re, di nav de	Through, in
Dor	Around
Dormedor, dormandor	Around, all around
Dorûber, dewrûber	Around, all around
Dû, dûv, dûre, bi dûv, bi dû re, dûv ra, di dûv ra, li dûv	One after another, subsequently, after, afterward
Dûr, ji dûr ve	Far, away
Ew ber, wî berî	Farther, to the other side
Ew cî, (li) wî cî, ewder	There
Gol	Lake
Gund, li gund	Village
Hindir, hindur, hundir, hundur, hindirû, ji hundur, di hundur ra, di hundur de	Inside, in
Herde	There
Hember	Versus, opposite
Hind	Side, part, nearby
Hinda	Along, alongside
Hinda çep, hêla çepê	Left side
Hinda rast, hêla rastê	Right side
Hir, li hir	Here
Ji nêzîk ve, ji nêz ve	At close range
Ji ser, di ser ra, di ser re	Over
Jêr, li jêr, ji jêr ve, di jêr de	Down, below

Jor, li jor, jor de, ji jor de, bi jor	Up, above, from above
Kêlek, li kêlekê	Side, part
Li dûv, dîv ra, dîv re, dûv re, dû ra, dû ra, dî dû ra, dî dûv ra	After, then, afterwards, later, in pursuit of
Li dûv hev, li dû hev	successively
Li her derê	Everywhere
Li nik, li nik hev	Near
Li ser hev, bi ser hev ra, bi ser hev de	Over and over
Mal, li mal, ji mal, di malê de	Home, at home
Mil(er.yan): ji milê din	On the other side
Mizgeft	Mosque
Nav, li nav, di nav, di nav de	In
Navber, navên	Between
Navbeyn, mabeyn, mabên	Distance
Navçe	District
Nêzik, nêzîk, nêzing, nizik, nêzdik, nêz, nêzing, nêzûk, nîzing, nîzîk	Near, nearby
Pal	Back, slope
Pa ra, di pa ra, di pê ra	Behind
Paş, paşve, li paş, ji paş ve, bi paş ve	Backwards
Paş da, paş de, pey	Back
Pey, li pey, pey ra	Behind
Pêş, pêşve, li pêş, ji pêş ve, bi pêş ve	Front, forward
Pêşberî	opposite
Pêş de, ber bi pêş	Forward
Pêlepaş	Back you back
Pişt, li pişt, ji pişt	Back
Rast	1-Right 2-Straight
Rasterast	Straight, directly
Rex, li rex	Side, part
Rexkî, rexrexkî	Sideways
Rojava	West
Rojhelat	East
Ser, li ser	On, on top of, upon
Serbijêr bnr. Berbijêr	
Serbijor bnr. Berbijor	
Serejêr, serjêr	Downhill

Serpiştê	On one's back
Seyrangeh	Promenade, picnic place
Şûn, şûn de	Back
Tenişt, li tenişt	Side, part
Têde	In, inside
Tomargeh	Studio
(Tu) cîyekî	Nowhere
Vê derê, li vê derê	There
Vêda, vêde, virda, virde	Here
Vir, vira, li vir, li vira, li vêda, li vêdê	Here
Wêda, wêde, wirda, wirde	There
Wir, wira, li wir, li wê derê	There
Xanî	Building
Xwarê, xwar, war, ber bi xwarê	Down

Tablo 13 Hokerên Mêjerê, Çendanî-Adverbs of Degree/Intensifiers

kurmancî	îngîlîzî
Balo	At least
Beraber	As far as, much
Bes	Enough
Bêdira	Enough
Bêtir, bêhtir, bihtir	More
Cot bi cot	Doubly, in pairs
Çend, bi çendî	As far as, much
Çênîk, çênîk, çênîk, çenek	A little, a few
Çenîkek, çenîkek, çenîkik	Little, few
Çêtir	Better
Çiko	Insomuch that, so that
Çiqas, çiqeder	Many, how
Çikas...ewçend(ewqas)	So much
Çîçik	Little, few
Dehe deh	In tens
Du qat	Double
Evende, evhînde, ewçend, ewende, ewqas, çiqasqas	So much

Gelek, gele, gelik, gelekî	Very, quite
Bi gelekî	Very much
Gişkî	All, the whole
Hebek, hebekî, hebki	Some
Hefqas bnr. Ewqas	
Her car	At every turn
Herçend...ewçend	Insomuch that, so that
Herçî	Insomuch that, so that
Herî	The most
Herî hindik	The least
Herî kê m	The least
Herî zêde/zahf	The most
Herî pir	The most
Heta radeyekî	Insofar
Hinde, hindê, ewende, ewhinde, ewinde	So many/much
Hindek, hindik, hinek, hinik, hin, hinekî, tenek	Some, a little, a few
Hingî	So much
Hîç, hêç	None
Hîn	More
Kê m...Kêmtir	Less
Kûtanî	Briefly, finally
Mîşe, mîşe	A lot of
Nîvenîv, nîvanîv, nîvonîvo	Fifty fifty
Qas, bi qasî	In as far as
Qederek	Some, little, few
Qene	At least
Pîçek, pîçek, pîçekî, piçik, piçikî	Some, little, few
Pir	Very
Pir hindik	Very/too little
Pir kê m	Very/too little
Pir pir	At the very most, dreadfully
Pirtir	More
Qandî	So many/much
Safî	Pure
Temamî, bi tamamî	Exactly, completely
Tebayek, tu teba, tu tewa	Nothing
Teqe	At least

Tev	All, the whole
Tewr, tewrî	The most
Têr	Enough
Tîke	Some, little, few
Xulase (Ar.)	Briefly, in summary
Yek bi yek, êk bi êk	One by one, gradually
Zaf, zef, zehf, zehv	Very
Zêde zêde	Abundantly, excessively
Zeyde, zêde, zîyade, zêdetir	Very, much, extra
Zihar	At least
Zor	Very, much

Tablo 14 Hokerên Pirsyariyê-Interrogative Adverbs

kurmancî	îngîlîzî
Bi kû ve, bi ku de	Where
Çawa, çewa çawan, çewan, çan, ça, çer	How
Çend	How many
Çi	What
Çi dem, çi demî	What time
Çima, çiman, çira, çire	Why
Çîlo, çîtewr, çîto, çîtone, çîtow, çîtor, çutor, çutûr	How
Çiqas, çiqas, çiqeys, çiqeyse, çuqas	How much
Çi weqt	What time
Ecêba, eceba	I wonder if
Gelo	I wonder if
Heta kengê	Untill when
Ka, kanê, kanî	Where
Kengê, kengî, kînga, kîngê	When
Kêder, kuder, kîjan cî	Where
Kî, kê	Who
Ku, kû, ko	Where... at
Ku re, kur, kêrê, kê derê	Where...to
Kusan	How
Ku va, ku da, ku de, ji ku de	where...from

Bi kû de, kû derê, bi kû ve, li kû, li ku, di ku de	Where
Ji ber çî	Why
Ji kengî de, ji kengê vir de, ji kengê ve ma	Since when
Ji kîjan hêlê	Which way
Ma, mî	I wonder if
Mîna çî, wekî çî	What... like
Qey	Why
Wekî kê	Who...like

Tablo 15 Hokerên Rewşê, Çawaniyê- Adverbs of Manner

kurmancî	îngîlîzî
Aşkere, bi aşkere	Clearly, frankly
Axisî	Fortunately
Baş	Well
Bere bere, berebere	Progresively, little by little
Bêhemd, bêhemdî	Involuntary, unwillingly, reluctantly
Bi derewkî, bi derewînî	Pretendedly
Bi dor	In order, in turn
Bi hev re	Together
Bi konetî	Subtly, cutely
Bi lez	Fast
Bilind	Highly
Binaz	Delicately
Bi nezanî, bi nezanîn	Unintentionally, inadvertently
Bira	Sharp
Bi rastî, birast	Actually, correctly, factually, Really
Birêkûpêk	Tidily, steadyingly
Bi qest, bi qesd	Intentionally, purposely
Bi şaşî, bi şaşîtî	Mistakenly, wrongly
Bi xeletî	Mistakenly, wrongly
Bi xwe	In person
Bi zanayî, bi zanîn	Intentionally, purposely
Bi zor, bi zorê	Forcily, by force
Bi zordarî	Forcily, by force

Bîlaheq, bîlehaq, belheq, beleheq	In vain, unjustly, without a reason
Bîlasebep, belasebep, beleseb, belesebep, bîlesebe	In vain, without a reason
Çargavkî	At a galo, tantivy
Çarlepki, bi çarlepki	Creepily
Çarmêrkî	Cross-leggedly
Çepki, çepkanî	From left part, reversely
Çika	Especially, at least
Çilo, çito	How, like
Deste deste	Bundle, bunch
Dilêrane	Heroically, bravely,
Di ser re	Superficially
Dirêjki	Lengthwise
Dizika, dizika, dizîki, bi dizî, bi dizîka	Secretly, under-handed
Devdevki	Face downwards
Devûrû, deverû, deveronî	Face downwards
Dûr û dirêj	Far and wide, lengthily, in detail
Eseh(Ar.)	Sure, really, certainly
Fena, fîna	Same as...
Geh	Sometimes
Giran	Slowly
Herçi, herçi	Especially, at least
Hela	Especially, at least
Her weki	Like, as
Hevtone	Thus
Hêdî, hêdîka	Slowly
Hêsan, asan, hasan, hêsa	Easily
Hişk	Hardly, rigidly
Ji adetê der	Unusually
Ji binî, ji bin de	Radically, completely
Ji binî, yekcar, ji bin, bintûtî	1-Never 2-Radically, completely
Ji binî	1-Radically, completely 2- In vain, without a reason
Ji bin ve	Under-handed, secretly
Ji dil	Sincerely
Ji xwe	Already, fundamentally
Kereker	Secretly, under-handed

Ko	Dull
Kurdane	As a Kurd
Kurt	Low, short
Kûr-kûr	Deeply
Lez, lezkî, bi lez, bi lez û bez	Fast
Lig-lig	Tremblingly
Li pey hev	Successively
Mêrane	Manly, bravely
Mîna...	As, like
Nerasterast	Indirectly
Nişkavî	Impulsive
Nivîskî	Written
Nizm	Low
Nola...	As, like
Paşpêkî	Backwards, inversely
Paşpaşkî	Backwards
Pêkve	Together, althogether
Pêlepaş	Backwards
Pêt, pît, peyt, pihêt	1-Fast 2-Tightly
Pinhanî, nihani	Secretly
Qelew	Fat
Qenc	Good
Qene	At least
Qestîka, bi qestîka, qestî, qesta, qestîkan, qestûka, berqestîka, berqestî,	1-Jocularly 2-Intentionally, purposely
Qeşmerkî	Buffoonish, scophantically
Qet nebe, qe nebe, qe ne, qa ne, qe na	At least
Qilûskî	Crouchingly
Rast	Right, correct
Rasterast	Directly, straight
Rehet, rahet, rihat, rihet	Easily
Rind	Good, fine
Rû bi rû	Face to face, reciprocally
Saya	Thanks to, on account of
Serserkî	Upside-down
Şaşkî	1-Misguidedly 2-Asquint 3-Mistakenly
Şêrane	As a lion
Şermokî	Shyly, timidly

Tenê, tik û tenê	Alonely
Tenikî	Thinly
Tewr, tew, tewer	1- Also 2- Never
Tev-tevlî, tev bi hev re	Alltogether
Tûj	1-Hot, bitter 2-Sharp
Vala	In vain, without a reason
Wek, wekî, weke, weka, weko, weku, wekû	As, like
Xelet	Wrong, false
Xwe bi xwe	By oneself, on one's own
Xweş	Nice, lovely
Xweşik	Beautiful
Yekser	Immeadiately, directly
Zatî	Already
Zorekî	Forcily, by force
Zû, zûkanî, zûka	Fast,swiftly
Zûzûka	Urgently, abruptly, promptly

Tablo 16 Hokerên Neyînîyê-Negative Adverbs

kurmancî	îngîlîzî
Bi tu awayî	In no way
Çu, tu, ti	Never
Hew	No longer, never
Hîç, hêç	Never
Ji bin	Never
Na, Nexêr, naxêr	No, not
Ne... ne, çî... çî	Neither... nor
No	No
Qet, qe	Never
Qet mebe/nebe	At least
Tew, tewî	Never
Tu caran, tucar, tucara, tu carî, çî caran	Never, in no case
Yekcar	Never
Zînhar	Never, in no case

Tablo 17 Hokerên Teqezî, Erêkirinê û Daxwaziyê

kurmancî	îngîlîzî
Belê	Okay
Bêguman	Absolutely, certainly, surely
Bêşik	Absolutely, certainly, surely
Bi carekê	Completely, exactly
Biteqezî	Absolutely, certainly, surely
Bivê nevê	Absolutely, certainly, surely
Bixwe	Anyway, in addition that
Erê	Yes
Haşa	Except
He	Then, therefore
Helbet	Surely
Île	Necessarily
Îşela, şale	Hopefully
Ji xêra xwedê re	I wish
Jixwe, ji xwe	Anyway, naturally
Jî	also, too, even
Naxwe, nexwe	Anyway, in addition that
Nemaze	Especially, particularly, specially
Nexasim	Especially, particularly, specially
Rast e	Correct
Teqez	Absolutely, certainly
Tev, tef	Completely, exactly
Xasxa, xesma	Especially, particularly, specially
Xwedê hez ke	Hopefully
Xwezî, xwaziku, xwazka, xwezil, xwezila	I wish

Tablo 18 Hokerên Guman û Pêşbîniyê

kurmancî	îngîlîzî
Belkî, belkê, belko, belku, belkû, belim	Maybe, perhaps
Dibe ku	Maybe, perhaps
Ecêba, ecebe, erê, gelo	I wonder if
Halbûkî, halko, halwe, heçku, gotin qey,	But, however, nevertheless
Her hal	Probably, possibly
Heye ku	Maybe, perhaps
Hew te dît...	Peradventure
Kano, qaşo	Supposedly, in a manner, so-called
Qene	Supposedly
Qey	Probably, in a manner

Tablo 19 Hokerên Sedemîn-Adverbs of Reason

kurmancî	îngîlîzî
Da	In that case, therefore, then
Jifrom
Ji ber... ji ber ku...	Because of, due to, owing to
Ji bo ku...	In order to...
Ji rûbalê	because of, due to, owing to
Ji rûyê, ji rûyê di...	because of, due to, owing to
Lewra, lewre	Consequently, therefore, because
Loma, lewma, lema	Consequently, therefore

Tablo 20 Hokerên Dubarekirinê

kurmancî	îngîlîzî
Cardin	Once more, again
Derbekî din	Again
Dîsa, dîsan, dîsanê	Again
Dubare	Again
Ji nû ve	Again
Hema her gav, hema tin	Again and again
Neqileka din	Again
Şopekî din	Again

Tablo 21 Hokerên Bisînorkirinê

kurmancî	îngîlîzî
Edî, êdin, êdina, êndî, idî, indî, ida, îdin, îdî, eydî, hêdina	Anymore
Nema	Anymore, henceforward
Sif	Only, solely
Sirf	Mere, only
Tenê, tinê, tena, تنها, tenya, bi tenê	Alone, lonely

Tablo 22 Hokerên Şanîdanê

kurmancî	îngîlîzî
Eve	Here
Ewe	There
Ûha, ûlo, wanî, welê, welo, wilo, wiha, weha, wîsa, wisa, wer(ê), halo, holê, hanî, hanê	So, such
Va, vêya (Nêz)	Here
Wa (Dûr)	There
Wenî, winî, wanî, wengî, weng, hone	So, such
Werge	So, such
Wisn	So, such

Tablo 23 Hokerên Kêm- Zêdetiyê

kurmancî	îngîlîzî
Bihezir	Approximately, roughly
Devdev, devdev, devdevî, devdevî, devdevî	Nearly, almost
Jorejêr, jor û jêr, xwarejêr	Nearly, almost
Hema, hema bêje, hema hema, hemen hemen	Nearly, almost
Nêzî, nêzike	Approximately, roughly
Teqrîben, teqrîbî	Approximately, roughly
Kêm zêde, kêmuze	More or less, nearly, almost
Pirhindik, pir û hindik, zaf hindik	More or less, nearly, almost